

BİNGÖL ISSN: 2147-5679
2021/1
ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
DERGİSİ Yıl/Year: 7 Cilt/Volume: 7 Sayı/Issue: 13



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl/Year: 7 Cilt/Volume: 7 Sayı/Issue:13

ISSN: 2147-5679

Sahibi / Owner

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Adına
Dr. Öğr. Üyesi Abdullah Bedeva

Editör / Editor

Dr. Öğr. Üyesi Zafer AÇAR

Editör Kurulu

Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY
Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD
Dr. Öğr. Üyesi Muhammed Bilal TOLAN
Dr. Öğr. Üyesi Ayetullah KARABEYESER
Dr. Ömer DELİKAYA
Arş. Gör. Adnan AYDINTÜRK

Dergi Sekreteryası ve İletişim /

Secretary of Journal and Communication:

Enstitü Sekreteri Sadrettin BEKİ

Dergi Yazışma Adresi / Correspondence Address

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğü, 12100-Bingöl

Telefon: 0426 216 00 42

Faks: 0426 216 00 42

Enstitü e-posta: yasayandillerenst@bingol.edu.tr

Dergi e-posta: bingolyasayandiller@gmail.com

Dergi Tasarım ve Uygulama / Magazine Design

Şemal Medya Tasarım Ofisi

Yayın Kurulu ve Danışma Kurulu Editorial Board and Advisory Board

Prof. Dr. Abdulaziz BEKİ, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Abdulaziz HATİP, Marmara Üniversitesi
Prof. Dr. Abdullah KIRAN, Muş Alparslan Üniversitesi
Prof. Dr. Abdullah ÖNALAN, Siirt Üniversitesi
Prof. Dr. Celilê Celil, Instut für Kurdologie, Awisturya
Prof. Dr. Edip ÇAĞMAR, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet BARCA, Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet BİLEN, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet Mahfuz SÖYLEMEZ, İstanbul Üniversitesi
Prof. Dr. Metin YİĞİT, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Mustafa AGAH, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Mychael CHYET, Washington Library, USA
Prof. Dr. Nesim DORU, Mardin Artuklu Üniversitesi
Prof. Dr. Nusrettin BOLELLİ, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Orhan BAŞARAN, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Salih AKIN, Rouen University, France
Prof. Dr. Seyid Ahmed PARSA, Kurdistan University, İran
Prof. Dr. Yadgar Rasool, Selaheddin University, Iraq
Doç. Dr. Abdulcebbar KAVAK, Karabük Üniversitesi
Doç. Dr. Abdurrahim ALKIŞ, Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. Abdülhadi TİMURTAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Doç. Dr. Ahmet KAYINTU, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Ayhan TEK, Muş Alparslan Üniversitesi
Doç. Dr. Canser KARDAŞ, Muş Alparslan Üniversitesi
Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Ercan ÇAĞLAYAN, Muş Alparslan Üniversitesi
Doç. Dr. Hayrettin KIZIL, Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. İbrahim USTA, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Mehmet YAZICI, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Mustafa GÜNERİGÖK, Sakarya Üniversitesi
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK, Mardin Artuklu Üniversitesi
Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ, Dicle Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Asoos M. Qader, Lehrstuhl für Altorientalistik, Universität Würzburg, Almanya
Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD, Bingöl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Mustafa ASLAN, Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Yusuf AYDOĞDU, Bingöl Üniversitesi

-
- Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi yılda 2 kez yayımlanan, ulusal hakemli bilimsel bir dergidir.
 - Yayımlanan yazıların her türlü hukukî ve bilimsel sorumluluğu yazarlarına aittir.
 - Derginin her hakkı saklıdır. Dergide yayımlanan yazılar kaynak gösterilmeksizin kullanılamaz.

Bu Sayının Hakemleri / Reviewers of the This Issue

Doç. Dr. M. Zahir Ertekin, Bingöl Üniversitesi

Doç. Dr. Canser Kardeş, Muş Alparslan Üniversitesi

Doç. Dr. Tareq Mohammed Awrahim, Mardin Artuklu Üniversitesi

Dr. Öğr. Üyesi Ömer Faruk Elaltuntaş, Bingöl Üniversitesi

Dr. Öğr. Üyesi Yusuf Aydoğdu, Bingöl Üniversitesi

Dr. Öğr. Üyesi Mahmut Gider, Bingöl Üniversitesi

Dr. Öğr. Üyesi İsmail Söylemez, İnönü Üniversitesi

Dr. Naz Ahmad Saeed, Kerkuk University

Dr. Yakup Aykaç, Mardin Artuklu Üniversitesi

Dr. Zülküf Ergün, Mardin Artuklu Üniversitesi

Dr. İbrahim Dağılma (2), Bingöl Üniversitesi

Nurettin Ertekin, Hakkari Üniversitesi

İlyas Sayım, Muş Alparslan Üniversitesi

İÇİNDEKİLER



EDİTÖRDEN..... 07

**BERAWIRDKIRINEK LI SER QESÎDEYA AVÊ YA
FÛZÛLÎ Û HELBESTA EY AV Û AVÊ YA FEQİYÊ TEYRANÎ
JI ALİYÊ HÊMANA AVÊ VE**

Fahri KARACA.....9-35

رێبهری دۆسیه‌ی کارگێڕیی زانا و ناودارانێ کورد له کتێبخانه‌ی مه‌شێخه‌تی تورکیا

Hemin Omar AHMAD / هه‌مین عومه‌ر نه‌حمه‌د37-80

**DEWIRANÊ MODERNAN Ê EDEBİYATÊ ZAZAKÎ
SER YO ONAYÎŞO CEMATKÎ**

İbrahim DAĞILMA.....81-110

***DİLİNİ KESMEK: ORTAK ATASÖZLERİN HİKÂYELERİ:
FÂRSÎ-KURMANCÎ - ZAZAKÎ-9***

Hasan ÇİFTÇİ.....111-134

DÎWANÊ MELA MEHMET DEMİRBAŞ DI PÊĞEMBERÎ

Danyal APUHAN135-159

ده‌ستپێک له شیعری کلاسیکی کوردیدا (سالم) به‌ نمونه

نهره‌وان موحه‌مه‌د عوبید / Arkhawan Mohammed OBED 161-205

MAMEKİYE DE DURİMÊ ZONÊ ZAZAKÎ

İlyas ARSLAN207-224

EDİTÖRDEN...



Değerli okurlar!

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisinin 13. sayısını akademik camiaya ve dergimizin okurlarına sunmanın mutluluğu içindeyiz. Dergimizin bu sayısında da tıpkı diğer sayılarda olduğu gibi farklı dil ve lehçelerden sosyal bilimlerin dil ve edebiyat sahasında çeşitli makaleler yayınlıyoruz.

Dergimizin birinci yazısı Fahri Karaca'nın *Berawirdkirinek li ser Qesîdeya Avê ya Fûzûlî û Helbesta Ey Av û Avê ya Feqîyê Teyranî ji Alîyê Hêmana Avê* ve adlı çalışmasıdır. Bu çalışmasında yazar Fuzulî'nin Su kasidesi ile Feqiyê Teyran'ın Su şiirini su unsuru açısından karşılaştırmaktadır.

İkinci yazı Hemin Omar Ahmad'ın *Rêberî Dosyeyî Kargêrî Zana û Nawardanî Kurd le Kitêbxaneyî Meşîxetî Tûrkiya* adlı bibliyografik çalışmasıdır. Ahmad bu çalışmasıyla 1800-1930 yılları arasında yaşamış ve Maşihat Arşivinde kayıtlı olan Kürt alim ve meşhurlarını gün yüzüne çıkarmaktadır.

Dergimizin üçüncü yazısı *Dewranê Modernan ê Edebiyatê Zazaki Ser yo Onayîşo Cematki* adlı çalışmadır. İbrahim Dağılma'nın bu çalışması modern Zaza edebiyatı dönemlerinin belirlenmesine yöneliktir.

Hasan Çiftçi *Dilini Kesmek: Ortak Atasözlerin Hikâyeleri: Fârsî-Kurmancî-Zazakî-9* adlı çalışmasında Kurmancî, Zazakî, Farsça ve Türkçe'de dil ile alakalı deyim ve atasözlerini ele almakta ve bu atasözlerine kaynaklık eden hikâyeler üzerinden ortak bir kültürel birikime vurgu yapmaktadır.

Diwanê Mela Mehmet Demirbaş dî Pêğemberi başlıklı yazı Danyal Apuhan'ın kaleme aldığı ve Mehmet Demirbaş'a ait olan elyazması divanında geçen Peygamberleri konu almaktadır.

Arkawan Mohammad Obed *Destpêk le Şiirî Klasîkî Kurdî da -Salim be Nimûne* adlı çalışmasında Güney Kurmancisi olarak da bilinen Sorani diyalektinde klasik şiirin öncüsü kabul edilen Salim'i konu almaktadır.

Dergimizin son makalesi de İlyas Arslan'ın kaleme aldığı *Mamekiye de Durimê Zonê Zazaki* adlı çalışma olup Mamekiye olarak adlandırılan Tunceli ili şehir merkezinde insanların kendi anadillerine yaklaşımları, istekleri anket tekniği kullanılarak anlaşılmaya çalışılmıştır.

Adı geçen değerli çalışmaların akademik dünyada ilgili göreceğini düşünüyor sonraki sayılarda benzer çalışmaların devamını umut ediyoruz...

BERAWIRDKIRINEK LI SER QESÎDEYA AVÊ YA FÛZÛLÎ Û HELBESTA EY AV Û AVÊ YA FEQÎYÊ TEYRANÎ JI ALİYÊ HÊMANA AVÊ VE

A Comparison of the Fuzuli's Water Qasida and Feqîyê Teyran's Ey Av û Av Poem in Water Element

Fahri KARACA*

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article

Makale Geliş Tarihi/Received: 04.10.2021

Kabul Tarihi/Accepted/: 05.12.2021

Atıf/Citation: Karaca. F. (2021).

"Berawirdkirinek li ser *Qesîdeya Avê ya Fûzûlî û Helbesta
Ey Av û Avê ya Feqîyê Teyranî ji Aliyê Hêmana Avê ve*" 13, 9-35.

Orcid: 0000 0001 2345 6789

KURTE

Di vê xebatê da Qesîdeya Avê ya Fûzûlî û helbesta Ey Av û Avê ya Feqîyê Teyranî di çerçoveya edebiyata berawirdî da ji aliyê hêmana avê ve hatine berawirdkirin. Armanca xebatê ew e ku di her du berheman da cihê ava ku di edebiyata klasîk da bi awayên curbicur gelek caran hatiye bikaranîn, bê diyarkirin di vî warî da hevşibîn, û cudahîyên vê hêmana hevpar bên ravekirin. Fûzûlî û Feqî av, di helbestên xwe da bi gelek wate û awayan ve bi kar anîne. Ligel vê di qesîdeya Fûzûlî da av bi piranî bi bawerîya "rehmetbûna Pêxemberê Îslamê ji bo alemê" ve têkildar hatiye bikaranîn. Di helbesta Feqî da jî av bi piranî yek ji çar hêmanên afirandinê (enasira erbea) ye, armanca bingehîn a helbestê (hewla fêmkirina heqîqeta hebûn û afirandinê) di ser hêmana avê ra hatiye honandin. Bi qasî ku di lêkolînê da hatiye dîtin ligel ku di her du helbestan da av ji hin alîyan ve hevşibînan nîşan dide jî lê bi piranî bi awa û wateyên xwe yê ji hevûdin cuda ve derdikeve pêş.

Bêjeyên Sereke: Av, Berawirdî, Fûzûlî, Feqîyê Teyran, Qesîdeya Avê, Ey Av û Av.

* Fahri Karaca, Xwendekarê Doktorayê, Zaningeha Bingolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî. karaca.fhr@gmail.com

A Comparison of the Fuzuli's Water Qasida and Feqîyê Teyran's Ey Av û Av Poem in Water Element

ABSTRACT

In this study, water element in Fuzuli's Water Qasida (Eulogy) and Feqîyê Teyran's Ey Av û Av poems is compared in the framework comparative literature. The purpose of this study is to determine the place of the of the water in both poems which are used in different meanings and purposes many times in classical literature and to explain the commonalities, similarities and differences of this element. Fuzuli and Feqî were used the water in their poems in many different meaning and ways. However, the water in Fuzuli's qasida was commonly used in relation to the belief that "Prophet of Islam is a blessing to the worlds". On the other hand, the water in Feqî's poem is mostly used as one of the four elements (enasirê erbea) in creation. The main idea (the effort to learn the truth of existence and creation) in poem was built on the element of water. As it is seen the study, although the water element in both poems shows similarities in some respects, it mostly stands out with its differences in meaning and usage.

Key words: Water, Comparative, Fuzuli, Feqîyê Teyran, Water Qasida, Ey Av û Av

Destpêk

Şaxezanista ku berhemên edebiyatê lédikole, rexne dike zanista edebiyatê ye. Ligel dîroka edebiyatê, lêkolîna edebiyatê û rexneya edebiyatê, zanista edebiyata berawirdî jî yek ji bineşaxên zanista edebiyatê ye. Keresteyên zanista edebiyata berawirdî berhemên edebî ne (Aytaç, 1997:15). Edebiyata berawirdî, her çiqas rehên wê heta serdema klasîk bên şopandin jî, wek dîsîplînek di serê sedsala XIX. da ketiye rojevê (Aydın, 2020:11).

Wek peywir û fonksiyon, zanista edebiyata berawirdî du berhemên ku bi zimanên ji hevûdin cuda hatine nivîsîn, ji aliyê mijar, raman, an jî şiklî ve lédikole, aliyên wan ên hevpar, hevşib û cuda tespît dike û li ser sedemên van aliyan şîroveyan dike (Aytaç, 1997: 7). Karê berawirdkirinê dikare bi awayekî hûrgilîtir jî bê kirin. Du berhem ji aliyê taybetmendiyên şiklî ve, ji aliyê cureya edebî û taybetmendiyên vê cureyê ve, ji aliyê derdora edebî, serdem, qad û biza-va edebî ve, ji aliyê nivîskaran/helbestvanan ve, ji aliyê hunerên edebî, ziman, vegotinê ve, ji aliyê riwangeh, vegêr û felsefeya jiyanê ve, ji aliyê mijar, tema, pe-yam, motif, tîp, ramanên sereke û yên navberîn ve, ji aliyê jiyanê çandî û civakî ve û ji aliyê têkiliya dîsîplînên cuda ve dikare bê lêkolîn (Menteşe, 2020:289). Aytaç her çiqas ji bo xebatên edebiyata berawirdî, dibêje berawirdkirin di nav-bera du berhemên xwedî du zimanên ji hevûdin cuda da tê kirin jî, di dereka din a heman berhema xwe da dibêje berawirdkirin çawa ku dikare li ser edebiyata neteweyî bê kirin, bi heman awayî dikare li ser berhemên edebî yên neteweyên cuda jî bê kirin (Aytaç, 1997: 15). Di warê ziman û ligel vê çandên berhemên ku de bibin keresteyên xebatên edebiyata berawirdî da du nêrîn hene: Ji van nêrînan

a yekem dibêje berawirdkirin tenê dikare di navbera wan mijar, tîp, berhem, cure, hêma yan jî nivîskaran bê kirin ku malê ziman û çandên ji hevûdin cuda ne. Berovajî vê, nêrîna duyem berawirdkirinê di navbera sînoren neteweyî da jî pêkan dibîne (Menteşe, 2020:288-89). Ligel ku ev nêrînen cuda hene jî, bi giştî tê qebûlkirin ku mijara edebiyata berawirdî, hem dikare navneteweyî be hem jî neteweyî be. Çawa ku berhemeka xwemalî dikare bi berhemeka biyanî ve bê berawirdkirin wisa jî berhemeka xwemalî bi berhemeka xwemalî ya din ve dikare bê berawirdkirin. Berhemên heman niviskarî/ê û helbestvanî/ê jî dikarin bên berawirdkirin. Merc ew e ku di navbera berhemên ku dê bên berawirdkirin da têkiliyek (hevşibîn an jî cudahî) hebe (Bayram, 2004:72). Ev berawirdkirin ne tenê di navbera berheman tenê di navbera helbestan da jî dikare bê kirin (Menteşe, 2020:290).

Çawa ku ji agahiyên jor diyar dibe, di xebatên edebiyata berawirdî da ya girîng hebûna hêmanên hevpar e di navbera berhemên cuda da (wekî mijar, motif, tîp, vegêr, peyama û hwd.). Ev hêmanên hevpar hem dikarin xwedî aliyên hevşib bin hem jî yên cuda bin. Bi gotineka din hêmanên hevpar di berhemên cuda da çima û çawa hatine xebitandin, cih û bandora wan a li ser berheman çi ye, têkiliya wan û mijarê çi ye, di kîjan xalan da hevşibîn û cudahiyan dihevin û hwd. gelek pirs û bersivên pirsên bi vî rengî dikevin nava qada xebatên edebiyata berawirdî.

Di çarçoveya vê nêzîkbûnê da mijara vê xebatê berawirdkirina hêmana avê ye di *Qesîdeya Avê ya Fûzûlî* û di helbesta *Ay Av û Avê ya Feqiyê Teyranî* da. Ji bo ku ev her du helbest ji bo xebateka edebiyata berawirdî bikaribin bên hilbijartin sedemên jêrîn dikarin bên jimartin:

- Qesîdeya Fûzûlî bi zimanê Tirkiya Azerî hatiye nivîsîn, helbesta Feqî bi Kurdiya Kurmancî hatiye nivîsîn. Lewma her du berhem ji aliyê zimanî ve ji hevûdin cuda ne. Lewma jî bêyî ku nîqaş li ser “Tenê du berhemên bi zimanên cuda dikarin bên berawirdkirin an ên bi heman zimanî jî dikarin bên berawirdkirin?” çê bibe ev her du helbest ji aliyê cudahiya zimanî ve ji bo berawirdkirinê guncan in.
- Hem qesîdeya Fûzûlî hem jî helbesta Feqî berhemên edebiyata klasîk ên Îslamî ne. Wek rastiyeka dîrokî ji aliyê neteweyîbûn û navneteweyîbûnê ve du aliyên edebiyata klasîk a Îslamî hene. Yek ew e ku bi awayekî siruştî berhem bi gelek zimanên cuda, di çandên cuda da, ku vê rewşê bandor li ser hebûna mijarên cuda kiriye, hatine çêkirin ku ev aliyê wê yê neteweyî nîşan dide. Ji aliyê din ve *Îslamîbûna* wê jî amaje bi hevpariya wê dike ku wekî Adak jî dibêje ev edebiyat di bin bandora baweriyaya Îslamî, zimanên Erebi û Farisî û çanda Îranî da li gor hin rêbazan hatiye çêkirin (2013: 26). Ji ber vê hevpariyê ye ku ziman û çand biguhere jî

di nav berhemên edebiyata klasîk a Îslamî da ji aliyê teşe, mijar, motîf, sembol û hwd. hêmanên edebiyatê ve em rastî gelek berheman tên ku hevpariyên dihewînin. Lewma jî ji aliyê edebiyata berawirdî ve qesîdeya Fûzûlî û helbesta Feqî ji aliyê neteweyî ve du berhemên ji hevûdin cuda ne lê ji aliyê tradîsyona edebiyatê ve her du jî di nav edebiyata klasîk a Îslamî da ne.

- Hem di qesîdeya Fûzûlî da hem jî di helbesta Feqî da *av* cihêkî navendî werdigire. Di du helbestên bi zimanên cuda û di du helbestên malê heman bizav û tradîsyonê da hebûna heman hêmana hevpar û navendîbûna wê, ji aliyê xebatên berawirdî ve cihê lêkolînê ye.

Wek rêbaz, ji ber ku Fûzûlî ji aliyê kronolojîk ve beriya Feqî jiyaye di her beş û binbeşê da li gor mijara beşê/binbeşê em ê pêşî li ser qesîdeya Fûzûlî rawestin û wê binirxînin piştra jî li ser helbesta Feqî rawestin. Xebat dê ji du beşan pêk were. Di beşa yekem da em ê derheqê jiyân û berhemên her du helbestvanan da bi kurtasî hin agahiyên bidin piştra jî jiyân û berhemên wan berawird bikin. Di beşa duyem da jî, ku beşa bingehîn a vê xebatê ye, em ê her du helbestan bi kurtasî ji aliyê naverokan ve berawird bikin û piştra li ser hêmana avê raswestin. Em ê hewl bidin dîmen û wesfên ku hêmana avê di helbestan da wergirtiyê diyar bikin û ji van aliyan ve hevşibîn û cudahiyên wê berawird bikin.

Divê bê gotin ku ev xebat di warê berawirdkirina qesîdeya Fûzûlî û helbesta Feqî da yekem xebat nîne. Di lêkonîna xwe da em rastî du xebatan hatin ku di van da her du helbest ji hin aliyan ve hatine berawirdkirin. Yek M. Emîn Demîr (2014) amade kiriye ku bi navê *Berawirdkirina "Ey av û av" a Feqiyê Teyran û "Su Qesîdesî" ya Fuzûlî* ye, ya din jî xebata Gökhan Aydın (2015) e ku bi navê *Fuzûlî'nin 'Su Kasidesi' ve Faqiye Teyran'ın 'Ey Av u Av (Ey Su)' Şiirindeki "Su" Motifi Üzerine Bir Değerlendirme* (Nirxandinek li ser Motîfa "Av"ê di 'Qesîdeya Avê' ya Fûzûlî û Helbesta 'Ey Av û Av'ê a Feqî Teyranî da) hatiye çêkirin. Demîr her du berhem ji aliyê mijar, fikr û ruxsarî ve berawird kirine, xalên hevpar û cuda nîşan dane. Lê divê bê gotin ev xebat gelekî kurt e û gelek aliyên mijara xebata me di xwe da nahewîne. Xebata Aydın zêdetir nêzîkî xebata me ye. Aydın di gotara xwe da qesîdeya Fûzûlî û helbesta Feqî ji aliyê motîfa avê ve berawird kirine û zêdetir li ser hevşibîna di navbera motîfa avê da rawestiyaye. Ew gihiştîye wê encamê ku di her du berheman da jî hal û teswîrên avê, şexsandina avê, qudreta avê û fonksiyên avê da bi piranî hevşibîn û hevparî hene (Aydın, 2015:59). Di xebata xwe da em ê ligel hevşibînan li ser cudahiyên hêmana avê jî bi hûrgilî rawestin ku li gor me ligel hevşibînan nîşandayîna xalên cuda yên hêmana avê di her du helbestan da dê di warê berawirdkirina her du helbestan da dîmeneka xurttir derxe holê. Ji bo me xaleka din a girîng jî ew e ku gelo di navbera her du helbestan da dîmenên hêmana avê bi piranî di-

şibin hevûdin an cudahî zêdetir in. Lewra berawirdkirineka bi vî rengî dê nîşan bide ku *ava* ku di edebiyata klasîk da gelek caran bi gelek awa û wateyan ve cih girtiye, di her du helbestan çima û çawa hatiye xebitandin. Ev ê jî nîşan bide ku ji vî aliyê ve her du helbest çiqas ji hevûdin nêzik in an jî dûr in.

Di vê xebatê da ji bo metn û şerha qesîdeya Fûzûlî em ê ji berhemên Metin Akar (2005) û Adem Çalışkan (1999) sûd werbigirin, ku li ser şerha qesîdeya Fûzûlî hatine çêkirin û ji bo helbesta Feqî em ê metna ku di *Dîwana* wî da cih digire bi kar bînin ku Kadrî Yıldırım (2014) amade kiriye.

1. Jiyan û Berhemên Fûzûlî û yê Feqiyê Teyranî

Di vê beşê da bêtir ku em têkevin nav hûrgiliyan em ê her du helbestvanan bi kurtasî bidin nasîn û hevşibîn û cudahiyên wan ên biyografîk, berhem û taybetmendiyên wan ên sereke berawird bikin.

1.1. Fûzûlî

Di sedsala XVI. da jiyaye. Navê Fûzûlî yê rast Mihemed, navê bavê wî Silêman e. Li herêma Iraqê hatiye dinyayê lê derheqê cih û dîroka jidayikbûna wî da agahiyên teqez tune ne. Ligel vê tê qebûlkirin ku di sala 1483an da li Kerbelayê hatiye dinyayê. Hemû jiyana xwe li Hille, Kerbela, Necef û Bexdayê derbas kiriye û ji vê herêmê derneketiye derve. Wî di zanistên hedîs, tefsîr, hendese (geometrî), hey'et û hikmetê da xwe gihandiye. Wek mexles *Fûzûlî* bi kar aniye. Berhemên wî yê bi zimanê Tirkî, Farisî û Erebî li ber dest hene. Berhemên wî menzûm û mensûr in û wiha ne:

Yên Tirkî:

Menzûm: Dîwan, mesnewiya Leyla û Mecnûnê, Beng ü Bâde,
Tercime-ê Hadîs-i Erba'în, Sohbet'ul-Esmar
Mensûr: Hadîkatu's-Su'adâ, Mektûb

Yên Farisî:

Menzûm: Dîwan, Sakî-name, Husn û Işq, Enîsu'l-Qelb
Mensûr: Rind û Zahid, Rîsaleyê Mu'amma

Yên Erebî:

Menzûm: Dîwan
Mensûr: Matla'u'l-Î'tiqâd

Ligel van berhemên nîqaş li ser hebûna berhemên wî yê bi Kurdî jî hene¹. Di vî warî da Temo (2021) hin beytên Kurmancî peşkêş kirine û gotiye ihtimal e ev beyt, ên Fûzûlî bin. Tiştêkî din ku ihtimala hebûna berhemên Kurdî yê Fûzûlî xurt dike (her çiqas di vê çavkaniyê da hatiye angaştkirin ku ev agahî dibe ku

1 Ji bo nîqaşeka kurt di derbarê vê mijarê da bnr: Karak, 2021: 104-105.

piştra hatibe lêzêdekirin jî) ew e ku tê gotin ku li ser kêla wî wiha hatiye nivîsîn: “Vî hunermendî bi zimanên Erebi, Farisî, Tirkî û Kurdî helbest nivîsîne”.²

Fûzûlî di sala 1556an da ji ber şewba webayê li Kerbelayê jiyana xwe ji dest daye (Belli, 2021: 1001, Taşkesenlioğlu, 2020, Çalışkan, 1999: 13, 14, 16, 22-23, Cañçelik, 2016: 2).

1.2. Feqiyê Teyran

Di sedsalên XVI-XVII. da jiyaye. Navê wî yê rast Mihemed e. Navê bavê wî Ebdilâh e. Di sala 1562an da li gundê Warezûrê yê li ser navçeya Miksê hatiye dinyayê. Feqî di zaroktiya xwe da dest bi xwendinê kiriye. Bi qasî ku tê gotin wî ewilî li Miksê di medreseya Mîr Hesênê Welî da dest bi xwendinê kiriye. Feqî li hin deveran geriyaye û ji xeynî medreseya Mîr Hesênê Welî di hin medreseyên din ên wekî, Medreseya Hîzanê, Medreseya Cizîrê û di Medreseya Finikê da perwerde dîtiye. Li Cizîrî wî û Melayê Cizîrî (1570-1640) hev dîtine û bi hev ra wext derbas kirine, ligel hevûdin hin muşære gotine. Feqî di salên kalîtiya xwe da vegeriyaye gundê Şandîsê yê li ser Hîzanê û di sala 1632an da li vî gundî wefat kiriye. Feqî helbestvanekî pîralî ye. Wî ji aliyekî ve di warê edebiyata dînî-tesewifê da di berhemên xwe da cih daye mijarên wekî wehdetê wicûd, felsefe, kelim, fiqih, hedîs, şîretên dînî, evîna Xwedê û Pêxemberê Wî û ji aliyên din ve di warê edebiyata neolî da gelek mijarên têkildarê mirov, sirûşt, hiciw, bûyerên dîrokî û hwd. da berhem û helbest çêkirine. Berhemên Feqî bi giştî dibin du beş: Berhemên wî yê menzûm; Şêxê Sen'anî, Bersîsê Abid, Zembîlfiroş, Kela Dimdimê û helbestên wî yê curbicur (wekî qesîde, musemmet, xezel, qit'e). Feqî di berhemên xwe da wek mexles, *Mîm û Hê*, *Mîm û Hê û Dal*, *Feqî*, *Feqiyê Teyran*, *Muksî* bi kar anîne. Berhemên berdest ên Feqî bi Kurdiya Kurmancî ne, lê di belgeyeka Osmanî da, ku dîroka wê 1898 e, hatiye gotin ku Feqiyê Teyran xwedî helbestên Kurdî û Farisî ye (Adak û yê din, 2014:112, 113,119, Çiçek û Yılmaz, 2017:174-180, Sönmez, 2020, Kaya, 2017:1,13, Adak, 2013: 211-217, Teyran, 2014: 13-15, İli, 2018: 3).

1.3. Ji aliyê jiyana û berhemana ve berawirdkirina Fûzûlî û Feqiyê Teyranî

Di vê binbeşê da em ê li gor agahiyên jor ên derbarê her du helbestvanan da aliyên wan ên hevpar û cuda berawird bikin. Lê çawa ku li jor diyar e li ser hebûna berhemên Kurdî yê Fûzûlî û hebûna berhemên Farisî yê Feqî da hin agahî hebin jî ji ber ku ev berhem li ber destan tune ne (hin metnên ku ihtimal e ku yê Fûzûlî bin, hebin jî di vî warî da teqezîyeke zanistî hêj tune), em ê berawirdkirina zimanê/ên berhemên wan li gor berhemên heyî yê her du helbestvanan bikin.

2 bnr: <https://qafqaz.ir/fa/شېخ-و-عمادالدين-نسيمى-مزارهاي-عمادالدين-نسيمى> (05.10.2021).

Hevşibîn: Navê her du helbestvanan jî Mihemed e. Fûzûlî di sala 1556an da wefat kiriye û Feqî 6 salan piştî wefata Fûzûlî di sala 1562an da hatiye dinyayê. Lewma dikare bê gotin di navbera serdema jiyana wan da cudahiyeka mezin tune. Hem Fûzûlî hem jî Feqî ji herêmên xwe bi dûr neketine. Her du jî xwedî hin cure berhemên hevpar in (wek mînak, xezel, qesîde, menzûm). Her duyan jî di mijarên hevpar da, wekî mijarên dînî (tesewif, evîna Xwedê û Pêxemberê Wî û hwd.), bûyerên dîrokî da berhem çêkirine. Bo mînak berhema *Hadîkatu's-Su'adâ* ya Fûzûlî li Kerbelayê şehîdbûna Hz. Husên vedibêje (Aydın Yağcıgölu, 2009:4). Berhema *Kela Dimdimê* ya Feqî derbareyê Şerê Kurdan û Şahê Îranê da ye (Adak, 2013:216).

Cudahî: Navê bavê Fûzûlî Silêman, ê Feqî Ebdilâh e. Cihê jidayikbûn, jiyân û wefata Fûzûlî û Feqî ji hevûdin cuda ye. Fûzûlî li Kerbelayê hatiye dinyayê, li herêmên Hille, Kerbela, Necef û Bexdayê jiyaye û li Kerbelayê wefat kiriye. Feqî li Miksê hatiye dinyayê, li herêmên Miks, Cizîr, Hîzanê jiyaye û li Hîzanê wefat kiriye. Cihên ku Fûzûlî lê perwerde dîtiye nayên zanîn lê derbarê yên Feqî da agahî û navên hin cih û medreseyan tê zanîn (wekî medreseya Mîr Hesenê Welî, Medreseya Hîzanê, Medreseya Cizîrê û Medreseya Finikê). Berhemên Fûzûlî yên berdest bi sê zimanan hatine çêkirin (Tirkî, Farişî, Erebi), yên Feqî ên heyî tenê bi Kurdî ne. Hejmar û cureyên berhemên heyî yên Fûzûlî ji yên Feqî zêdetir in. Fûzûlî tenê mexleşek (*Fûzûlî*) bi kar aniyê lê Feqî gelek mexleş bi kar anîne (*Mîm û Hê, Mîm û Hê û Dal, Feqî, Feqiyê Teyran, Muksî*).

Metnên Qesîdeya Fûzûlî û Helbesta Feqiyê Teyranî

Qesîdeya Fûzûlî	Helbesta Feqiyê Teyranî
Zimanê Resen (Tirkî-Azerî) / Wergera Kurmancî	Zimanê Resen (Kurdî-Kurmancî)
1. <i>Saçma ey göz eşkden gönlümdeki odlare su Kim bu denli dutuşan odlara kılmaz çare su Ey çav li agirên dilê min avê nereşîne ku ji bo agirên wiha pêketî ra ji avê çare nayê.</i>	1. <i>Ey av û av ey av û av Ma tu bi işq û muhbet î? Mewc û pêlan davêy bilav Bê sekn û bê rahat î</i>
2. <i>Ab-ı gündür günbed-i devvare rengi bilmezem Ya mûhît olmuş gözümünden günbed-i devvare su Rengê vê sêla asîmana ku digere rengê avê ye yan nizanim ava ku ji çavên min tê sêla asîmanî dagirtiyê</i>	2. <i>Bê rahat û bê sekne î Yan aşiqê Baxoy xwe î? Yan şubhetê qelbê me î Ji emrekî bi lez ketî</i>
3. <i>Zevk-ı tîğundan aceb yoh olsa gönlüm çak çak Kim mürûr ilen bırağur rahneler dîvâre su Ji zewqa şûrên te dilê min perçe perçe be jî ne tişteki ecêb e, çawa ku dema av di dîwarî ra diçe tê da derzan vedike.</i>	3. <i>Da ez bizanim vê sirê Ji hindikî heya pirê Ji me'neya vê gurgurê Ji kê ra dikî vê taetê?</i>

4. <i>Vehm ile söyler dil-i mecruh peykanun sözün İhtiyat ile içer her kimde olsa yare su Dilê birîndar bi tirs behsa peykanên te dike, çawa ku her kesê birîndar bi tirsê avê vedixwe.</i>	4. <i>Ji kê ra dikî zikrê bi hal Qet gujgujê nakî betal Teşbihê min reht û 'emal Qet bi şev û rojan xew netê</i>
5. <i>Suya virsün bağ-ban gül-zarı zahmet çekmesün Bir gül açılmaz yüzün tek virse min gülzare su Beçevan bila zehmet neke bila gulzarê bide ber avê, hezar gulzarî jî av bide guleka wekî rûyê te venabe.</i>	5. <i>Lew şev û rojan bê xew î Ji mîhnetê lêk ditewî Şevtariyan qet nahewî Ji emrê (kê) bi lez ketî?</i>
6. <i>Oğşadabilmez gubarını muharrir hattuna Hame tek bahmahdan inse gözlerine kare su Wekî qelemê ji ber nêrinê ava reş bikeve çavê xetkêş jî nikare xubara xwe bişibîne xetên (mûzerikên rûyî) te</i>	6. <i>Ji emrekî ti tê bilez Sewdaser î şubhetê ez Ji kê ra dikî çûna bilez Vê serqutan û xizmetê</i>
7. <i>Arzûn yadıyla nem-nâk olsa müjganum n'ola Zâyî olmaz gül temennâsiyle virmek hare su Eger bijangên min bi bibîranîna dêmên te şil bibin wê çi bibe, bi armanca gul girtinê avdana keleman, ziyankirina avê nîne.</i>	7. <i>Xizmet dikî bê pê û dest Ji kê ra dikî çend kûh û best Baxo nego gavek vewest Daîm diçî dengê te tê</i>
8. <i>Gam günü itme dil-i bîmârdan tîğun diriğ Hayrdur virmek karanu gicede bîmâre su Di roja xemgîniyê da şûrên (nêrinên) xwe ji dilê nexweş teksîr neke, di şeva tarî da bi nexweşan avdayin xêr e.)</i>	8. <i>Dengê te bi roj û şev Taet dikî bê qelb û dev Pê radîbin ji mevc û kef Şîrîn ji rengê qudretê</i>
9. <i>İste peykânın gönül hecrinde şevkum sâkin it Susuzam bir kez olsun bu sahrâda menûm-çün âre su Dilo, peykanên (bijang) wî bixwaze di dema dûrbûnê da, daxwaza min aram bike, tî me carekê be jî ji bo min li vê çolê li avê bigere.</i>	9. <i>Geh geh sipî şubhetê şîr Qet mislê te naçin çu şîr Dengê te tê yar tete bîr Meyla hebîb ji çûna te tê</i>
10. <i>Men lebün müştâkiyem zühhâd keuser tâlibi Nitekim meste mey içmek hoş gelür huş-yâre su Ez daxwazkerê lêvên te me wekî zahidê talibê kewserê, çawa ku ji kesê mest ra mey, ji kesê hişyar ra av xweş tê</i>	10. <i>Lazim te mehbûbek heyê Yan meyl û metlûbek heyê Yan dost û meqsûdek heyê Lew bê lîbas û kîswet î</i>
11. <i>Ravza-i kûyuna her dem durmayup eyler güzâr Aşık olmuş galiba ol serv-i hoş-reftâre su Av her dem bê rawestan diherike beçeyê warê wî, qey aşiq bûye li wê serwiya xweşmeşê.</i>	11. <i>Lew bê lîbas û tazî yî Di seyr û reqs û gazî yî Ji kê ra dikî işqbaziyî? Remzê di xwe îşaret î</i>
12. <i>Su yolın ol kûydan toprağ olup dutsam gerek Çün rakîbümdür dahi ol kûya koymam vare su Divê ez bibim ax û rêya wî warî bigirim li avê, lewra av reqîbê min e, ez nahêlim av xwe bigihine wî warî.</i>	12. <i>Van tesbîhan ji kê ra dikî? Remz û sirran vêk ra dikî Hemyan ji Baxo ra dikî Digerî ji mehra xurbetê</i>
13. <i>Dest-bûsî arzûsiyle ger ölsem dostlar Kûze eylen toprağum sunun anunla yâre su Eger bi hesreta destmaçkirina wî bimrim dostno, ji axa min cêrê çekin û bi wê avê bidin yarê.</i>	13. <i>Digerî di nêv pîredinê Qet nanivî nasekinî Reh şubhetê qelbê min î Ji mîhnetan û zehmetê</i>

<p>14. <i>Sevr ser-keşlûk kîlur kumrî niyâzından meğer Dâmenin duta ayağına düşe yalvare su</i> Serwî serkêşyan dike ji ber libergerîna qumriyî, ji bo ku av dawa wê bigire, xwe bavêje ber dest û piyên wê, li ber bigere.</p>	<p>14. <i>Zehmetber î mîhnetkeş î Ku nazik î teb'et xweş î Bê rûh li erdê dimeşî Bê dest û pê tuj ku ve tê?</i></p>
<p>15. <i>Îçmek ister bülbülün kanın meğer bir reng ile Gül budağınun mizacına gire kurtare su</i> Qîta gulê bi awayekî dixwaze xwîna bilbilî vexwe, av têkeve xisleta wê rizgar bike wî.</p>	<p>15. <i>Bê dest û çeng û per Ew pêl û mewc û fetl û ger Peyda dibin jê "kerr" û "fer" Nakî beyana illetê</i></p>
<p>16. <i>Tıynet-i pâkini rûşen kılmış ehl-i âleme İktidâ kılmış tarik-i Ahmed-i Muhtâre su</i> Avê xisleta xwe ya paqij li ber ehlê alemê raxistiye û ketiya dû rêka Ehmedê Muxtarî</p>	<p>16. <i>Vê 'illetê tekrar bike Bes vê sîrrê sitar bike! Carek li min izhar bike Da ez bizanim qissetê</i></p>
<p>17. <i>Seyyid-i nev-i beşer deryâ-yı dürr-i isitfâ'</i> <i>Kim sepübdür mu'cizatı âteş-i eşrâre su</i> Serwerê cinsê mirovan, deryaya durrê biqîmet, ku mu'cizeyên wî av reşandiye li agirê neqencan.</p>	<p>17. <i>Da ez bizanim meselê Tiştêk ji behsa ezêlê Ji bunyatbûna ewwelê Ji dewran û çerxa xîfetê</i></p>
<p>18. <i>Kılmağ için tâze gül-zâr-ı nübüvvet revnakın Mu'cizinden eylemiş izhar seng-i hâre su</i> Ji bo ku gulzara pêxemberiyê hêşîn bike, bi mu'cizeyên xwe ji kevirê hişk av derxistiye.</p>	<p>18. <i>Ew xîfeta alem di nav Ji berketa wê feyz û kav Min temenna kirî ji av Ji me'neya heqîqetê</i></p>
<p>19. <i>Mu'cizi bir bahr-i bî-payan imiş âlemde kim Yetmiş andan min min âteş-hane-i küffâre su</i> Mu'cizeyên wî behreka bêdawî bûne ku ji wan av gihîştîye bi hezaran agirgehên kafiran.</p>	<p>19. <i>Heqîqeta çar cewheran Ji me'rîfeta enasiran Vemeşere yar û biran Bê fem bibêj vê hîkmetê</i></p>
<p>20. <i>Hayret ilen barmağın dişler kim itse istimâ'</i> <i>Barmağından virdüğün şiddet günü Ensâr'e su</i> Kî wê roja çetin ku te ji tiliya xwe av da Ensarî bibihîze bi heyirînê tiliya xwe gez dike.</p>	<p>20. <i>Gerçî ji nuqtê lal tu yî Bê zar û qîl û qal tu yî Lazîm bi îşqê hal tu yî Bê dev î pîr ji sirra qudretê</i></p>
<p>21. <i>Dosti ger zehr-i mâr içse olur âb-ı hâyat Hasım su içse döner elbette zehr-i mâre su</i> Dostê wî eger jehrê marî vexwe wê bibe ava heyatê, dijminî wî eger avê vexwe helbet wê av bibe jehrê marî</p>	<p>21. <i>Bê fehm û qîl û qal bibêj Hindî bi lefzê hal bibêj Her Mîm û Hé û Dal bibêj Metn û beyana kaxetê</i></p>
<p>22. <i>Eylemiş her katreden min bahr-ı rahmet mevc-hîz El sunup urgaç vuzû' için gül-i ruhsâre su</i> Ji bo ku destnimêjê bigire dema ku destê xwe dirêjî avê kiriye û av li rûyê xwe yê wekî gulê xistiye, ji her dilopê bi hezaran behrên rehmetê pêl dane.</p>	<p>22. <i>Vê kaxetê îspat bike Qeydê di hûr ihtiyat bike Qenc vê bunyad bunyad bike Wazîh ku fehma min ne tê</i></p>
<p>23. <i>Hâk-i pâyine yetem dir ömrlerdür muttasıl Başını daşdan daşa urup gezer âvâre su</i> Bi salan e ku av ji bo ku xwe bigihîne xaka piyên wî serê xwe li wî û li wî kevirî dixwe, sergêj digere.</p>	<p>23. <i>Bi dar û dinya setrem î Avê bi Rebbê alemî Tu hadis î yan qidem î Yan tu nizanî hîkmetê?</i></p>

<p>24. Zerre zerre hâk-i der-gâhına ister sala nûr Dönmez ol der-gâhdan ger olsa pâre pâre su Av dixwaze kit bi kit nûrê berde axa dergaha te, eger perçe peçe be jî ji wê dergahê venagere</p>	<p>24. Gerçî ne meşrû ev suxen Rojek ji bunyada mezin Bihna qîdem jê hate min Yanê ji bunyada te tê</p>
<p>25. Zîkr-i na'tiün virdîni dermân bilür ehli hatâ Eyle kim def-i humâr için içer mey-hâre su Çawa ku serxweş ji bo werin ser hişê xwe avê vedixwin, gunehkar jî zikra ne'ta te ya li ser zîmanan wek derman dizanin.</p>	<p>25. Ev reng dibêt ava zelal: Borî li min ku ev çend sal Qet kes nekîr ev reng sual Heta giham vê saetê</p>
<p>26. Yâ Hâbîba'llâh yâ Hayre'l-beşer müştâkunam Eyle kim leb-teşneler yanub diler hem-vâre su Ey Hebîbê Xweda, ey bixêrterîni mirovan, ez daxwazkarê te me, çawa ku kesên ji tînan lêvqelîşî bûne herdem avê dixwazin</p>	<p>26. Heta gihame vê demê Carek nebû di nêv alemê Ebdek ji pişta Ademî Bîfikir di ehwalê şetê</p>
<p>27. Sensen ol bahr- keramet kim Şeb-i Mî'râc'da Şeb-nem-i feyzün yetürmüş sâbit ü seyyâre su Tu ew behra kerametan î ku di Şeva Mî'racê da aviya feyza te av gihandiyê sabit(dinya) û seyreyan(stêrk, gerestêrk).</p>	<p>27. Kanî dizên şet jê diçin Hingî Xwudê da ins û cin Evreng nekîr pîrsyar ji min Ji enbiya û ummetê</p>
<p>28. Çeşme-i hûrşîdden her dem zülâl-i feyz iner Hâcet olsa merkadün tecdîd iden mi'mâre su Eger hewcedariya mi'marê ku merqeda te nû dike bi avê çêbe, ji kaniya rojê her dem ava zelal a feyzê dê were.</p>	<p>28. Muksî dibê: "Avê we bû Pêxemberan aqil hebû Qet hewceê pîrsan nebû Wan dest gihabû suhbetê</p>
<p>29. Bîm-i dûzâh nâr-ı gam salmış dil-i sûzanuma Var ümîdüm ebr-i ihsânun sepe ol nâre su Tîrsa dogehê agirê xemê xistiye dilê min ê şewitî; hêviya min heye ku ewra ihsana te dê avê bireşîne li wî agirî.</p>	<p>29. Ji suhbeta cara ewil Pêxemberan zanî şîxul Eyb e li bal ehlê eqil Teftîş bike me'rîfetê</p>
<p>30. Yümn-i na'tünden güher olmuş Fuzûlî sözleri Ebr-i nisândan dönen tek lü'lü-i şeh-vâre su Bi xêra ne'ta te gotinên Fûzûlî wekî ava ku ji ewra nîsanê dikeve û dibe durrê biqîmet, bûne gewher.</p>	<p>30. Me'rîfetê teftîş biken Pîrsan ji bûna bîş biken Qenc vê qîssê teftîş biken Li arîfan kerahetê</p>
<p>31. Hâb-ı gafletten olan bîdar olanda rûz-ı haşr Eşk-i hasretten tökende dîde-i bîdâre su 32. Umduğum oldur ki ruz-i haşr mahrum olmayam Çeşm-i vaslun vire men teşne-i didâre su Di roja heşrê da dema ku çavên li xew şiyar bûn ji xeya xefletê û rondikên hesretê rijandin, hêviya min ew e ku ez mehrûm nemînim, kaniya wuslata te avê bide minê ku tî yê rûyê (te) ye.</p>	<p>31. Xelqê Xwudê aqil kirî Hem arîf û kamil kirî Nûrek di dil da hil kirî Eslê qîssê rê dibetê</p>

<p>32. Ê mislê min bê îlm û xet Mecnûnekî heywansîfet Teftîşa pirsan ew diket Bê rehnuma lehba me tê</p>
<p>33. Pirsê Feqî bê cih nebû Lewra di Furqanê hebû Erşê Xwudê li ser te bû Avê gelo di bîra te tê?</p>
<p>34. Avê cewab da ev suxen Ezmanê hal wê gote min Remzek ji Padişahê mezin Subhan ji wê seltenetê</p>
<p>35. Subhan ji Me'bûdê li ser Kî dê ji Xwudê kit xeber Em çar bakir îname der Genc bûn di kenza qudretê</p>
<p>36. Genc bûn di kenza eqdemî Baxo ji îşqa Ademî Îname karê alemî Zahir kirin vê sûretê</p>
<p>37. Zahir kirin em çar bakir e Ba û av û ax û agir e Heywan hemî jê çêkir e Dar û nebat û qîmetê</p>
<p>38. Dar û nebat û le'l û dur Heywan û esnafê di pur Teyr û tuyûr û le'l û dur Terkîb kirin vê wechetê</p>
<p>39. Teşbîhê me naferricîn Însan ji tîned xaricîn Lew cîn ji narî maricîn Her yek ji me yek teb'etê</p>
<p>40. Em çar teb'etan vêk ra did in Hin ateş in hin barid in Ji behra hewayê walidîn Melbûs kirin bi vê wechetê</p>
<p>41. Bi çar cihan em labis in Qedîm yek e em hadîs in Lewma ji tîna yabis in Hindî dixwazin rîfetê</p>

42. *Hindî meyla efrazî diken
Hem suflewî bazî diken
Hindî dişên gazî diken
Em carek bibînî ru'yetê*

43. *Carek bibînî em çar xetî
Bê meslehet nageritî
Ji xeşyetê nalebitî
Cuda kirîn ji wesletê*

44. *Ji wesletê cuda kirîn
Ji suhbetê em rakirîn
Hetta qiyam sewda kirîn
Sergeşte bûn di hedretê*

45. *Rasit e qewî ev mela!
Eslê qisê zanî hela?
Hîna ku bû "qal û bela"
Ma hûn nebûn di hedretê?*

46. *Di hedretê ma hûn nebûn?
Li hatîfî pêweste bûn
Di xizmeta Baxoy xwe bûn
Heyane roja axretê*

2. Hêmana Avê di Qesîdeya Fûzûlî û di Helbesta Feqî da

Di vê beşê da ewilî em ê bi kurtasî behsa naveroka qesîdeya Fûzûlî û helbesta Feqî bikin û wan berawird bikin. Piştra jî em ê bi hûrgilî li ser cihê hêmana avê di her du helbestan da rawestin, aliyên hevşib û cuda yên avê nîşan bidin, taybetmeniyên wê berawird bikin.

2.1. Naveroka Qesîdeya Fûzûlî û ya Helbesta Feqî

Qesîdeya Fûzûlî wek *Qesîdeya Avê* bê zanîn jî navê wê yê tam *Kasîde der Medh-i Hazret-i Fahr-ı Kâinat* (Qesîdeya ji bo Medhê Hezretê Fexrê Kaînatê) e. Çawa ku ji navê wê jî diyar e ev qesîde ji bo medhê Cenabê Pêxember hatiye çêkirin. Di edebiyata klasîk da ji bo menzûmeyên ku ji bo wesf, pesn û stâyîşa Cenabê Pêxember hatine nivîsîn, *ne't* tê gotin (Adak, 2019:154). Lewma jî qesîdeya Fûzûlî wek cure *ne't* e. Fûzûlî di qesîdeya xwe da hem evîna xwe ya ji bo Pêxemberî aniye ziman û hem jî wesfên Wî vegotine û pesnên Wî daye. Fûzûlî di qesîdeyê da behsa derdê xwe yê ji ber evîna Pêxemberî, behsa xweşîkbûna Pêxemberî dike, hêviya xwe tîne zimanî ji bo ku Pêxember hay ji wî hebe, alîkariya wî bike di rojên dijwar da, piştra behsa mucîzeyên Pêxemberî û mezinbûna pêxembertiya Wî dike, bi hatina Pêxemberî ve ji holê rabûna nebaşî û xirabiyan dike, behsa xêr û bereketa Wî ji bo alem û mirovan dike û herî dawî daxwaz dike ku Pêxemberî di roja axretê da bibîne, ligel Wî hevdîtîne pêk bîne.

Feqî di helbesta xwe da li dû heqîqeta hebûnê ye. Vê heqîqetê di çarçoveya fikra felsefîk a *enasira erbeyê* da dinirxîne. Bi qasî ku tê zanîn ev fikra felsefî pişta xwe dide serdema antîk a Yûnanî (Karlağa, 1991:149). Di felsefeya klasîk da ev çar hêman *av*, *ba*, *agir* û *ax* in. Ji filozofên Yûnan ên serdema antîk Thalesî (B.Z. 634-548) wek hêmana bingehîn a afrandinê *av*, Anaksimenesî (B.Z. 570-500) *ba*, Herakletiosî (B.Z. 540-480) *agir* qebûl kiriye û Empodeklesî (B.Z. 490-430) li van sê hêmanan *ax* jî zêde kiriye û di bingeha hebûnê da *av*, *ba*, *agir* û *ax* qebûl kirine (Kranz, 1994: 27, 34, 59, 98). Piştra fikra çar hêmanan ji aliyê Aristotelesî (B.Z. 384-322) ve hatiye sîstematîzekirin. Bi destê Suryaniyan ve derbasî Erebbî bûye û di felsefeya Îslamî da wek *enasira erbea* cih girtiye (Abbasoğulları, 2017:33). Li gor vê fikrê hemû hebûna li ser rûyê dinyayê ji têkelbûna van hêmanan pêk hatiye (Karataş, 2014:107). Ev fikra çar hêmanan di helbesta Feqî da bi zelalî xuya dike:

19. *Heqîqeta çar cewheran*
Ji me'rifeta enasiran
Vemeşêre yar û biran
Bê fem bibêj vê hîkmetê

Lewma jî dikare bê gotin helbesta Feqî helbesteka *felsefî/îrfanî* ye. Di van cure helbestan da evîna îlahî di çarçoveya teoriyên felsefî û tesewîfî da tê vegotin. Hin mijarên metafîzîk û ontolojîk di van cure helbestan da cih digirin ku di serî da “eşqa ezeli” tê. Eşqa ezeli di tesewîfê da amaje bi du tiştan dike: Ya yekem mijara peymana ezeli ye ku di Qur’anê da behsa wê tê kirin (E’raf 172). Di vê peymanê da Xwedê ji ruhên mirovan dipirse û dibêje “Ma ez ne Rebbê we me?” ruh jî bersivê didin dibêjin “Belê”. Li gor sûfîyan ev peymana eşqê ye. Xwedê ji ruhan dipirse dibêje “Ma ez ne me’şûqê we me?” ruh jî dibêjin “Belê Tu me’şûqê” me yî.” Tiştê duyem ê ku eşqa ezeli amaje pê dike, evîna Xwedê ye ji bo ebdên Wî. Li gor vê ewilî Xwedê bûye aşiqê ebdên xwe û piştra ebdên Wî bûne aşiqê Wî. Ji aliyê din ve li gor hin sûfîyan her tiştên di kaînatê da bi Xwedê ra di nav pêwendiyekê da ne û aşiqê Xwedê ne. Ji ber vê yekê di kaînatê da her tiştî berê xwe daye Xwedê, li dora xwe dizivire û bi bal Xwedê ve hereket dike (Adak, 2019:214). Di helbesta Feqî da wekî dê li jêr jî bê dîtin em hem rastî du aliyên eşq û evîna ezeli (ango evîna ebd bo Xwedê û evîna Xwedê bo ebd) tèn hem jî rastî ava ku ji hebûnên kaînatê ye, tèn ku aşiqê Xwedê ye.

Ji aliyê din ve em dikarin bibêjin ku ligel felsefeya çar hêmanan Feqî heqîqeta hebûnê di çarçoveya Qur’anê da jî dinirxîne. Di benda jêrîn (21) da bêtjeya “kaxet”ê wek temsîla Qur’anê dikare bê nirxandin. Lewra di peywesta benda jêrîn da “metn û beyan” wek ew tiştên ku di Qur’anê da hatine gotin, dikarin bên şîrovekirin.

21. *Bê fehm û qîl û qal bibêj*
Hindî bi lefzê hal bibêj
Her Mîm û Hê û Dal bibêj
Metn û beyana kaxetê

33. *Pirsa Feqî bê cih nebû*
Lewra di Furqanê hebû
Erşê Xwudê li ser te bû
Avê gelo di bîra te tê?

Di beyta jorîn (33) da bi hunera îqtibasê amaje bi ayeteka Qur'anê tê kirin ku di vê ayetê da tê gotin “Dema ku ‘erşê Wî li ser avê bû, Wî asman û erd di şeş rojan da afirandin” (Hûd-7). Ev jî nîşaneka din e ku şanî dide Feqî heqîqeta hebûnê ligel felsefeya çar hêmanan di çarçoveya Qur'an û Îslamê da jî şîrove kiriye.

Di helbesta Feqî da mijara sedema afirandinê jî cih digire. Ev têgihiştin jî di çarçoveya *kenza mexfî* (gencîneya veşartî) da di helbestê da xuya dibe. Di têgihiştina tesewifî ya Îslamî da têgiha *kenza mexfî* amaje bi hedîsa “Ez gencîneyeka veşartî bûm, min xwest ez bêm zanîn, ji bo ku bêm zanîn min mexlûqat afirandin”ê dike. Li gor vê têgihiştinê alem ji ber evîna Xwedayî hatiye afirandin (Ih, 2018:13). Ev têgihiştina afirandina Xwedayî di benda jêrîn da bi vî awayî hatiye vegotin:

36. *Genc bûn di kenza eqdemî*
Baxo ji işqa Ademî
Înane karê alemî
Zahir kirin vê sûretê

Çawa ku tê dîtin li gor Feqî hemû alem ji çar hêmanan hatiye afirandin û sedema afirandinê jî bi risteya “Baxo ji işqa Ademî”, bi evîna Xwedê ya ji bo mirovan hatiye girêdan.

2.2. Hêmana Avê di qesîdeya Fûzûlî û di helbesta Feqî da

Di gelek bawerî û çandan da *av* wek sembolekê bi jiyan, bédawîbûn, nûjenbûn, saxbûn, paqîjbûn, zayokî û bi pîroziyê ve hatiye têkildarkirin (Gürkan, 2009:440). Bo mînak di mîtolojiya Misirê da hatiye bawerkirin ku di destpêka afirandinê da gerdûn ji avê pêk hatibû. Di mîtolojiya Mezopotamyayê da gerdûn ji tevlihevbûna behran derketiye holê. Di mîtolojiya Çînê da, ejdeha xwediyê avê ne, dema ku ew li esmanan şer dikin, ligel gurmîna esmanî durr dikevin erdê. Cardin di mîtolojiya Hindê da av afrînera hemû hebûnan e (Abbasoğulları, 2017:1-4). Ligel mîtolojiyan, *av*, di gelek baweriyên da jî cihêkî girîng werdigire. Bo mînak di Qur'ana Pîroz a Îslamiyetê da av bi gelek awayan

derbas dibe. Di hin ayetan da hatiye gotin ku mirov û hemû zindî ji avê hatine afirandin (Muminûn, 23: 13; Nûr, 24: 45; Fûrqan 25: 54; Kehf, 18: 37; Enbiya, 21: 30; Secde 32: 8; Yasîn, 36: 77; Qiyame, 75: 37; Tariq, 86: 6; Necm, 53: 46; Qamer, 54: 11/12; Însan, 76: 2; Abese, 80: 19). Xwedê avê (baranê) ji bo zindîyan wek nîmet dibexşîne (Bakara, 2: 22; Hicr, 15: 22; Zumer, 39: 21; Vaqia, 56: 68/69; Nehl, 16: 10; Fûrqan, 25: 48), li gor nîzamekê dibarîne (Mumînûn, 23: 18) û dema ku bixwaze qadir e ku avê vekişîne, paş da bigire (Mulk, 67: 30). Zindîkirina rûyê erdê ji aliyê avê ve li vejîna mirovan a piştî mirinê hatiye şibandin (Zûhrûf, 43: 11).

Di Qur'an û hedîsan da ligel avê, bi avê ra têkildar têgihên wekî destnimêj, zemzem, kewser û navên hin çeman ên wekî Nîl, Dicle, Ferat, Seyhûn, Ceyhûn jî cih digirin (Abbasoğulları 2017:5-7).

Av û têgihên têkildarê wê di edebiyatê da jî ji gelek aliyên ve hatine nirxandin, bi awayên curbicur ên şibandîne, mecaz û mezmûnan ve hatiye bikaranîn. Av yek caran wek bexşendeya jîyanê li lêvên hezkiriyê hatiye şibandin, ji bo bejna hezkiriyê raveka “abê rewan” (ava rewan) hatiye bikaranîn, çavên evîndarî kanî, rondikên wî av e ku diherike (Aka, 2013:424-25). “Abê heyat” (ava heyatê) wek mezmûn gelek caran ji bo hezkirî, lêvên hezkirî, wislat, fenafillah, eşq/evîn, mey, ilm, murşîd û ji bo gelek hêmanên din hatiye bikaranîn (Gider, 2013:198). Di edebiyata Erebi da helbestvanê bi navê Zeyd b. Amrî (w. 606), di afirandinê da hebûna avê vegotîye, di edebiyata Tirkî da Kaygusuz Abdalî (w. 1444?) navên avê yê bi zimanên din û têkildarê bi avê vegotinên wekî *ab* (bi Farisî), *ma* (bi Erebi), *rehmet*, *merhemet*, *baran*, *mewc*, *behr*, *ewr* bi kar anîne, di edebiyata Îranê da Omer Heyyamî (w. 1131), temen şibandiye avê ku bi zûka diçe, diqede. Celaledînê Rûmî (w. 1237) av şibandiye *aşiq*, *sakî*, *can*, *dost* û hwd. (bnr. Abbasoğulları, 2017 2017:15-22). Di edebiyata Kurdî da jî *av* û têkildarê bi avê gelek vegotin hatine bikaranîn. Bo mînak Melayê Cizirî (1570-1640), di dîwana xwe da vegotinên têkildarê bi avê yê wekî *çeşmeyê heywan*, *abê kewser*, *co*, *hebab*, *mewc*, *xunav*, *qetreê ab* û hwd. bikaranîne. Di dîwana Perto Begê Hekkarî (1756/57-1818/1834) da jî vegotinên wekî *av*, *ab*, *mewc*, *serab*, *baran*, *behr* û hwd. hatine bikaranîn (bnr. Cizirî, 2012; Hekkarî, 2014).

Av, di edebiyata klasîk da bi gelek wate û şibandînen cuda hatiye bikaranîn. Bo mînak *av*, bi awayên xwe yê wek çem, *ewr*, *behr* ve li feyzê hatiye şibandin. Ji ber ku av navgîniya bexşandina jîyan û zindîtiyê dike li hikmetê hatiye şibandin. *Av* yek caran ji ber taybetmendiya xwe ya paqijkirinê, li pêxemberan hatiye şibandin ku wan rêya hidayetê şanî mirovan daye. Ligel vê *av* rasterast gelek caran wek sembola Pêxemberê Îslamê jî hatiye bikaranîn. Bo mînak tê bawer kirin ku pêşî nûra Wî hatiye afirandin lewma jî amaje bi vê baweriyê, ji bo Wî “ma û tîn” (av û ax) tê gotin. Cardin Pêxember ji ber ku ji bo pêdiviyên wek

çare tê dîtin li zemzemê hatiye şibandin ku her dem avê dibexşîne. Hicreta Wî li herikîna avê hatiye şibandin, xwêya Wî li gulavê, bijangên Wî li çemî hatine şibandin (Abbasoğulları, 2017:37, 40, 65, 69).

2.2.1. Av di Qesîdeya Fûzûlî da

Fûzûlî di qesîdeya xwe da *av* bi awa û wateyên curbicur bi kar aniyê. Bi gotineka din *av* di hemû qesîdeyê da bi heman awayî dernakeve pêşberî me. Hem bi awayên xwe yê rojane ve hem jî bi wateyên mecaz ve *av* hatiye bikaranîn. Hêmana avê di qesîdeyê da bi awayên li jêr dikare bê dîtin:

2.2.1.1. Av wek hêmana avdaniyê/hişînkirinê:

Helbestvanî av wek hêmaneka avdaniyê bi kar aniyê.

5. *Suya virsün bağ-ban gül-zârî zahmet çekmesün*

Bir gül açılmaz yüzün tek virse min gülzâre su

(Bexçevan bila zehmet neke bila gulzarê bide ber avê, hezar gulzarî jî av bide guleka wekî rûyê te venabe.)

Di vê beytê da helbestvan rûyê hezkiriyê xwe dişibîne xweşiktirîn gulê, ku gul di edebîya klasîk da di nav kulîlkan da ew kulîl e ku herî zêde li hezkirî hatiye şibandin û wek sembola Pêxemberî di helbestan da cih girtiye. Gul, wek nûra Mihemedî jî hatiye nixandin û li xwê, laş û bêhna Wî hatiye şibandin (İpek, 2021). Lewma jî helbestvan dibêje bi hezaran gulzar bên avdan jî guleka wekî rûyê xweşik ê hezkirî nabe ku vebe.

2.2.1.2. Av wek hêmaneka saxkirin/başkirin/bi ser xwe da anînê:

Di hin beytan da *av* wek hêmaneka saxkirin, başkirin, şikandina tîbûnê û bi ser xwe da anînê xuya dibe.

Di beyta yekem a qesîdeyê da helbestvan ji bo ku mezinbûna derdê xwe bîne zimanî, ji fonksiyona vemirandina avê sûd wergirtiye. Ev taybetmendiya vemirandinê di heman demê da amaje bi fonksiyona wê ya saxkirin/başkirinê dike. Lewra av, rewşeka nebaş (agir-şewitîn) baş dike. Ligel vê wekî Bellî jî dibêje ligel ku av çiqas binirx û xwedî taybetmendiya başkirinê be jî di xalên têkildarî Pêxemberî da bêkêr dibe (2021:1006), lewma jî ew têra başkirina derdê helbestvanî nake. Tiştê ku birîn û derdê wî baş bike, evîna Pêxemberî ye. Agir di dilê helbestvanî da ewqas mezin e ku av bi kêrî vemirandina wî agirî nayê, nikare dilê helbestvanî baş bike.

1. *Saçma ey göz eşkden gönlümdeki odlare su*

Kim bu denlî dutuşan odlara kılmaz çare su

(Ey çav li agirên dilê min avê neresîne ku ji bo agirên wiha pêketî ra ji avê çare nayê.)

8. Gam günü itme dil-i bîmârdan tîğun dirîğ

Hayrdur virmek karanu gicede bîmare su

(Di roja xemgîniyê da şûrên (nêrînên) xwe ji dilê nexweş texsîr neke, di şeva tarî da bi nexweşan avdayin xêr e.)

Di beyta jorîn (8) da helbestvan avê cardin bi fonksiyona wê ya saxkirin û başkirinê ve bi kar tîne. Lewra nexweş bixwe hewcedarî bi avê hebe jî ji ber ku nexweş e şevê nikare rabe here avê vexwe lewma jî avdayîn bi nexweşekî/ê xêr e û jî bo nexweşî/ê baş e. Helbestvan vê fonksiyona avê jî bo nêrînên hezkiriyê xwe bi kar tîne û her du rewşan dişibîne hevûdin.

2.2.1.3. Av wek hêmaneka xirabker:

Helbestvanî jî taybetmendiya neyînî ya avê jî sûd wergirtiye ku mînakên wê di beytên 3. û 4.ê da em dikarin bibînin.

4. Vehm ile söyler dil-i mecruh peykanun sözün

İhtiyat ilen içer her kimde olsa yare su

(Dilê birîndar bi tirs behsa peykanên te dike, çawa ku her kesê birîndar bi tirsê avê vedixwe.)

Di vê beytê da helbestvan birîndarê evînê ye. Çawa ku av vexwarin jî bo birîndaran ne baş e û divê ew avê hêdî hêdî vexwin wisa jî dema helbestan behsa bijangên hezkiriyê xwe dike, ditirse lewra dilê wî jî birîndar e û di bijangên hezkiriyê wî da jî av heye³ ku dibe ku zererê bide wî.

2.2.1.4. Av wek kesekî/a aşiq/dijmin:

Di hin beytan da av hatiye şexsandin û herikîna wê ya siruştî bi hunera husnê te'lîlê ve bi aşiqbûna wê ve hatiye girêdan ku ber bi hezkiriyê xwe ve diherike.

11. Ravza-i kûyuna her dem durmayup eyler güzâr

Aşık olmuş galiba ol serv-i hoş-reftâre su

(Av her dem bê rawestan diherike bexçeyê warê wî, qey aşiq bûye li wê serwiya xweşmeşê.)

Ligel ku av di siruştî xwe da xwedî taybetmendiya herikîna ye jî lê helbestvanî ev herikîna avê bi aşiqbûna wê ya ji bo bexçeyê warê hezkirî ve girêdaye.

Av yek caran jî ji bo helbestvanî dibe reqîb:

12. Su yolın ol kûydan toprağ olup dutsam gerek

Çün rakîbümdür dahi ol kûya koymam vare su

(Divê ez bibim ax û rêya wî warî bigirim li avê, lewra av reqîbê min e, ez nahêlim ew xwe bigihine wî warî.)

3 Amûrên wek şûr, xencer jî bo ku bibin pola divê av bê bikaranîn (Pala, 2012:1) Lewma di vê beytê da bijangên hezkirî li peykanê (sertîr) hatine şibandin ku tê da av heye.

Av dema ku ji aşiq zêdetir nêzî wislatê be ev rewş aşiqî dîn dike (Pala, 2012:489). Di vê beytê da ji ber ku av diherike ber bi Pêxemberî ve, helbestvan ditirse ku dê av beriya wî xwe bigihîne Pêxemberî lewma jî dixwaze pêşî li avê bigire.

2.2.1.5. Av wek navbeynkar:

Av, di qesîdeya Fûzûlî da yek caran wek navbeynkar jî cih digire.

14. *Sevr ser-keşlûk kîlur kumrî niyâzundan meşer*

Dâmenin duta ayağına düşe yalvare su

(Serwî serkêşiyân dike ji ber libergerîna qumriyî, ji bo ku av dawa wê bigire, xwe bavêje ber dest û piyên wê, li ber bigere.)

Di vê beytê da av, di navbera serwiyê û qumriyî da wek navbeynkar xuya ye. Lê di wateya beytê da xwestina şefaetê jî veşartiyê. Di tesewifê da serwî Xwedê û qumrî jî êbdî simbolîze dike. Av jî Pêxember û rêya Wî ye. Lewma jî di beytê da helbestvan (qumrî) daxwaz dike ku bila av (Pêxember) ji bo wî bibe şefaetkar. Lewra helbestvan ji bo ku daxwazên (niyaz) wî ji aliyê Xwedê ve bèn qebûlîkirin şefaeta Pêxemberî hewce dibîne. Heman daxwaza navbeynkarî di beyta 15.ê da di ser simbolên gul û bilbilê ra tê xwestin.

2.2.1.6. Av wek Misilman/Murîd

Ji bo kesên ku di rêya Pêxemberê Îslamê da ne, misilman tê gotin. Ji aliyê dîn ve ji bo kesên ku di rêya murşîdekî da û girêdayî wî ne jî murîd tê gotin. Ji vî aliyê ve av li kesên misilman û murîdan hatiye şibandin ku di rêya Pêxember/murşîdekî da ye. Lê wek sembolek sedema hîlbijartina avê ji bo misilmanan/murşîdan ew e ku, ligel gelek taybetmendiyên xwe yê din av, di heman demê da paqijiyê simbolîze dike. Lewma di beyta jêrîn da helbestvanî ava ku di rêya Pêxemberî da ye, wek kesekî/a xwedî xisletên paqij daye nîşandan.

16. *Tıynet-i pâkini rûşen kılmış ehl-i âleme*

İktidâ kılmış tarik-i Ahmed-i Muhtâre su

(Avê xisleta xwe ya paqij li ber ehlê alemê raxistiye û ketiya dû rêka Ehmedê Muxtarî)

Kesên misilman û evîndarê Pêxemberî her çiqas zehmet be jî ji rêya Wî ve-nagerin û ji bo ku xwe bigihînin Wî gelek zehmetî û êşan dikişînin ku em van wateyan di beytên 23. û 24.ê da dikarin bibînin. Beyta 23.ê da av hewl dide xwe bigihîne xaka piyên Pêxemberî û di beyta 24.ê da heman av dixwaze xwe bigihîne xaka dergaha Pêxemberî ku dergah di tesewifê da cihê murşîd e û bi vî rengî di van beytan da av murîdekî simbolîze dike. Di beyta 23.ê da ava ku dixwaze xwe bavêje ber piyên Pêxemberî di heman demê da temsîliyeta kesên murîd dike ku serê wan li ber murşîdên wan her tim tewandî ye.

2.2.1.7. Av wek hêmaneka xilasker

Fûzûlî di gelek beytên xwe da yan rasterast an jî bi şibandinan ve *av*, ji bo mucîzeyên Pêxemberî, ji bo Wî bixwe û gotinên Wî ku ji bo mirovan xilasker in û nebaşîyan ji holê radikin, bi kar aniye.

17. *Seyyid-i nev-i beşer deryâ-yı dürr-i ısıtfâ'*

Kim sepüpdür mu'cizâtı âteş-i eşrâre su

(Serwerê cinsê mirovan, deryaya durrê biqîmet, ku mu'cîzeyên Wî av reşandîye li agirê neqencan)

Di beyta jorîn da mucîzeyên Pêxemberî li avê hatine şibandin ku bi saya van mucîzeyan xirabiyên ku ji aliyê kesên nebaş ve dihatin kirin ji holê rabûne. Lewra nûra Pêxemberî hemû tarîtiyên serdema cahiliyê ji holê rakirine (Îpek, 2021).

22. *Eylemiş her katreden mîn bahr-ı rahmet mevc-hîz*

El sunup urgaç vuzû' için gül-i ruhsâre su

(Ji bo ku destnimêjê bigire dema ku destê xwe dirêjî avê kiriye û av li rûyê xwe yê wekî gulê xistiye, ji her dilopê bi hezaran behrên rehetê pêl dane.)

Cardin di vê beytê da tê gotin ku ava ku li rûyê Pêxemberî dikeve dibe rehet û li alemê belav dibe. Ev vegotina mecazî amaje bi rehetbûna Pêxemberî ji bo alemê bixwe dike ku bi saya Xwedê Pêxember wek behreka rehetê ye û dilop jî amaje bi bêdawîbûna vê rehetê dike.

Wekî li jor hatibû gotin çem, ewr, behr ku ji avê pêk tên, wek ravekerên feyzê hatine bikaranîn û ji ber ku av zindîtî û jiyanê dibexşîne li hikmetê hatiye şibandin (Abbasoğulları, 2017:65, 69). Di qesîdeya Fûzûlî da di paralelê vê têgihîştinê da bi gotinên wekî “bahr-ı keramet” (behra keremetan), “bahr-ı bî-payan” (behra bêdawî) û “ebr-i ihsânun” (ewra ihsana te) amaje bi feyza Pêxemberî tê kirin. Ava ku ji van çavkaniyan derdikeve ji bo mirovan û hebûnan dibe sedema ji holê rakirina xirabiyên û qencîtî, başîtî û xilasbûnê dibexşîne.

Heman taybetmendiya avê di beytên 19, 21, 25, 27, 29, 31,32.an da jî dikare bê dîtin.

2.2.1.8. Av wek sembola wislatê

Fûzûlî evîndarê Pêxemberî ye. Lewma jî wekî yekî evîndar mebesta wî ya sereke gihîştin û hevîdîna hezkirî/Pêxemberî ye. Av ji ber ku tîbûnê dişikîne, bi wislatê hatiye şibandin (Pala, 2012:1). Lewma di qesîdeyê da av ji bo vê wislatê/hevîdînê jî hatiye bikaranîn. Beytên ku di wan da av wislatê simbolîze dike ligel wateyên din ên wê xuya dibin. Bo mînak sedema herikîna avê aşiqbûna wê ye (11) lê di heman demê da armanca vê herikîna xwe gihandina hezkirî ye, ango wislat e.

Wateya wislatê ya avê di hin beytên din da jî derdikeve ku yek ji wan beyta dawîn (32) a qesîdeyê ye. Di vê beytê da helbestvan di roja heşrê da hevdişîna ligel Pêxemberî wek kaniya wislatê dibîne û dixwaze ji wê kaniyê avê vexwe.

Çawa ku li jor tê dîtîn Fûzûlî di qesîdeya xwe da hêmana avê bi gelek awayan ve bi kar aniye. *Ligel vê di çerçoveya hêmana avê da di qesîdeyê da fikreke-ka sereke derdikeve pêş. Ev fikra sereke dikare bê gotin ku li dor baweriya “rehmetbûna Pêxemberî ji bo alemê” hatiye çêkirin.* Di ayeteka Qur’anê da tê gotin “Me tu ji bo alemê ancax wek rehmet şandî” (Enbiya, 107). Di vê ayetê da Xwedê rasterast dibêje Pêxember ji bo aleman wek rehmet hatiye şandin. Ji holê rakirina rêyên nerast û xirab, nişandana rêya rast û şadiyê, bidestxistina jiyaneke baş li dinyayê û li axretê û hwd. gelek taybetmendî bi rehmetbûna Pêxemberî ji bo alemê ve tên girêdan. Rehmet di heman demê da tê wateya baranê. Baran jî av e. Wekî li jor hatibû dîtîn di Qur’anê da hatiye gotin ku Xwedê avê, ji bo zindiyên wek nîmet dibexşîne. Di têkiliya “wek rehmet şandina Pêxemberî” û “nîmetbûna avê ji bo zindiyên” da qesîdeya Fûzûlî dikare bê nirxandin. Lewma jî bi kurtasî dikare bê gotin Fûzûlî ev taybetmendiyên Pêxemberî di qesîdeya xwe da bi hêmana avê ve vegotine û qesîdeya xwe li ser vê têgiştinê ava kiriye.

2.2.2. Av di helbesta Feqî da

Di helbesta Feqî da hêmana avê li gor tespîten me bi van taybetmendiyên xwe ve cih digire:

2.2.2.1. Av wek çavkaniya ilma heqîqetê:

Feqî li dû rêya fêmkirina rasteqîniya hebûnê ye. Lewma jî di vî warî da pirsên wî hene. Feqî van pirsan ji avê dike û bersivên xwe jî ji avê dipê. Lewra bi gotina Muhyîddîn Ibn Erebi “av heqîqet e” ku bi vî halê xwe ve hêmana veşêra sirra îlahî ye (Abbasoğulları, 2017:67). Cardin Ibn Erebi amaje bi ayeta “Yên ku înkâr dikin, qey nabînin wexta ku erd û ezman yek bûn, me ew ji hev kirin û me her zindî ji avê afirand? Hêj wê bawer nekin?” (Enbiya, 30) dike û dibêje eslê her tiştê zindî av e û sirra jiyanê di avê da hatiye veşartin” (İlî, 2018:15). Feqî di benda 18.ê da rasterast vê rewşê diyar dike: “Min temenna kirî ji av/Ji me’neya heqîqetê”. Ev heqîqet wekî li jor hat gotin a çar cewheran/hêmanan e. Feqî avê wek çavkaniya bersivên pirsên heqîqetê dizane. Feqî piştî ku sedema herikîna avê ji wê dipirse (1-2) di beyta 3. da ji avê daxwaz dike û dibêje sirra ku di sedema herikîna te da ye ji bo min bêje:

3. *Da ez bizanim vê sirê
Ji hindikî heya pirê
Ji me’neya vê gurgurê
Ji kê ra dikî vê taetê?*

Ligel ku av çavkaniya ilma heqîqetê ye jî lê ew vê ilmê bi hêsanî venabêje: lewra ew vê sirra îlahî vedişêre, wê *sitar* dike (16).

2.2.2.2. Av wek ebd/xizmetkar

Çawa ku li jor hat dîtin, herikîna avê ne bê sedem e. Feqî vê herikînê wek îtaet û xizmetkirinê dibîne:

6. *Ji emrekî ti tê bilez
Sewdaser î şubhetê ez
Ji kê ra dikî çûna bilez
Vê serqutan û xizmetê*

Heman mijarê di benda 7.ê da jî didomîne lê di vê bendê da diyar dibe ku av ji bo kê îtaet û xizmetê dike ku ev di risteya “Baxo nego gavek vewest”ê (7) da diyar dibe ku av di xizmeta Xwedê da ye û îtaetê ji bo Wî dike.

2.2.2.3. Av wek nîşaneyeka îlahî:

Di helbesta Feqî da av, hin nîşaneyên qudreta Xwedê jî di xwe da dihewîne, ku ev taybetmendiya avê di risteya “Şîrîn ji rengê qudretê” a benda 8.da dika-re bê dîtin. Heman nîşan di benda 9.da di risteyên “Dengê te tê yar tete bîr/ Meyla hebîb ji çûna te tê” da jî tê dîtin ku diyar dibe ku Feqî avê û herikîna wê wek nîşaneyeka qudreta Xwedê dibîne. Helbet li vir divê “yar” û “hebîb” di wateya “Xwedê” da bîn fêmkirin.

2.2.2.4. Av wek kesekî/a aşiq

Feqî herikîna avê bi hin sedeman ve girêdide ku yek ji wan aşiqbûna wê ye. Av ji ber ku aşiq e ew nikare li cihê xwe bisekine, her dem bêqerar e û diherike (Pala, 2012:1). Di bendên 1. û 2.ê da ev taybetmendiya avê tê vegotin:

1. *Ey av û av ey av û av
Ma tu bi îşq û muhbet î?
Mewc û pêlan davêy bilav
Bê sekn û bê rahet î*

Di vê bendê bi awayekî zelal Feqî ji avê sedema herikîna wê dipirse û rewşa wê ya bê sekn û rahet diyar dike. Heman taybetmendiya avê di bendên cuda da bi risteyên wekî “Qet gujgûjê nakî betal”, “Qet bi şev û rojan xew netê” (4), “Şevtariyan qet nahewî” (5), “Ji kê ra dikî çûna bilez” (6) ve tê diyarkirin. Feqî aşiqbûna avê di benda 10.ê da bi awayekî zelal tîne zimanî:

10. *Lazim te mehbûbek heyê
Yan meyl û metlûbek heyê
Yan dost û meqsûdek heyê
Lew bê lîbas û kîswetê*

Ligel vê bendê, di benda 11.ê da Feqî herikîna avê wek eşqbaziyê dibîne ku ji bo dilketiyê xwe nîşan dide. Di benda 12. da diyar dibe ku av evîndarê kê ye: “Hemyan ji Baxo ra dikî”. Ango ev hemû kirinên avê ji bo Xwedê (Baxo) ne û ew evîndarê Xwedê ye.

2.2.2.5. *Au wek mirovekî/ê:*

Di hemû helbesta Feqî da av hatiye şexsandin. Lê di hin beşên helbestê da av diaxive û ligel Feqî gotûbêjekê çêdike. Di benda jêrîn da tê dîtin ku piştî pirsên Feqî av diheyire:

25. *Ev reng dibêt ava zelal:
Borî li min ku ev çend sal
Qet kes nekir ev reng sual
Heta giham vê saetê*

Pirsên Feqî pirsên wisa ne ku heta enbiyayên (pêxemberên) ummetê jî heta wê saetê jî avê nekirine (27). Lê Feqî van pirsan wek pirsên kesekî/a zane nabîne lewra li gor wî ev van pirsan dike ji ber ku ew nezan e:

28. *Muksî dibê: “Avê we bû
Pêxemberan aqil hebû
Qet hewceê pirsan nebû
Wan dest gihabû suhbetê*

Gotûbêjên bi vî rengî yên avê û Feqî di helbestê da avê zindîtir didin xuyakirin.

2.2.2.6. *Au wek yek ji çar hêmanan*

Ji ber ku di beşa mijara helbesta Feqî da em li ser naveroka vê xalê rawestiyên bêyî ku em dubare bikin em karin bêjin di helbesta Feqî da av yek ji çar hêmanan e. Li gor helbestê ew çar hêman di genca Xwedê da veşartî bûne (35) û Wî ji ber hezkirina xwe ya ji bo mirovan ew anîne der (36), hemû hebûn jî ji van çar hêmanan çêkirine (37).

2.2.2.7. *Şibandina avê li helbestvanî:*

Feqî di hin bendan da avê dişibîne xwe. Ango Feqî jî wekî avê evîndarê Xwedê ye û çawa ku av bê sekin û bi berdewamî diherike dilê Feqî jî wisa lê dide (2). Ji ber vê Feqî difikire û westiyayî (4) ye û ji ber vê jî nikare xew bike, nikare li cihê xwe raweste (wekî avê) û her digere (13). Ev şibandin di çarçoveya çar hêmanan da jî dikare bê şirovekirin lewra di tesewifê da çar hêman li çar mertebeyên nefsê jî tên şibandin. Li gor vê; nefsa emmare li agirî, nefsa levvame li bayê, nefsa mulhîme li avê û nefsa mutme'îne li axê tê şibandin. Nefsa mulhîme bi taybetmendiyên xwe yên îlham û keşê ve avê bi bîr tîne. Sûffî di vê mertebeyê da comerd, qenaetkar, dilnizm, xwedî sebr, zimanxweş û hikmetwarî ye, mihebeta wî ji bo ilmê heye, heyranê sirrên kaînatê ye û nêzî li Heqî dibe (Abbasoğulla-

rî, 2017:80). Lewma jî dikare bê gotin Feqî di vê helbestê da taybetmendiyên sûfiyên di mertebeya nefsa mulhîmeyê da nîşan dide. Çawa ku hat gotin Feqî di helbesta xwe da li ilma heqîqetê digere. Lewra dikare bê gotin yek ji sedemên vê lêgerînê heyranbûna wî ye ji bo sîrrên kaînatê.

Li gor van bikaranîn û dîmenên *avê*, di helbesta Feqî da hîlbijartina hêmana *avê*, em karin bi du sedeman ve rave bikin:

1- Ev fikr ji berê ve di nav felsefeyê heye ku *av* ligel *agir*, *ba* û *axê* yek ji hêmanên afirandina hebûn û alemê ye ku Feqî jî ev felsefe û nêrîn qebûl kiriye.

2. Wekî li jor hat dîtin di gelek ayetan behsa *avê* hatiye kirin. Bo mînak di ayetên Enbiya-30 û Hûd-7ê da amaje bi têkiliya *avê* û afirandinê tê kirin, lewma dikare bê gotin Qur'an, ji bo Feqî bûye çavkaniyek din di hîlbijartina hêmana *avê* da.

2.3. Hevşibîn û Cudahiyên Naverok û hêmana Avê di Qesîdeya Fûzûlî û di Helbesta Feqî da

Çawa ku li jor diyar dibe *av* di her du helbestan da jî bi gelek awayan ve hatiye bikaranîn. Fûzûlî di qesîdeya xwe da *av*, bi piranî wek temsîla Pêxemberî bi cih kiriye ku ev temsîl di çarçoveya têgihîştina “rehmetbûna Pêxemberî ji bo alemê” da derdikeve holê. Mucîzeyên Pêxemberî ku bi wan ve xirabî ji holê rabûne, hezkirin ji Wî an jî hezkirina Wî ji bo kesekî bûye rêya xilasbûnê di vê dinyayê da û axretê da, şefaetkerbûna Wî, taybetmendiyên kesên di rêya Wî da û hwd. gelek taybetmendiyên Pêxemberî û pêxembertiya Wî li *avê* hatine barkirin û bi vî rengî *avê* wateyên pîralî û pirtebeqeyî wergirtine. Heman taybetmendiya pîralîbûna *avê* di helbesta Feqî da jî tê dîtin. *Av* di helbesta Feqî da rasterast wek yek ji çar hêmanan cih digire. Heqîqet pîralî ye û ji bo fêmkirina heqîqetê divê pirtebeqeyî bê fikirîn. Lewma jî *av* di helbesta Feqî da bi awayên cur bi cur derdikeve pêşberî me. Ew wek veşara sirra îlahî, wek nîşaneyeka Xwedayî, wek keseka aşiqê Xwedê, wek çavkanî û berdevka ilma heqîqetê, wek îtaetker û xizimetkara Xwedê, wek mirovekî û wek helbestvanî bixwe ku aşiqê Xwedê ye di helbestê da cih digire.

Li gor van agahiyan hevşibîn û cudahiyên hêmana *avê* di navbera her du helbestan da em bi vî awayî dikarin diyar bikin:

Hevşibîn: Her du helbest jî di nav edebiyata dînî da cih digirin. Hem di qesîdeya Fûzûlî da hem jî di helbesta Feqî da herikîna *avê* bi hin sedeman ve hatiye girêdan ku ji van sedeman aşiqbûna wê hevpar e. *Av* di her du berheman da jî hatiye şexsandin û di hin cihan da helbestvanan di navbera xwe û *avê* da têkilî û şibandinek çêkiriye. Di her du berheman da jî Qur'an ji bo hîlbijartina hêmana *avê* wek yek ji çavkaniyan xuya dike. Lewra çawa ku hat gotin “rehmetbûna Pêxemberî ji bo alemê” fikreka xurt e di Qesîdeya Fûzûlî da ku ev bawerî têkildar e bi ayetên “Me tu ji bo alemê ancax wek rehmet şandî” (Enbiya,

107) û “Xwedê avê (baranê) ji bo zindiyên wek nîmet dibexşîne” (Bakara, 2:22; Hicr, 15:22; Zumer, 39:21; Vaqia, 56: 68/69; Nehl, 16:10; Fûrqa, 25:48),. Baran av e û di heman demê da wek rehmet tê zanîn û ji bo mirovan navgîna bexşandina nîmetan e. Ji aliyê din ve di helbesta Feqî da rasterast amaje bi ayeta “Dema ku ‘erşê Wî li ser avê bû, Wî asman û erd di şeş rojan da afirand” tê kirin û gelek ayetên din jî di afirandinê da hebûna avê vedibêjin.

Cudahî: Ligel ku her du helbest di nav edebiyata dînî da ne jî cureyên wan jî hevûdin cuda ne. Qesîdeya Fûzûlî ne’ t e û helbesta Feqî felsefî/îrfanî ye. Ji aliyê mijar û naverokê ve her du berhem jî hevûdin cuda ne. Qesîdeya Fûzûlî li ser evîn, wesf û pesindayîna Pêxemberî hatiye çêkirin lê helbesta Feqî li ser heqîqeta hebûnê hatiye çêkirin. Hêmana *avê* bi piranî di her du berheman da bi awa, wate û fonksiyonên cuda ve xuya dike. Av di qesîdeya Fûzûlî da piranî jî bo Cenabê Pêxember, mucîzeyên wî û rehmetbûna Wî ya ji bo alemê hatiye bikaranîn lê di helbesta Feqî da av bi piranî yek jî çar hêmanên afirandinê ye. Cardin di qesîdeya Fûzûlî da av, bi awa û dîmenên, xilasker, xirabker, dijmin, navbeynkar, saxkirin/başkirin, misilman/murîd, wislatê xuya dibe lê di helbesta Feqî da ji van cuda av wek çavkaniya ilma heqîqetê, ebd/xizmetkar, nîşaneyê îlahî, mirovekî xuya dibe ku gotûbêjê dike.

ENCAM

Edebiyata berawirdî amaje bi berawirdkirina berhemên edebî dike ku ev berhem jî aliyên cûrbicûr ve dikarin bîr berawirdkirin. Lewma di xebatên edebiyata berawirdî da armanc ew e ku hevşibîn û cudahiyên berheman, tîkiliyên wan bîr diyar kirin. Me jî di vê çarçoveyê da di vê xebatê da *Qesîdeya Avê* ya Fûzûlî û helbesta *Ey av û avê* ya Feqîyê Teyranî jî aliyê hêmana *avê* ve berawird kirin.

Qesîdeya Fûzûlî bi zimanê Tirkiya Azerî ye û helbesta Feqî bi zimanê Kurdîya Kurmancî ye. Hem Fûzûlî hem jî Feqî helbestvanên serdema edebiyata klasîk in. Lewma jî ligel ku di navbera wan da jî aliyê wekî zimanên berheman (Fûzûlî: Tirkî, Erebî, Farisî; Feqî: Kurdî) û hin cure berhemên wan ve cudahî hene, hin hevpariyên wan ên wekî hin cure berhem û teşe û mijarên ku xistine nava berhemên xwe jî hene. Yek jî hevpariyên wan jî di qesîdeya Fûzûlî û di helbesta Feqî da bikaranîna hêmana *avê* ye ku ev hêman di her duyan da jî cihêkî navendî werdigere. *Ava* ku di edebiyata klasîk da bi gelek awa û wateyan ve hatiye bikaranîn, me xist navenda berawirdkirinê. Ligel jiyana helbestvanan û naveroka her du helbestan em bi taybetî li ser hêmana *avê*, li ser çawaniya bikaranîna wê rawestiyên. Di vê çarçoveyê da hevşibîn û cudahiyên ku di her du berheman da me dîtî, bi vî awayî dikarin bîr ravekirin:

Qesîdeya Fûzûlî *ne’ t* e. Mijar û naveroka wê Cenabê Pêxember, evîna Wî, mezinbûna Wî ye lê helbesta Feqî *felsefî/îrfanî* ye û li ser tîgihîştina heqîqeta

hebûnê hatiye çêkirin. Mijara Fûzûlî li ser hestan hatiye avakirin lê ya Feqî zêdetir felsefîk û hizrî ye.

Di qesîdeya Fûzûlî da ligel ku hêmana *avê* bi awa û wateyên cuda hatiye bikaranîn ji bi pîranî di navbera baweriya “rehmetbûna Pêxemberî ji bo alemê” û “av”ê da têkiliyeka xurt hatiye çêkirin. Ev têkilî di ser ayetên “Me tu ji bo alemê ancax wek rehmet şandî” (Enbiya, 107) û “Xwedê avê (baranê) ji bo zindiyên wek nîmet dibexşîne” (Bakara, 2:22; Hicr, 15:22; Zumer, 39:21; Vaqia, 56:68/69; Nehl, 16:10; Fûrqa, 25:48) ra dikare bê çêkirin. Ji aliyê din ve em karin bêjin di helbesta Feqî da hîlbijartina hêmana *avê* piştî xwe dide du sedeman. Yek ji van, felsefeya çar hêmanan e ku di felsefeya Îslamî da ev fikr ji aliyê hin kesan ve ji bo ravekirina afirandinê hatiye bikaranîn û ya duyem ew e ku di hin ayetên (bo mîmak Enbiya, 30, Hûd, 7) Qur’anê amaje bi têkiliya avê û afirandinê tê kirin. Ji vir ber vê Qur’an, di hîlbijartina hêmana *avê* da wek yek ji çavkaniyên hevpar a her du helbestan xuya dike.

Di qesîdeya Fûzûlî da av bi taybetmendî, wate û fonksiyonên xwe yê wek *saxkirin/başkirin/bi ser xwe da anîn, avdanî/hişînkirin, dijmin/reqîbê helbestvanî, navbeynkar/şefaetkar*, sembola *misilman û murîd*, bi amaje bi rehmetbûna Pêxemberî wek *xilaskar/rizgarker, hevîtin/wislatê* ve cih digire ku di helbesta Feqî da bi *av* bi van rengan cih nagire. Ji aliyê din ve di helbesta Feqî da *av* bi van awa û wateyan ve derdikeve pêş: *çavkaniya ilma heqîqetê, yek ji çar hêmanan, nîşaneyê îlahî*, wek mirovekî/ê ku *gotûbêj ligel helbestvanî* dike, *ebd û xizmetkarê Xwedê*. Di qesîdeya Fûzûlî da *av* bi van taybetmendiyên ve cih nagire.

Wek encam dikare bê gotin *ava* ku wek hêmaneka girîng di edebiyata klasîk da cih girtiye di her du helbestan da hêmana navendî be jî taybetmendiyên wê ji hevşibînan zêdetir cudahiyan nîşan didin.

ÇAVKANÎ

- ABBASOĞULLARI C. (2017). *Divan Edebiyatında Su İmgesi ve Muhtelif Tezahürleri* (Yunus Emre, Fuzuli, Nabi ve Şeyh Galib Örneği). Teza Doktorayê ya Neçapbûyî. Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslam Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı.
- ADAK, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- ADAK, A. (2019). *Teşeyên Nezmê Di edebiyata kurdî ya klasîk de*. İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- ADAK, A. û yê din. (2014), Gora Feqiyê Teyran. *Nubihar Akademi*, Sal 1, Jimar 1, 111-120.
- AKA, B. (2013). “Divan Şiirinde “Âb” Motifinin Methiye Unsuru Olarak Kullanımı: Hayretî'nin “Âb” Redifli Kasidesi”. *Turkish Studies*, volume 8/13, 423-434.
- AKAR, M. (2005). *Su Kasidesi Şerhi*. Ankara: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.

- AYDIN YAĞCIOĞLU, S. (2009). *Fuzûlî ve Bâkî Divanlarının Karşılaştırılması*. Teza Doktora ya Neçapbûyî. İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili Ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı Eski Türk Edebiyatı Bilim Dalı.
- AYDIN, G. (2015). Fuzûlî'nin 'Su Kasidesi' ve Faqiye Teyran'ın 'Ey Av u Av(Ey Su)' Şiirindeki "Su" Motifi Üzerine Bir Değerlendirme. *Çankırı Karatekin Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Türk Dili Ve Edebiyatı Bülteni*, Sayı 2, 49-60.
- AYDIN, K. (2020). *Karşılaştırmalı Edebiyat ve Günümüzde Algılanışı*. Ankara: Kurgan Edebiyat Yayınları.
- BAYRAM, Y. (2004). Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi ve Bir Uygulama. *Selçuk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Türkiyat Araştırmaları Dergisi*, S. 16, Güz, 69-93.
- BELLİ, H. (2021). Fuzûlî Divanı'ndan Hareketle Klasik Türk Şiirinde Su Kültü. *Turkish Studies-Language*, 16(2), 999-1014.
- CANÇELİK, A. (2016). Fuzûlî, Mülhim Şehir Ve Su Kasidesi. *Şehir Düşünce Dergisi*, 2016-9, 21-31.
- ÇALIŞKAN, A. (1999). *Fuzûlî'nin Su Kasidesi ve Şerhi*. Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları.
- ÇİÇEK, H. ü YILMAZ, H. (2017). Gezgin Şair/Düşünür: Feqiye Teyran. *Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Yıl/Year: 2017 Sayı/Number: 37, 173-182.
- DEMİR, M. E. (2014). Berawirdkirina "Ey av ü av" a Feqiye Teyran ü "Su Qesidesi" ya Fuzûlî. *Kovara Nûpeldayê*, h:16, 58-61.
- Feqiye Teyran. (2014). *Divan*. (Çev: Prof. Dr. K. Yıldırım). Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.
- GİDER, M. (2013). Şeyhülislâm Yahyâ Divânı'nda Su. *Türk Dünyası Araştırmaları*, Sayı: 203, 191-210.
- GÜRKAN, S. L. (2009). *Su*. İslam Ansiklopedisi, 37, 440-442.
- ILI, E. (2018). *Feqiye Teyran'ın Varlık Görüşü*. Teza Lîsansa Bilim ve Neçapbûyî. Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Felsefe Anabilim Dalı.
- İPEK, A. Klâsik Türk Şiirinde Sembolik Bir Değer Olarak Gül, (2021, 7, Mijdar), Adresa Gihaniyê: https://www.academia.edu/19348358/Kl%C3%A2sik_T%C3%BCrk_%C5%9Eiirinde_Sembolik_Bir_De%C4%9Fer_Olarak_G%C3%BCl
- KARAK, M. Z. (2021). Bandora Fuzûlî li Ser Pertew Begê Hekkarî: Mînaka Xezela "Her Nebit Ya Reb". *The Journal of Mesopotamian Studies*, 6 (1), 97-127.
- KARATAŞ, İ. E. (2014). Erzurumlu İbrahim Hakkı'nın Marifetname'sinde Anasırı-I Erbaa (Dört Unsurlu) Görüşü. *Muğla Sıtkı Koçman Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Sayı 33, 2014 Güz, 104-122.
- KARLIAĞA, B. H. (1991) *Anâsır-ı Erbaa*. İslam Ansiklopedisi, 3, 149-151.
- KAYA, B. (2017). *Feqiye Teyran'ın Şexê Sen'an Şiirinin İçerik Açısından İncelenmesi*. Teza Lîsansa Bilim ve Neçapbûyî. Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- KRANZ, W. (1994). *Antik Felsefe Metinler ve Açıklamalar*. (Çev: Suad Y. Baydur). İstanbul: Sosyal Yayınlar.

- Kur'an-ı Kerim Tefsiri (2021, 13, Mijdar), Adresa Gihaniyê: <https://kuran.diyanet.gov.tr/Tefsir/>
- Melayê Cizirî. (2012) *Dîwan*. (brhv û vbjr: Tehsîn Îbrahîm Doskî). İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- MENTEŞE, M. (2020). Karşılaştırmalı Edebiyat Örneği Olarak Hayâlî Bey İle Nedîm'in Birer Gazeli Üzerine İnceleme. *Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Yıl: 8, Sayı: 110, Kasım 2020, 287-306.
- PALA, İ. (2012). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, (22. Baskı), İstanbul: Kapı Yay.
- Perto Begê Hekkarî. (2014). *Dîwan*.(Amd: Tehsîn Îbrahîm Doskî). İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- SÖNMEZ, N. Berawirdkirina Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî (2020, 10, Adar), Adresa Gihaniyê: https://www.academia.edu/31186372/nesim_sonmez
- TAŞKESENLİOĞLU, L. Mehmed Fuzuli, (2020, 10 Adar). Adresa Gihaniyê: https://www.researchgate.net/publication/312831026_Mehmed_Fuzuli
- TEMO, S. Fuzûlî'nin Kürtçe Şiirleri, (2021, 7, Mijdar), Adresa Gihaniyê: <https://www.gazeteduvar.com.tr/kitap/2016/12/01/fuzulinin-kurtce-siirleri>

رېبەری دۆسیه‌ی کارگێڕیی زانا و ناودارانى كورد له كتیبخانه‌ی مه‌شېخه‌تى توركيا

The guidebook of administrative dossier of Kurdish scholars in Mashikhat archive in Turkey

*هه‌مین عومه‌ر نه‌حمه‌د / Hemin Omar AHMAD

Makale Türü/Article Types: Bibliyografya Makalesi /Bibliography Article

Makale Geliş Tarihi/Received: 15.10.2021

Kabul Tarihi/Accepted/: 28.11.2021

Atf/Citation: Ahmad. H. O. (2021).

”رېبەری دۆسیه‌ی کارگێڕیی زانا و ناودارانى كورد له كتیبخانه‌ی مه‌شېخه‌تى توركيا“

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi 13, 37-80.

Orcid: 0000-0003-1985-9512

پوخته

به‌دریژایی ئه‌و چه‌ند سه‌ده‌یه‌ی ده‌سه‌لاتی عوسمانیه‌کان به‌سه‌ر به‌شی زۆری خاکی کورداندا، چ له‌ سه‌رده‌می میرابه‌تیی کورده‌کان و چ دوا‌ی نه‌مانیان، زانا و ناودارانى كورد پۆلی گه‌وره‌یان له داموده‌زگا‌کان و سیسته‌می کارگێڕیی ئه‌و ده‌وله‌ته‌دا گێڕاوه، ته‌نانه‌ت به‌شێك له‌ قازی و موفتیه‌کان له‌ ده‌ره‌وی سنووری خاکی کوردستانیش فه‌رمانبه‌ر بوونه و هه‌ندیکیان له‌سه‌ر ئاستی ده‌وله‌تی عوسمانیدا گه‌یشتونه‌ته‌ په‌له‌ی به‌رز و له‌ ته‌واوی جیهانی ئیسلامیشدا ناسراو بوونه. کتیبخانه‌ی مه‌شېخه‌ت له‌ شاری ئه‌سته‌نبول که‌ ده‌یان هه‌زار دۆسیه‌ی قازی و موفتیه‌کانی دووسه‌د سا‌له‌ی کۆتایی فه‌رمانه‌ه‌وایی عوسمانیه‌کانی تیدا پارێزراوه، له‌و نیوانه‌دا دۆسیه‌ی نزیکه‌ی پینج سه‌د کوردی تێدا، که‌ ئه‌م وتاره‌ له‌ شیوه‌ی بیبلیۆگرافیا به‌ پێی زێد و شوینی له‌دا‌یکبونیان، شوینی کارکردن، سا‌لی له‌دا‌یکبوون، ژماره‌ی لاپه‌ره‌ی دۆسیه‌کان و ژماره‌ی ناسینه‌وه‌ی دۆسیه‌که‌ی ریزمان کردوون. ئه‌م رېبهره (رېبهری دۆسیه‌ی کارگێڕیی زانایانی كورد له‌ ئه‌رشیقی مه‌شېخه‌تى توركيا) یارمه‌تیده‌ره‌ بۆ بۆ دۆزینه‌وه‌ی ئه‌رشیقی هه‌موو ئه‌و زانا فه‌رمانبه‌ره‌ کوردانه‌ی که‌ له‌نیوان سا‌لانی ۱۸۰۰-۱۹۳۰ ژیاون.

وشه‌ی کللی: زانایانی كورد، موفتی، فه‌رمانبه‌رانی به‌رزى ده‌وله‌تى عوسمانى، ئه‌رشیقی

مه‌شېخه‌ت

* Dr. Bingöl Üniversitesi, FEF Fakültesi, Doğu Dilleri ve Edebiyatları Bölümü.
heminahmad40@gmail.com

The guidebook of administrative dossier of Kurdish scholars in Mashikhat archive in Turkey

Abstract

Throughout the decades of Ottoman authority on the large swaths of Kurdistan, Kurdish scholars and notables, either during the reign of Kurdish Emirates or after their disappearance, played their major role in the institutions and administrative systems of that state. Some of the cadis and muftis were employees even outside the Kurdistan borders, some others even reached to higher states, and got known worldwide. Mashikhat library in Istanbul keeps tens of thousand of cadis and muftis dossiers of two hundred years ago of Ottoman Empire, among them, about five hundred accounts of Kurdish figures are kept. In this article, they are listed, in the format of bibliography based on their place of birth, place of work, date of birth, page number of dossiers, and recognizing document pages

This guide (the guidebook of administrative dossier of Kurdish scholars in Mashikhat archive in Turkey) serves to find the archive of all Kurdish scholar personnels who lived from 1800-1930.

Keywords: Higher position Personnel in Ottoman Empire, Kurdish Scholars, Mashikhat Archive, Mufti.

دەستپێک

بەدرژایی ئەو چەند سەدەییە دەسەلاتی عوسمانییەکان بەسەر بەشی زۆری خاکی کوردستاندا، چ لە سەردەمی میرابەتیی کوردەکان و چ دواى نەمانیان، زانا و ناودارانى کورد رۆلی گەورەیان لە دامودەزگاگان و سیستەمی کارگێڕیی ئەو دەوڵەتەدا گێڕاوه، تەنانەت بەشێک لە قازیی و موفتییهکان لە دەرەوی سنووری خاکی کوردستانیش فەرمانبەر بوونە و هەندیکیان لەسەر ئاستی دەوڵەتی عوسمانیدا گەیشتونەتە پلەى بەرز و لە تەواوی جیهانی ئیسلامیشدا ناسراو بوونە.

لە نێو فەرمانگەى ئەرشیفی دەوڵەتی عوسمانیدا کە ئیستا ناوەندی سەردەبێی لە شاری ئەستەنبولە و زیاتر لە سەد ملیۆن بەلگەنامەى کارگێڕیی سەردەمی عوسمانی تیدا پارێزراوه، سەبارەت بە زانا و ناودارانى کورد هەزاران بەلگەنامە هەن، بەلام ئەو بەلگەنامانە زۆر بەکەمیی بۆ کەسایەتی و زانایەکان جیاکراونەتەوه و بەگشتیی سەبارەت بە کورد و کوردستان زانیاری کارگێڕیی، سیاسى، کۆمەڵایەتی و ئایینی لەخۆدەگریت. دۆزینەوه و پۆلینکردنی هەموو ئەو بەلگەنامانەى دەرەوی کورد و کوردستانى کارى چەند کەسیک و سالیک و دووان نییه و ئومید هەیه رۆژیک بیت لەسەر دەستی دلسۆزانی کورد وینەى لەبەرگراوى بەشی زۆری ئەو ئەرشیفە بهیڕیتەوه و بیته کەرەستەى توێژینەوهى توێژەرانیان.

بەندە چەند سالیک دەبێ بەدواى ئەوه بووم کە لە رێی ئەرشیفخانەى عوسمانییەوه بەشێک لە ژيانى شاعیر و زانایانى کورد بدۆزەوه، لەو چەند جارەى کە ریم کەوتۆتە ئەستەنبول زۆربەى جار سەردانى کتێبخانەى مەشخەتم کردوووە کە تەنیا دۆسیەى قازیی و موفتییهکانى سەردەمی عوسمانی تیدا پارێزراوه و هەر جارە و بەدواى دۆسیەى کارگێڕیی زانایەک گەراوم. دواجار لەنێو ئەو دەفتەرەى کە لەوی دانراوه و ئەوانەى سەردانى ئەو کتێبخانەیه دەکەن بەهۆى ئەو دەفتەر و توومارەوه لەو کەسایەتییانە دەگەرین کە دەیانەوی توێژینەوهى لەسەر بکەن، بریارم دا تەنیا لەسەر چەند زانایەکی دیاریکراوی کورد کارنەکەم،

به لكو وهك ته واوكه رېي پېرۇڤەى ميژووى زانا يانى كورد له نيو به لگه نامه كاني عوسمانيدا، ئەمەشى رەگەل بەخم و هېواش هېواش كاريان تيدا بكم. پلانه كشم وا دانا له رېي زىدى له داىكبوونيانه وه دەست پى بكم و هه موو ئەو زانا يانهى كه له خاكي كوردستان له داىك بوون (ئەگەر تاك و تەرا لهو شوئانهى نەتەوى تريشى لېن) ئەوانيشيان بەخمە نيو و وهك ئاسانكارىيە كيش بۇ تويزەران له شيوەى نيمچه پېرست و ناسنامه يه كدا نامادەيان بكم تا تويزەران بتوانن به ئاسانترين شيوە لهو كتيبخانه يه دا دەستان به دۆسيەى دلخوازي خويان بگات.

يىگومان هەندىك گرفت هاتنه پيش ئەم كارە، ئەگەر چى ئەم رېبەرى بەردەستان ناسنامهى دۆسيەى نزيكەى ۰۸۴ زاناي كورده، بەلام وپراى ئەوى دەشى ژمارەيه كى كه ميان له نەتەوى كورد نەبن، لەبەر هەلگەوتەى جوگرافىاي بەشيك له ناوهندى شارەكانى وهك كەركوك، ئورفا، ماردىن و سېرت... هەند، بەلام له هەر قەزايەك كه زانيومانە كوردى تيدا نەبوو نەمانخستوتە نيو ئەو رېبەرە، بۇ وئنه قەزاي خاس كوى سەر به شارى (موش)، و تەواوى دانىشتووانەكانى عەرب بوون، ئيمە هېچ زانايەكى خەلكى ئەم قەزايەمان لاي خومان تۆمارنە كروو، له گەل ئەو هەشدا ناوهندى شارىكى وهك مووسل دۆسيەى نزيكەى چل زاناي هەبوو، بەلام چەند دانە يىكمان وهك نمونە داناو و دلنياسين بەشى زورى زاناکانى كورد بوونە، ئەمە بۇ بەغدا و ئەستەنبوليش راست دەيت.

گرفتىكى ديكە ئەويە له نيو هەندى له دۆسيەكاندا ئامازە به نەتەو يان كوردىزانين نەكراو، وپراى ئەمەش بەشيك له زانا يانى كورد كه كۆچيان بۇ شارە گەورەكانى وهك بەغدا و ئەستەنبول كروو، كور و نەوەكانيان لهو شارانە له داىك بوون و بوونەتە زانا و پلەى كارگېرىيى ئايىنيان له دولەتى عوسمانيدا هەبوو، كاتى كورتهى ژياننامەى خويان لهو دۆسيەكاندا نووسيووتەو، ئامازەيان به زىدى باب و باپيرانيان نەكروو و تەنيا شوئنى له داىكبوونى خويان نووسيو، يىگومان له مەشدا زور زاناي كورد هەن ون بوونە و نازانين ئاخو له نيو ئەو هەزاران دۆسيەى زانا ياندا چەنديان كورد بوونە و له ولائى غەربيدا گيرساو نەتەو! هەندى لهو شوئانهى كه ئەو زانا يانە تيدا قازى و موفتىي بوونە، ئەو كات ناحيە بوونە و ئيستا گوندىن، يان ناويان گوراه و ئيستا بەئاسانىي نادۆزىنەو. بۇيه دەشى هەندى شوئنى ترى كوردستان هەبى ئيمە لهم رېبەرەدا ئاگادارى نەبووين و له داهاتودا بدۆزىنەو و بيانخەينه نيو ئەم رېبەرەو.

ئەو شوئانهى كەوتوونەتە سوورىاي ئيستا، يىگومان بەشيكى خاكي كوردستانە و كورد لىي نيشتەجى بوونە، بەلام نەبوونى زانياريمان سەبارت بەو شوئانه له سەردەمى عوسمانيدا واى كروو لهم رېبەرەدا زانيارى ئەوتۆ لەبارەى زانا كوردهكانى كوردستانى سوريا و تەنانت ئەو زانا يانەشى كه له شام و حەلب بوون بەدەست نەخەين.

۱- ناوهرۆكى دۆسيەكان

دۆسيەكان له سالى له داىكبوونى زاناکانەو دەست يېدەكەن، كه كۆنترينيان بۇ سالى ۰۵۸۱ و نويترينيان بۇ سالى ۲۳۹۱ى ميلادى دەگەرېتەو. خوا بزاني چەند دەيه و سەدە پيش ئەو ميژوو هەزاران زاناي ناوونبووى ترى كورد هەبوون و تا ئيستا كەس پييان نازانج و ميژوو تۆمارى نەكروون. به پيى سيستەمى دۆسيەكان بەشى هەرە زۇريان فۆرميكيان تيدا، ناو و نازناو، ميژوو و شوئنى له داىكبوون،

۱ چەند سالىكە خەرىكى ئەم پېرۇڤەىم و ئيستا بەرگى يەكەمى نامادى چابە.

سەربوردەى خويىندىن، خزمەتى فەرمانبەرىيى و بەرھەمى زانستىيى لە لاپەرەيەكدا جىي كىردۈتەو و پىويست بوو و فەرمانبەرەكە شوئىنە والاكانى بە زانباريەكانى خۇي پىر كىردبايەو و لە شوئىنكىش پىويستى بە بەلگە ھەبوويى وەك بەلگەى ئىجرازى زانستىيى، يان فەرمانى چاپكىردنى كىتئې و فەرمانى دامەزىندان و مووچە، دەخىتتە ناوى. لە گەل ئەو ھەشدا چى نووسراوى گواستىنەو، راژە، زىادكىردنى مووچە و ھەموو كىشەكانى تايبەت بە فەرمانبەرى دەو لەت دەخرايە ئىو ئەو ئىزبارە و تۆمارەى فەرمانبەران. بۆيە گىنگىي ئەو دۆسيانە تەنيا ھاوكار نىيە بۆ ساغكىردنەو بە شىك لە ژيانى ئەو زانايانە، بەلكو زۆر جار زانايانى ناوچەكە بە ناو و ئىمزاى خۇيان پىشتىگىرىيى زاناكەيان كىردو و ئەو پىشتىگىرىنامەيەش خراوتە ئىو دۆسيەكە، كە لە رىي ئەو دۆسيەو زانباريى لەبارەى زۆر لەو زانا كوردانەى كە فەرمانبەرى دەو لەت نەبوون ئاشكرا دەيىت، و پىراى زانباريى لەبارەى دەزگا زانستى و ئايىنى و دادوھىيەكانى كوردستان، بە ھەمويان بەشىكى باشى مېژووى كورد و كوردستان رووناك دەكەنەو.

۲-ناساندنى رېئەرەكە

لەم پىرست و رېئەردە بۆ ھەر زانايەك ھەوت زانباريمان نىشانداو، كە برىتتىن لە: ژمارە: تىيىدا ژمارەى دۆسيەكەمان وەك لە ژمارەى دۆسيەى كىتئىخانەى مەشىخەت ھاتوو و بە ھەمان شوئە گواستوو مانەتەو.

ناو: ناوى خودى زانايەكە، ھەندىكىيان ناوى لىكداون وەك مەمەدئەسەد، مەمەدەلى....ھتد ناوى باوك: تەنيا ئامازەدانە بە ناوى باوك، ھەندى جار زانايەكە ئامازەى بە ناوى باپىرى خۇيشى كىردو، ئەگەر نا بەگىتى لە ناوى خۇيان و باوكيان و ھەندى جار نازاويان زىاتر ھىچى دىكەيان نەنووسىو.

شويىنى لەدايكبوون: بەشى زۆرى زانايەكان بۆ لەدايكبوون ناوى ناوھندى شارەكەى خۇيان نووسىو و ھەندىكىشان لەگەلدا ناوى گوندەكەيان نووسىو.

مەئموورىيەت: شوئىنى كاركىردن، ھەندى لە زانايان لە زۆر شوئىندا فەرمانبەر بوونە، بەلام ئەو شوئىنە لىرەدا نووسراو كە پىي ناسراو بوو و يان بەلگەنامەى ئىو دۆسيەكان زىاتر پەيوەندىيى بە فەرمانبەرىيى ئەو شارەو ھەبوو بۆيە ئەويان دانراو.

سالى لەدايكبوون: لە سەردەمىكى دەسەلاتى عوسمانىدا سالى رۆمى بۆ كاروبارى دارايى و سالى كۆچىش بۆ كاروبارى رەسمى دانراو، ھەندى لە زانايان سالى لەدايكبوونى خۇيان بە رۆمى و ھەندىكى تر بە كۆچى نووسىويانە، بۆيە ئىمە نىشانەى (ر) لەپال سالەكە بۆ مېژووى رۆمى و نىشانەى (ك) لەپال سالەكە بۆ مېژووى كۆچىمان دانراو، ئەگەر نىشانەكانى (ر) و (ك) ايش نەبوويى، واتە ديارنەبوو سالى لەدايكبوونەكەى بە حىسابى رۆمىيە يان كۆچى، ھەر وەھا ئەگەر سالەكەشى ديار نەبوويى بە والايى بەجىمان ھىشتوو.

ژ.لاپەرە: واتە ژمارەى لاپەرەى دۆسيەكانە، كە لە چەند لاپەرەيەكى كەمەو بۆ دەيان لاپەرە لەخۇدەگىرت و لەو شوئىنەى كە ھىچ ژمارەيكە دانەنراو، واتە دۆسيەكە لە كىتئىخانە نىشانى توپتەران نادى و يان لە شوئىنى دىكە باس كراو و لىرەدا ناوھەكەى دووبارە كراوتەو.

ئىمە ھەولمان داوھ دەيان پەراوئىز بۇ چەند مژارنىك بنوسىين و بەشىكىشان سەرچاوەمان بۇ بەكارھىناون، لەوانە:

- ۱- كورتەى ژيانى چەند دانەبەكى كەم لەو زانا ناسراوانەى كوردمان لە پەراوئىز نووسىوھ.
 - ۲- ناوى ئەو قەزا و ناحيە و شوئنانەى كە لای خوئنەرى كورد كەم ناسراون، بەتايبەت ئەو شوئنانەى كەوتوونەتە باكوورى كوردستان، بەشى زۆرىمان ناساندووه و بەگوئەرى لاپەنى كارگېرىيى ئىستاي و لاى تورگيا ژمارەى ئەو گوند و ناحيانەمان لە ناساندنەكەدا دەستنيشان كردووه.
 - ۳- ھەندى لەو زاراوانەى وەك نائىب، ئۆدەجى، موسەووويد، موقەبيد....ھتد كە پلەى وەزىفى زاناكانمان بووه، لە پەراوئىز بەگوئەرى توانا روونمان كردوونەتەوھ.
 - ۴- لە ئەگەرى ھەلەبەك لە دەفتەرى تۆمارى كتيبخانەى مەشېخەت چ بۇ ناوى شوئىن، يان ناوى كەسايەتتى، ھەولمان داوھ لە پەراوئىز راستى بكەينەوھ.
- لە گەل ھەموو ئەمانەشدا وەك پۆلىنكردن، ئىمە بەگوئەرى زىدى لەدايكبوونى زاناكە رېزمان كردوون و رەچاوى شارى گەورە و بچوكمان نەكردووه، ناوى زىدەكە چۆن ھاتبەى كردوومانەتە سەرناو و لە بن ئەو سەرناوھدا چەند زانا ھەبوون دامناناون.
- ئەمانە كورتەى ناسنامەى دۆسيەى نزيك پىنج سەد زاناى كوردستان، كە خۇى لە چەند ھەزار لاپەرى بەلگەنامە دەبىنئەتەوھ و دلئايىن ئەمە دەستپىكىك دەيت بۇ دۆزىنەوھى دۆسيەى زياترى زانايمان كە بە زمانى توركى نووسراون و لە ماوھى دادى پشتيوان بە خودا ژيانى ھەموو ئەمانە لە دوو توپى چەند بەرگىكدا بە زمانى شيرىنى كوردى دەخەينە بەر دەستى خوئنەر و توپۆرى كورد.

رېبەرى زانايانى كورد

ھەولنر

ژمارە	ناو	ناوى باوك	شوئنى لەدايكبوون	مەئموورىيەت	سال	ژ.لاپەرە
۰۲_۰۳۰۵	محەمەد ئەسەد ئەفەندى ^۲	شىخ محەمەد سەعيد ئەفەندى	ھەولنر	سەرۆكى ئەنجومەنى مەشاىخ	۱۳۹۱-۹۵۲۱ز	۳

۲ مەبەست ئەسەد ئەفەندى ئەربىلى يە، كە ناوى محەمەد ئەسەد كورپى محەمەد سەعيد ئەفەندى و ئەوھى خەلىفە ھىدايەتوللاى ئەربىلى يە، لە سالى ۱۷۴۸ز زابىنى لە ھەولنر لەدايك بووه. خوئندن لە مەدرەسەكانى ھەولنر دەخوئىن، پاشان لە تەمەنى ۳۲ سالىدا و لە سالى ۹۷۸۱ داى پىنج سال خوئندن و ئىرشاد دەيتە خەلىفە. ھەر لە ھەمان سالدا دەچتە حج. داوى ئەوھى كە دەزانى شىخەكەى (شىخ تەھا ھەرىرى) وەفاتى كردووه، ھەر لە رىنگەدا برىار دەدات پىچتە ئەستەنبول. لەوئ وەك ميان لە تەكەبەى بەشیر ناغا دەمىنئەتەوھ. داوى لى دەكرئ كە لەو تەكەبەدا دەست بە ئىرشاد بكات. دواتر ھەر لەو تەكەبەدا لە سالى ۳۸۸۱ دادەمەزرى. حەمىد پاشاى زاواى سولتان عەبدولحەمىد بانگەپشتى كۆشكى سولتانى دەكات و زۆر قسە و گەفت و لەفتى بە دل دەبى و بەو ھۆبەو وەك ئەندامى ئەنجومەنى مەشاىخان دادەمەزرى. دواتر تەكەبەكەى لە ئەستەنبول بۇ دەكەنەوھ و لەوئ ئىجازەى تەرىقەتى قادرى دەدات و ھەموو رۆژانى دووشەم و پىنجشەم زىكرى قادرى دەكرد، ھەر لەو تەكەبەدا يەكەم كتيبى بە ناوى (كنز العرفان فى آحادىث نبى الرحمن) بلارودەكاتەوھ. داوى چاپكردى ئەم

۸۷	ك ۲۷۲۱-	نائبىي ۳ كەركوك	هەولێر	سېبغە تۆللا ئە فەندى	سېبغە تۆللا ئە فەندى	۰۷۸۸_۰۲
۹۴	ك ۱۸۲۱-	ئەندامى ئەنجومەنى مەعارىف، مەئموورى شەرىعى	هەولێر	حەيدەرزادە عاصم ئە فەندى	ئىبراھىم ئە فەندى ^۴	۱۱۰۷_۰۱

کتىبە شىخ لەلایەن زاناکانى ئەوسای عوسمانى ڕووبەرپووی ڕەخنەيەکی زۆر دەیتتەوه. سالی ۰۰۹۱ و بە هۆی نادياروه، سولتان عەبدولحەمید شىخ محەمەد ئە سەعد بە ڕپارێک بۆ هەولێر دووردهخاتەوه. هەندێک پێشان وابوو دوورخستنهوهکە لەبەر بەرژۆهەندى بوو، کە ئەوسا حاکمىکى تازە بۆ هەولێر دامەزرابوو و شىخان لە گەڵ حاکمەکە بۆ هەولێر نارد تا هاوکارى بکات. لەم ماوهيدا شىخ کتیبى دووهى نووسى بە ناوی (المکتوبات) دواى چەند سالیک مانەوى لە هەولێر و دواى لادراى سولتان عەبدولحەمید لە خەلیفایەتى و ئیعلانی مەشرووتییەت لە سالی ۴۱۹۱ دا شىخ دەگەرێتتەوه نەستەنیول و ددکرێتتە سەرۆکی مەجلیسى مەشایخ. هەر لەو ماوهيدا چەند نووسینىکى لەبارەى تەسەووف نووسین، لەبەر پلە و پایە و زیرەکییەکەى، سولتان ڕەشاد وەک سەرۆکی وەفدى کاروانى حاجییانى دەستنيشان دەکات. سالی ۵۱۹۱ دەستی لە کارى سەرۆکی مەجلیسى مەشایخ کشاندهوه. دواى هاتنه سەر کارى مستەفا کەمال ئەتاتورک و حکومەتى کۆمارى، شىخ لە مالهەکەى خۆى نەچوو بە درهوه و خۆى لە چاوى خەلک بە دوور گرت. ئەگەر چى خانووهکەيشى لەزێر چاودێرى پۆلسیدا بوو. لە ڕۆژى ۳۲ى کانوونى یەكەمى سالی ۰۳۹۱ بە هۆی ڕووداوهکەوه دەستگیریان کرد و حوکمى ئیعدامیان بەسەردا سەپاند، بەلام لەبەر پیرییەکەى حوکمەکیان بۆ زیندانى هەتاهەتایى گۆڕى. بەلام شىخ عەلى ئە فەندى کوربان ئیعدام کرد. لە زیندان شىخ محەمەد ئە سەعد نەخۆش کەوت و دواى گواستنهووبیان بۆ نەخۆشخانه لە شەوی ۴۱/۳۱ى مانگی نادار و لە نیوهى شەودا کۆچى دواى کرد. پۆلس تەرمەکەيشیان نەدايهوه کەس و کارەکەى و لە گۆرستانىکى نادياردا نێژاوه. بۆ زیاتر زانیارییى ڕوانە (TĐV İslam Ansiklopedisi, cilt: 11, sayfa: 348).

۳ نایب واتە قازى، ئەوانەى کە دەولەت وەك قازى دینباردنه قەزا و ناحیه و شوێنە بچوکهکان. بۆیە لەم وتاردا لە هەر شوێنێک وشەى (نایب) هات بە واتای (قازى) یە.

۴ مەبەست شىخوئىسلام ئىبراھىم حەيدەرییە. بە گۆرەى ئىنسکۆلۆپیدیای ئىسلامى تورکى، ناوبراو لە سالی ۴۶۸۱ لە هەولێر لەدايک بوو، کورى عاصم ئە فەندى حەيدەرییە. لە حوجرە خوێندوبەتى و هەروها لای مامۆستای تايبەتیش دەرسى خوێندوهوه. لە سالی ۴۸۸۱ لە دادگا دادەمەزرى دواى ئەوى تاقیکردنەوى پێدەکرى و لە بەرامبەر دەستەى دادگادا بە باشتريين پلە سەرکەوتوو دەبێ. لە ۹ى ئابى سالی ۶۸۸۱ دەیتتە نایبى زاخۆ تا ۱۲ى ئىسنانى سالی ۰۹۸۱ لەو پۆستەى دەمیتتەوه. پاشان لە ۹ى شوباتى سالی ۱۹۸۱ دەیتتە نایبى شارى جەزیرە و لەوێ لە هەمان کاتدا بۆ سى مانگ بۆتە چىگرى قانىمقامى شارەكەش. پێش تەواوکردنى ماوهکەى، جەزیرە جێدەهێلێت و دەچیتتە ماردین. لە ۹۲ى تەموزى سالی ۴۹۸۱ دەیتتە سەرۆکی دادگای بەرابى شارى جەدده، دواى سالیک لە ۳۱ى ديسەمبەرى ۵۹۸۱ دەست لە کارەکەى دەکێشیتتەوه. دواى یازدە ڕۆژ وەك چىگرى داواکارى گشتى دادگای مەركەزى شارى مووسول دادەمەزرى. لەبەر ئەوى دەرەقى ئەو سکالا هەبوون، بۆیە لە ۹۲ى نادارى سالی ۹۹۸۱ لە پۆستەکەى نامیتتە. لە ۱۲ى نادارى سالی ۱۰۹۱ دەیتتە ئەندامى ئەنجومەنى مەعارىف، هەروها لە ۲۲ى نۆفەمبەرى سالی ۱۰۹۱ دا نیشانەى سېیمى مەجیدى پێدەدرت. وێرای ئەمانە لە ۱۲ى ئابى ۴۰۹۱ دەیتتە بەرپۆبەرى مەکتەبى دارولخېلافە. دواى ماوهیکە پلەکەى دەیتتە دووم لە ئەنجومەنى مەعارىف. دواى وەرگرتنى چەند پلە و پایەيەکی تر، لە ۰۱ى تەموزى سالی ۰۱۹۱ دا لە دەقتەرى حاقانى بەشى کاروبارى شەرى دادەمەزرى. لە سالی ۶۱۹۱ دا لە مەرسە الواعظین دا دەرسى مێژوى فیهق و گروپە ئىسلامیەکان دلێتتەوه. ئىبراھىم ئە فەندى لە ۵ى ئابى سالی ۸۱۹۱ لە دار الحکمة الاسلامیە سەر بە خېلافەت وەك ئەندام دادەمەزرى. دواى ماوهیکە لە ۱۱ى نۆفەمبەرى سالی ۸۱۹۱ دا وەك شىخوئىسلام لە حکومەتەکەى تۆ فېق پاشادا دادەمەزرى، دواى ئەوى لە ۳ى نادارى سالی ۹۱۹۱ تۆ فېق پاشا دەست لەکار دەکێشیتتەوه، ئىبراھىم ئە فەندىش وازدەهێنێ. دواى ئەوى حکومەتى فەرىد پاشا دیتتە سەر دەستەلات، ئىبراھىم ئە فەندى دەیتتەوه شىخوئىسلام و ڕۆلێکی گرنگ دەگێرێ تايبەتى لە گفتوگۆکانى لەگەڵ وەفدى کوردی و بەتايبەتتر کۆمەلەى تەعالى کوردی. ئەم کارەى ئىبراھىم ئە فەندى تا دەستلەکارکێشانهوى فەرىد پاشا لە ۰۲ى تەموزى سالی ۹۱۹۱ درێژ دەکێشێ. ناوبراو لە سالی ۳۳۹۱ لە بەغدا کۆچى دواى دەکات و هەر لەوێش دەبێژێ. کۆمەلێک بەرهەمى بە زمانى تورکى چاپ کردوه.

٦٣	٥٦٢١-ك-	نایبې رهواندوز	ههولپڙ	ئیبیراهیم ئه فهندی موده پریس	سهید عهبدولفه تاح ئه فهندی	١١٦٥_٠١
٧٢	٦٧٢١-ك-	موده پریسی ههولپڙ	ههولپڙ	ئه حمهه تاغا	یوسف نه جمی ئه فهندی	١٣١٢_٠٣
٣٣	١٨٢١-ك-	نایبې شاری جزیره	ههولپڙ	حهیدره یزاده عاصم ئه فهندی ^٥	ئیبیراهیم ئه فهندی	٢٠٣٠_٠١
٨	٨٦٢١-ك- ٧٢٣١ رؤمی	نایبې حهما	ههولپڙ	شیخ محمهه سه عبید ئه فهندی	ئه حمهه ئه مین ئه فهندی	٢١٥٧_٠٢
٧٣	٥٩٢١-ك-	موفتی ههولپڙ	ههولپڙ	عهبدولره حمان ئه فهندی	عهبدوللا ئه فهندی	٢٧٥١_٠١
٢١	٣٥٢١-ك-	نایبې ئوفاجیک	ههولپڙ	حاجی هیدایه توللا ئه فهندی	داود فهیمی ئه فهندی	٢٧٩٢_٠١
٦١	٢٦٢١-ك-	نایبې مونتته فیق	ههولپڙ	حاجی مسته فا ئه فهندی	محمهه سه عبید ئه فهندی	٢٩٣٤_٠٢
٦٣	٩٤٢١-ك-	نایبې ئاکری	ههولپڙ	عهبدولقادر ئه فهندی	مهولود ئه فهندی	٢٩٣٦_٠٢
٤١	٨٨٢١-ك-	نایبې عه شائیری سه بعه	ههولپڙ	حاجی مهولود ئه فهندی	عهبدولکه ریم ئه فهندی	٢٩٤٢_٠١
٤	٤٩٢١-ك-	نایبې ناحیه سولتانییه	ههولپڙ	مهلا ره مهزان	مسته فا فهوزی ئه فهندی	٢٩٤٩_٠١
٦	٥٨٢١-ك-	نایبې ناحیه به لهك ^٦	ههولپڙ	مهلا محمهه ئه فهندی	(محمهه) ئیسماعیل عهلی ئه فهندی	٢٩٥٠_٠١
٨	٩٨٢١-ك-	کاتبی دادگای شه رعیبی ههولپڙ	ههولپڙ	عهبدوللا ئه فهندی	فهیزوللا ئه فهندی	٢٩٥٣_٠١

٥ شیخولئیسلام ئیبیراهیم حهیدری دوو دؤسیه جیاوازی هیه، له بهر نهوهی که سایه تیبیه کی گهوره بووه و دوو جار شیخولئیسلام بووه و وپزای نهوهش سردهمیک نایبې شاری جزیرهش بووه.

٦ لهوانهیه بالهک بێ، که نهو کات ممرکه زده کی گوندی گه لاله ی نریک قهزای چۆمان ی سهر به پارێزگای ههولپڙ بووه.

۵	۹۷۲۱-ك-	كاتىبى داد گاي شەرعىي كۆيسىنچەق	هەولپەر	حاجى عەبدوﻻﻻ	ئىبراھىم حەققى ئە فەندى	۲۹۹۹_۰۱
۴	۰۸۲۱-ك-	ئۆدەجى ^۷ داد گاي شەرعىي كۆيسىنچەق	هەولپەر	ئەلباس	خورشىد ئە فەندى	۳۰۰۰_۰۲
۸	۸۰۳۱-ك-	كاتىبى داد گاي شەرعىي گە فەر	هەولپەر	سەعید ئاغا	مەھمەد عەلى ئە فەندى	۳۰۹۷_۰۲
۳۳	۵۸۲۱-ك-	موقتى و مودەرىسى هەولپەر	هەولپەر	كوچوك مەلازادە عوسمان ئە فەندى	مەھمەد ئە فەندى ^۸	۳۱۱۳_۰۲
۸	۱۹۲۱-ك-	مودەرىسى دەرسىپەر ^{۵۷}	هەولپەر	حاجى مەھمەد ئە سەد	مەھمەد عەلى ئە فەندى	۵۳۳۸_۰۱
۴	۰۵۲۱-ك-	موقتى	هەولپەر	ئىسحاق ئە فەندى	عەبدوﻟرەھمان ئە فەندى	۰۲۴۹_۴۵
۲	۹۴۲۱-ك-	نائىب	هەولپەر	عەبدوﻟقادر ئاغا	مەھمەد مەلود ئە فەندى	۰۲۵۰_۲۴
۷۲	۳۴۲۱	نائىبى تەربىل	گومان ھەيە لە بنە پەتدا خەلكى هەولپەر بووبى	عەبدوﻻﻻ ئە فەندى	داغستانىزادە ھەيدەر ئە فەندى	۰۲۵۰_۲۵
۷۲	۵۹۲۱-ك-	نائىبى سىلقان	هەولپەر	مەلا رەمەزان	مستەفا فەيزى ئە فەندى زىيارەتى	۰۲۵۱_۱۹
۶	۷۹۲۱-ر-	نائىبى داقوق	هەولپەر	مەلا سالىح ئە فەندى	مەھمەد ھەمدى ئە فەندى	۰۲۵۱_۲۱

۷ ئۆدەجى: ئەو كەسەي رىنكخەرى ژوورى داد گايە و بەرپەرسى لايەنى كارگىرى و بەرپەردنە كەيەتى.
۸ مەبەست مەلا مەھمەد ئە فەندى باپىرى مەلا گىچكەي ھەولپەرە و باركى شىخ عومەر ئە فەندى تەربىلىيە.

۰۲۵۱_۳۰	مەلا عەبدولللا	محەمەد ئە فەندى	هەولېر	نائىب	۰۴۹۲۱-ك	۴
۰۲۵۱_۳۱	محەمەد موخلىص ئە فەندى	ئە حمەد عېزەت ئە فەندى	هەولېر	نائىب	۰۹۹۲۱-ك	۴
۰۲۵۱_۳۳	محەمەد تەو فىق ئە فەندى	حاجى محەمەد مەولود ئە فەندى	هەولېر	؟	۰۶۹۲۱-ك	۷

سليمانى

۰۱۱۷_۰۳	محەمەد مەعرف ئە فەندى	عەبدولفەتاح ئە فەندى	سليمانى	نائىبى ھىندىيە	۰۵۵۲۱-ك	۸۲
۰۲۸۴_۰۱	ئە حمەد فائىز ئە فەندى ^۹	شېخ مەحمود ئە فەندى	سليمانى	نائىبى قسطنونى	۰۸۵۲۱-ك	۰۲
۰۷۶۶_۰۲	محەمەد رەشىد ئە فەندى	ئە حمەد حەمدى ئە فەندى	سليمانى	قازىبى گولەنەبەر	۰۲۹۲۱-ك	۷۴
۱۰۱۱_۰۳	مستە فا ئە فەندى	مەحمود ئە فەندى	سليمانى	نائىبى گولەنەبەر	۰۸۵۲۱-ك	۸۳
۱۰۵۵_۰۱	عەبدولقادر ئە فەندى	مەعرووف ئاغا	سليمانى	موقەببىدائى دادگاى شەرىعى مونته فىق/ ناسرىيە	۰۱۹۲۱-ك	۶

۹ مەبەست ئەحمەد فائىز بەرزنجىيە، كە لە كتيبەكەى خۇيدا بەناوى ابھى القلائد دا، ژياننامەكەى نووسراوہ كە كورتەكەى بەم شېئىيەيە: سەيد ئەحمەد فائىز كورې سەيد مەحمود كورې حاجى سەيد ئەحمەد كورې سەيد عەبدولسەمەد فضل الدين كورې قوتبى زەمان سەيد حەسەنى گلەزەردەيە، گلەزەردە گوندىكە دەكەويتە رووى قىيلەى شارى سليمانى، كورې سەيد محەمەدى نۇددىي كورې سەيد عەلى كورې بابارەسول كورې سەيد عەبەد كورې سەيد عبد الرسول كورې سەيد قەلەندەر كورې سەيد عبد السىد كورې سەيد عيسا كورې سەيد حسين كورې سەيد بايەزىد كورې سەيد عەبدولكەرىم كورې سەيد عيسايە كە بەرزنجەى بنىاتناوہ. ئەم سەيد عيسايەش كورې باباعەلى ھەمەدانى كورې سەيد يوسف ھەمەدانى كورې سەيد مەنسور كورې سەيد عەبدولعەزىز كورې سەيد عەبدولللا الاصغر كورې سەيد اسماعيل المحدث كورې نىمام موسى كازم كورې نىمام جەعفەرى صادق كورې نىمام محمد الباقر كورې نىمام زين العابدين عەلى كورې حەزرىتى حوسەين كورې نىمام عەلى كورې ئەبوتالب. ئەحمەد فائىز لە سالى ۸۵۲۱مى كۆچى لە گلەزەردە لەدايك بووہ. قورئانى پېرۆز و ھەندى رىسالەى فارسى و تەسرىفى زىجانى لاي باوكى خويئندووه، پاشان عەوامىل و شەرحى زىجانى و شەرحى كافىيە و نىساغۆچى و فەنارى و رىسالەى الوض و نىستىعارەى مەلا ئەبويەكرى ميرپرۆستەمى و رسالە الحنفىيە فى الاداب و بەشيك لە عبد الله اليزدى شرح تەھذيب المنطق التفتازانى لاي محەمەد غالب ئە فەندى خويئندووه. پاشان رسالە على قوشچى لە عىلمى الوض و شرح الشمسىة فى المنطق و تەھذيب الكلام للتفتازانى و علم العروض لاي سەيد مستەفاى ئە فەندى بەرزنجى خويئندووه، ھەروەھا شرح الھىدایة فى الحكمة مع بعض حواشيه لاي ئەحمەد ئە فەندى نۇدشى موفتى سليمانى خويئندووه. دواتر بەشيكى لە كتيبى الغطول لاي ئەحمەد ئە فەندى الپېرچسنى موفتى سليمانى خويئندووه. ھەروەھا نوسولى فيقھ و فەرموودە و بەشيك لە تەفسىرى بەيزاوى لاي كاك ئەحمەدى شېخ كە خالى بووہ خويئندوويەتى. لە روى كارگېرېيەوہ لە ناوہ و دەرەوہى كوردستاندا قازى بووہ و زۆر پلە و پاىەى لە دولەتى عوسمانىدا ھەبووہ، لە كتيبەكەدا ھەمووى باس كراوہ بەلام لەبەر دريژداریيە دوفەت نايب ليرەدا بياننوسين. وپراى ئەمەش ئەحمەد فائىز زياتر لە بيست بەرھەمى لەپاش بەجىماوہ.

۱۰ موقەببىد: تۆماركەر، ئەو كەسە بوو كە گوتن و كاروبارى نيو دادگاى بە شىوازى نوسين تۆماردەكرد.

٤	١٣١-ك-	كاتىبى داد گاي شەرىعى قاجىسى عەممارە	سليمانى	محەمەد ئە فەندى	عوسمان نورى ئە فەندى	١٠٧٣_٠١
٥	٢٩٢١-ك-	موزير ١١ داد گاي شەرىعى قاجىسى عەممارە	سليمانى	عەزىز ئە فەندى	محەمەد عەلى ئە فەندى	١٠_٤٧٠١
٥	٩٨٢١-ك-	بەرپۇبەرى ئەيتامى عەممارە	سليمانى	مەلا ئەحمەد ئە فەندى	محەمەد ئەمىن ئە فەندى	١٠_٦٧٠١
٥١	٢٨٢١-ك-	نائىبى سەلاھىيە	سليمانى	ئەحمەد فائىز ئە فەندى	محەمەد عارف حىكمەت ئە فەندى ١٢	١١٥٩_٠٢
٣	٩٦٢١-ك-	كاتىبى داد گاي شەرىعى دىوانىيە	سليمانى	ئەحمەد ئە فەندى	محەمەد ئاغا	٣٠_٠٢٢١
٣٣	٢٧٢١-ك- ٣٣٣١	قازىبى ئىدىل	سليمانى	ئەحمەد ئە فەندى	حوسەين جىلمى ئە فەندى	١٢٢٤_٠٢
٦١	٩٥٢١-ك-	نائىبى سەقر	سليمانى	مەحمود ئە فەندى	محەمەد ناصح ئە فەندى	١٤٦٤_٠٢
٢١	٠٧٢١-ك-	موقتىبى كەرەك	سليمانى	عەبدولرەحمان ئە فەندى	محەمەد صالح ئە فەندى	٢١٧٢_٠٢
٣١	٩٩٢١-ك-	موقتىبى سليمانى	سليمانى	حاجى محەمەد ئەمىن ئە فەندى	عەبدولعەزىز ئە فەندى	١٠_٨٢٧٢
Kızıl Yol (Fransa - 5 humar), Ayre (Swed - 14 humar), Piya (Swed - 15 humar), Raa Zazaistani - 2 humar), Waxt (Darmstadt -4 humar), Raştiye (Fransa -8 humar), Desmala Sure (Londra -16 humar), Ware (Frankfurt -13 humar), Tija Sodiri (Frankfurt- 6 humar), Vengê Zazaistani (Fransa- 3 humar), Zaza Press (Stockholm -15 humar).⁴¹

✓ **Dengê Komkar:** Pêseroka Kurdki ya u 1979 ra tepiya Franfurk dı 121 humar neşır bena, vist u dı humaranê xu dı ca dayo metinanê Zazaki. Ina pêserok, serra 1987 dı aşma Nisan dı humarêka taybeti vecena u ina humar dı ca dona nuştışê Munzur Çemi. Ino nuşte yo cigêrayiş o u nameyê cı *Halk Türkülerinde Dêrsim* o.

✓ **Armanc:** Ino rocname, serra 1979 dı vercu Tırki u Kurdki neşır beno. Humara 62 ra pê teyna Kurdki neşır beno. Ina rocname dı nuştışi Zazakiyi zi veciyayi. Ina rocname dı 39 nuştışi nuştışyanê Zazaki nuseni. Virameyişo Zazaki tor verin *Mı Şêx Se’id Di*⁴², roportajo tor verin *Roşan Bariçek’in Osman Aytar’la yaptıği röportaj*⁴³ u biyografya tor verin *Sereskerê Cephê Xarpêt-Palî: Yado*⁴⁴ ina rocname dı neşır beni.

✓ **Berbang:** Ina pêseroka serra 1982 dı neşır bena. Ina pêserok Kurdki ya u ca dona Zazaki. Ripeli Zazakiyi ê ina pêserok bı destê Heyder Diljeni redakte beni. Humara 5. dı hikayeya *Denduka Erugi* ê nuştışê Rus Tolstoy’i tadiyahena Zazaki.⁴⁵ Ina hikâyeyê, hikâyeyê sifte ya ki zobina yo zıwan ra tadiyahawa Zazaki.

40 **Diftong:** Ina kelime, Franski ya u yo qewramê filoloji ya. Zey kelimeyanê ‘gueş, duest u kuar’ dı dı vengi vengın(vokal) yo kelime dı tica dı beni.

41 Zılfî Selcan, “Zaza Milli Meselesi”, *Desmala Sure*, Humar: 9, Almanya 1993, r. 25-33.

42 Malmısaniy, “Mı Şêx Se’id Di” Armanc Rojnameya Mehane, humar: 133

Mutlu Can, “Kürtçe Süreli Yayınlarda Kırmancı(Zazaca) Üzerine Bir İzlek(1963-2017)”, *Sözden Yazıya Zazaca*, Peywend Yayınları, İstanbul 2019, r. 271

43 Armanc, humar: 117; Can, e.n.v. r. 271

44 Seyidxan Kurij, Armanc, humar: 147; Can, e.n.v. r. 271

45 A. Diljen, “Denduga Erugi”, *Berbang Kovara Federasyona Komelen Kurdistane Li Swede*, humar: 5/88, r. 50; Can, e.n.v. r. 273

✓ **Hêvi:** Ina pêseroka 1983 ra tepiya Paris dı piser 8 humar veciyêna. Ina pêserok dı ripeli Zazakiyi egleb bı destê Malmisanij, Zılfî, Enver Gökçe u Ali Kılıçî hedre benî. Humara 2. dı nameyê *Dewa Mixeylî de* yo hikâye esta u nuŝtoğê ina hikâye Ali Kılıçî yo. Humara 4. dı Malmisanij, hikayeya Demir Özlü *Mergê Xalit Begê Cibrî* tadano Zazaki. Humara 5. dı Malmisanij nameyê *Mehmed Şerîf Efendiyo Goruzij* dı yo hikâye tadano Zazaki u Umero Adirin nameyê *Bêbextî* dı yo hikâye nuseno.⁴⁶ Ina hikâye Tırki ra tadiyahena Zazaki. Humara 6. dı ‘Eli Eşref Dervişyan ra nameyê *Bey* dı Farski ra yo hikâye tadiyahena Zazaki.⁴⁷ Humara 3. ra heta humara 7. dı xebatanê Zazaki ser yo bibliyografya ca gena.⁴⁸ Ina bibliyografya edebiyatê Zazaki dı xebata çımeyan ser xebata verin a.

✓ **Rojname:** Ino rocname, serra 1991 dı 29 Kanunoverin dı Kurdki u teyna yo humar veciyêna. Ina rocname dı çar metini Zazakiyi neşir benî. Malmisanij ita dı bı mexlasê Roşan Bariçek nameyê *Tiya Adır Vareno* dı yo nuşte nuseno.⁴⁹ Ino nuşte, edebiyatê Zazaki dı kayê tiyatroyi ser nuşteyê verin hesıbiyeno. Rına Malmisanij nameyê *Yapmış u Êtmiş’ rê Bes o!* dı yo nuşte nuseno. Ino nuşte, edebiyatê Zazaki dı nuşteyê kuncî ê verin hesıbiyeno. Nameyê *Kitabê Ma yê Kirdkî* dı yo nuşte esto. Nuŝtoğê ino nuşte belu niyo. Ino nuşte, edebiyatê Zazaki dı daşnasnayıŝê kitabın ser nuşteyo verin o.

✓ **Welatê Me:** Ino rocname serra 1994 dı neşir beno. Hemeyê humaran dı goreyê tesbitanê ma hot nuşteyi Zazaki neşir benî u Cemal Pıranij, ita dı tenkid u tehlilê filman ser nuşteyanê Zazaki ê verinan nuseno.⁵⁰

✓ **Kormışkan:** Pêseroka Zazaki ya sifte ya. Ina pêserok, bêteateyê serranê 1995-1997 dı İsvêç dı bı logoyê *“Zıwan u Kulturê Zazayan”* 5 humari veciyêna. Wayirê ina pêserok *Koyo Berz* o. Ma ina pêserok ra çar humari diyi u oniyayi cıra. Ina pêserok dı hewayê tewiranê modern ra nızdê 50 şiiri, 10 hikâyeyi, fıqrayi, cerıbnayıŝi, meqalayi u yo nuşteyê gêrayiŝi esti. Ina pêserok, girani dana fekê Sewregi u Zazaki xuser yo zıwan qebul kena. Pêserok bi imkani ra qefiliyena.⁵¹

✓ **Tija Sodiri:** Sare ra heta peyni pêseroka Zazaki ya dıyın a. Pêserok bêteateyê serranê 1995-2001 dı Almanya dı bı logoyê *“Perloda Zon u Zagonê Kırmanc-Zazay”* 7 humari veciyêna. Ina pêserok dı zey Said Çiya u Hawar Tornêcengi nameyi ca genî. Tija Sodiri, Zazaki xuser yo zıwan qebul kena. Nuşteyi ina pêseroki zafî zıwan, kultur, edebiyat u politika sera yi u ina pêserok dı

46 Ahmet Say, “Mehmed Şerif Efendiyo Goruzij”, *Hêvî Kovara Çandîya Gıŝtî*, İnstitut Kurde de Paris, humar: 5, r. 112-117.

47 ‘Eli Eşref Dervişyan, “Bey”, *Hêvî Kovara Çandîya Gıŝtî*, İnstitut Kurde de Paris, humar: 6, r. 95-103.

48 Malmisanij, “Bibliyografya Dimilî(Zaza): 1858-1985”, *Hêvî Kovara Çandîya Gıŝtî*, İnstitut Kurde de Paris, (bionên) humari: 3, 4, 5, 6 u 7.

49 Roşan Bariçek, “Tiya Adır Vareno”, *Rojname*, humar: 199, r. 4-5.

50 Anuk, e.n.v., r. 688-771.

51 Söylemez, e.n.v., r.13-14

hewayê tewıranê modern ra şiiir, hikâye, fıqra, cerıbnayış, roportaj u meqalayi esti. Ina pêserok dı grani diyena fekê Dêrsim, Sewreg u Çermugi.⁵²

✓ **Vate:** Sare ra heta peyni pêseroka Zazaki ya hiriyın a. Pêserok, serra 1997 dı bı logoyê “*Kovara Kulturi*” serredaktoriya Malmısaniji dı İsweç dı hiri aşman ra yo veciyêna. Pêserok heta humara 20. İsweç dı neşır biya u humara 21. ra pê İstanbul dı neşır bena. Pêserok hema zi neşır bena u heta eka 67 humari neşır biya. Pêserok dı egleb nuşteyi kultur, folklor u edebiyati neşır beni. Ina pêserok, edebiyatê şar, klasik, modern u xebatanê zıwani ê Zazaki sera edebiyatê Zazaki dı cayo muhim gena. Pêseroka(Kovara) Vate dı zey mobet/suhbet, şiiir, hikâye, portreyi şexısan, tehlilê kitabın u weqayanê tarixi dı nuşteyi moderni nusiyeni. Vate, teyna wareyê pêserok dı xebatan nıkena. Vate, wazena ki qey rastnuştışê Zazaki yo standart bıvırazo u Zazaki lehçeyanê Kurdki ra yo lehçe hesabnena.⁵³

✓ **Zaza Press:** Sare ra heta peyni pêseroka Zazaki ya çarın a. Bênatayê serranê 2000-2005 dı bı logoyê “*Journal Of Zaza Language And Culture*” İsweç dı neşır biya. Wayırê ay Faruk İremet o. Pêserok pıser 15 humari veciyaya u ca dayo fekê Sewreg u Çermugi. Ina pêserok dı tewıranê modern ra şiiir, hikâye, cerıbnayış u nuşteyê tenkidi ca geni. Pêserok zi Zazaki xuser yo zıwan qebul kena.⁵⁴

...

Awrupa dı tıkê pêseroki **grani ser Zazaki yi**. İni pêserokan ra zaf feydi resayo Zazaki. İni pêseroki, zafzıwani yi. İni pêserokan dı biyê Zazaki nuşteyi Almanki, Tırki u Kurdki zi ameyi nuştış. Ê pêseroki ki grani ser Zazaki yi inan ra çend hebi ini yê:

Ayre(1985-1987 / Ebubekir Pamukçu), **Piya**(1988-1992 / Ebubekir Pamukçu), **Raa Zazaistani**(1991 / Ebubekir Pamukçu), **Waxt**(1990-91), **Raştiye**(1991-1995), **Desmala Sure**(1991-94), **Ware**(1992-2003 / Asmeno Bêwayır), **Şewq**(1995), **Vengê Zazaistan**(2000-2001 / Mahmut Çağdaş), **Zerqê Ewroy** (1990-91), **Çime**(2005-2008 / Yaşar Aratemur), **Zazaki**(2008 / Yaşar Aratemur) u **Armanc**(1979-80).⁵⁵

Zey Ayre, Piya, Ware, Vengê Zazaistan zafiya ini pêserokan Zazaki xuser yo zıwan hesabneni⁵⁶ u ini pêseroki ideolojik yo xet dı nuşteyanê xu nuseni. İni pêserokan dı zıwanêko siyasi esto. İnan gore hem dewlet hem zi ê ki dewaya Kurditi keni Zazaki u Zazayan ser yo politikaya asimilasyon u inkâr rameni.

52 Söylemez, e.n.v., r.13-14

53 J. İhsan Espar(08.02.2011), *Vate Çalışma Grubu ve Vate Dergisi Çalışmaları*, Tarixê cıresayışi: 02.04.2020, <http://www.zazaki.net/haber/vate-calisma-grubu-ve-vate-dergisi-calismalari-775.htm>, Tarixê cıonayışi: 02.04.2020.

54 Söylemez, e.n.v., r. 13-14

55 İna pêserok neşırê Federasyonê Dezgehanê Karkeran ê Kurdistan a.

56 Söylemez, e.n.v., r. 13-14

✓ Awrupa dı tîkê pêseroki esti mi pêseroki **gıranî ser Kurdkî yê**. Ini pêseroki nızdiya 20 hebi yi u 1976 ra heta eka zaf tay ca dayo Zazaki. Ini pêseroki ini yê:

Hêvi(1985), **Kızıl Yol**(1983-85), **Ronahi**(1976-78), **Roja Nu**(1979-1990), **Gaziya Welat**(1980), **Kurtuluş Yolu**, **Die Brücke**(1985), **Helin**(1983-84) **Mızgin**, **Behrem**(1988-90), **Kürdistan Press**, **Berbang**, **Wan**, **Çarçira**, **Nıştîman**, **Çira**, **Demokrat**, **Heviya Gel**, **Rewşen**, **Lêkolin** u **Dengê Komkar**(1979-1980).⁵⁷

Ini pêserokan ha şenik ha gıran, ha raşt a raşt ha hınaki ca dayo Zazaki. Ini pêserokan dı eğleb hişêka ideolojik sera nuştayi nusiya; labelê zey edebiyatê Zazaki yo edebiyato ki newe wareyê nuşteki dı ca geno mi pêseroki seba nuşteyanê mocnekan ê Zazakiyan muhim i.

3.2. Ê Pêseroki ki Tırkiya dı Neşır Biyi

Tırkiya dı Zazaki ser serencamê pêserokan raşt a raşt serra 1979 ra pê bî pêseroka **Tirej**⁵⁸ destpêkeno u heta eyro yeno. Zazaki heta serranê 1990'yan kuncanê pêserokan u rocnameyanê tewiran dı zey misafiri ca gena; labelê serranê 1990'yan ra heta eyro bî rolê xuyo esil pêserokan dı ca gena. Ino tarix ra tepiya wareyê edebiyatê modern dı xebat u nuştayi Zazaki zi vîla beni u zey tewiranê 'şîir, roman, hikâye, cigêrayiş u ceribnayışi' zaf mehsuli diyeni. Tırkiya dı raywaniya pêserokanê Zazaki yê xuseran serra 1997 dı Universiteya Ataturki ê Erzurum dı destpêkena. Ina universite dı çend talebeyi Çoligiji hewayê *Fanzin*⁵⁹ dı yo pêserok veceni. Tesbitanê ma gore heta eka sare ra heta peyni des ra zêd pêseroki Zazaki neşır biyi. Ini pêserokan ra çend hebi ma cêr dı dayi şınasnayış:

✓ **Vatı**: Ina pêseroka serranê 1997-98 dı bî logoyê "*Edebiyat o ê bin*" Erzurum dı veciyêna. Ina pêserok, neşırkerdişê Zazaki ser pêseroka sifte ya. Çend talebeyi Çoligiji ê Universiteya Ataturki ina pêserok hewayê *fanzin* dı veceni. Pêseroka Vatı piser hiri humari ya u Zazaki xuser yo zıwan qebul kena. Vatı dı hewayê modern dı nuştayi zey hikâye, şîir u nuştayê kunci ca geni. Pêserok dı pawıtışê, virnikerdışê u eraversiyayışê Zazaki ser xebat yo meqsed o. Vatı gore gereka Zazayi şar u zıwanê xu mehfeze bikeri.

Ez biya têşon şiya ver bır

Mı aw we o mı hemdu şıkr ker

Ez biya véşon non kot mı vir

57 Ina pêserok neşîrê Federasyonê Dezgehanê Karkeran ê Kurdistan a.

58 Tirêj, Kovara Çandi u Pişeyi, Doğan Basımevi, 1.Sayı, İzmir 1979.

59 **Fanzin**: Ina kelime, kılmkerdişê kelimeyanê İngilizki FANatic u magaZINE ra vıraziyaya. Ina xebat imkancanê iqtisadi u usulanê hiyerarşik ra dur vıraziyena. Pê ciya ciya westayan u eğlep pê fotokopi beni zêd. Ruetişê mi xebatan ser yo meqsed nıpwıyeno. Fanzin, mi hetan ra pêserokan ra ciya beni: Çend aşman ra yo veciyeni belu niyi u hewayê amatori dı hedre beni.

Ez şiya mı alawıt teki mir
 Mı mir ker a sér texti wa pé tir
 Mı we pé swal u du u sir
 Mı hemd u şıkır ker
 Ez géréna mı di yo pir
 Bıb extiyar u biya vir
 O wext yo hedisek omı mı vir
 Von vazen paşa Bén wazen mir
 Eg nimir
 Şıma zi Bén pir
 Mı va hezar dor şıkırır.⁶⁰

✓ **Miraz:** Ina pêserok bênateyê serranê 2006-2009 dı bı logoyê “*Edebiyat o Felsefe*” Malatya dı veciyêna. Editorê ay İsmail Söylemez o. Pêserok seba tîkê sebebana teyna 4 humari neşır bena. Pêserok dı tewıranê şıir, hikâye, cerıbnayış, meqala u tenkit dı nuşteyi ca geni. Rına pêserok dı zıwanê Tırki ra u zobına zıwanan ra nuşteyi u şıiri açarniyayi Zazaki. Nuşteyi pêseroki bı fekê Çolig, Dêrsim, Diyarbekir, Adıyaman u Erzingan’i nusiyayi. Miraz, Zazaki xuser yo zıwan qebul kena.⁶¹

✓ **Veng u Vaj:** Ina pêserok hewaye fanzin dı serra 2008 dı bı logoyê “*Piseroka Sanat u Edebiyatê Zazaki*” teyna dı humari veciyêna. Pêserok dı nuşteyi edebiyatê Tırkan ra derheqê İkinçi Yeni yi. İni nuşteyi eğleb Tırki ra açarniyayi Zazaki. İna pêserok Zazaki xuser yo zıwan qebul kena.⁶²

✓ **Şewçıla:** İna pêseroka serra 2011 dı bı logoyê “*kovara edebî û hûnerî*” Diyarbekir dı destpê veciyayişi kena. Muduro mesul Roşan Lezgin o. Pêserok, dı aşman ra yo qerarê veciyayişi dayo; la ino her tim hına dewam nikerdo. İna pêserok heta eka 16 humari veciyaya u Zazaki, lehçeyê Kurdkî qebul kena.⁶³ Şewçıla dı zey tewırê tercume, şıir, hikâye, cigêrayış, roportaj, cerıbnayış u analizi ca geni. Lezgîn, roportajêk dı qey ina pêserok inan vano:

“Nameyê kovare mi nayo pa. Nameyê Şewçıla çekuyanê “çıla” û “şewe” ra ameyo pê. Wexto ke ma Şewçıla vete, mi bawer kerdêne ke şarê ma şewe de mendo, nêvejyayo şefeqê sibayî. Gerçî hema zî şewe de yo. Tarîfî de ihtiyacê merdimî bi çıla esta. Mi waşt Şewçıla bibo çilaya şewa ma. Eke bineyke bo zî, Şewçıla eşkaya tayê roşn bido, eno ma rê sedemê İftixarî yo...”⁶⁴

60 Muhammed Egid Eskarj, “Vir”, *Vatt*, Humar: 1, r. 4

61 Miraz ‘Felsefe u Edebiyat’, İtaki Kitabevi, Malatya 2006.

62 Veng u Vaj ‘Piseroka Sanat u Edebiyatê Zazaki’, Tarîxê cîrêsayişi: 03.04.2020, <https://vengvaj.tr.gg/>

63 Şewçıla ‘Kovara Edebi Huneri’, Berdan Matbaacılık İstanbul.

64 İno roportaj, talebeyê qısımê Zazaki Kader Alabaş serra 2019 dı mail sera kerdo.

✓ **Vir:** Ina pêserok serra 2016 dı destpê xebatanê xu kena u hiri aşman ra yo veciyêna. Ina pêserok gırani dona edebiyat u folklori. Pêserok dı zafi zey vistonikan, şıiran, hikâyeyan, kayan, vateyê verinan u çibenokan nuştayi neşir beni. Editorê ina pêserok Murat Varol o. Pêserok heta eka 10 humari neşir biya. Zazaki xuser yo zıwan hesabnena.⁶⁵ Yo mijuliya taybeti dı Vir xu hına dana şınasnayış:

Vir, mezg u hişa insani temsil kena. Ina hiş dı him mazi esto him zi istiqlal. Heti mazi ra vir, hişa folklori mojnena ra. Çımki ma zani ki estaniki ma, deyiri ma, vateyê vêrinanê ma bı se serran hişa insananê ma dı cuyayi u ameyi eyro. Eyro zi ina hiş, inan mihafaza kena, inan dana zanayış. Ino rid ra mecmuaya Vir, ina hişa rewin temsil kena u mojnena ma. Peşo bin ra zi edebiyat zi verco hişa insanan dı zuhur beno. Edebiyat, hiş u mezgê insanan dı pêşeno, uja ra pê zi, pê qelem xu rê heyat vineno. Edebiyat u hiş ya zi vir, yewbinan ra ciya nêbeni. Qê inan ra mecmuaya Vir, yew het ra tarixê hişa insananê ma temsil kena, peşo bin ra zi ina hiş dı zê yew febrîqa nuştayi newe vêjiyeni. Vir, derheqê edebiyat u folklorê Zazaki dı her nuşte qebul kena, heyetê mecmua u redaksiyon ra pê eg qerarê neşir bivêjiyo o wext zi nuşte neşir beno.⁶⁶

✓ **Ma:** Ina pêserok wayırtiya Mikail Aslan u Devrim Tekinoğlu dı serra 2013 dı bı logoyê *Derdê Marê Derman* veciyêna. Pêserok dı aşman ra yo neşirbena u heta eka 6 humari veciyaya.⁶⁷

✓ **Piltan:** Ina pêserok, 2019 dı wısar dı bı logoyê “*Perloda Zon u Zagoni*” destpê neşiri kena u hewayê fanzin dı hiri aşman ra yo veciyêna u heta eka 7 humar veciyaya. Tede zey Heydar Şahin, Hawar Tornêcengî, Sait Çiya u Mesut Keskini nameyi ca geni. Pêserok dı eğleb kulturê Zazayanê Dêrsimi sera xebat u nuştayi neşir beni.

✓ **Ewro:** Ina pêserok, serra 2016 aşma Teşrinopeyin dı bı logoyê ‘*teorî, huner û edebiyat*’ akademik yo çarçewa dı neşir bena. Wayırê ay Murat Aygün o. Pêserok şeş aşman ra yo veciyêna u heta eka hiri humari neşir biya. Pêserok, her humar bı xebatê dosyayêk veciyaya. Humara yoyin dı mewzuya ‘*ca(mekân)*’, humara diyin dı mewzuya ‘*wext(zeman)*’ u humara hiriyin dı mewzuya ‘*cini*’ ca gureto.

✓ Zazaki, Tırkiya dı **pêserokanê Kurdkiyan** dı vercu hınaki ca gureto. Ê pêserokê ki gırani dani Kurdki u tede nuştayi Zazaki zi ca geni u gureto hiris ra zêdyer i. İnan ra çend hebi ini yi:

65 Vir ‘Edebiyat u Folklor’, Berdan Matbaacılık, İstanbul.

66 Ma ina roportaj serra 2019 dı kerda.

67 Ma ‘Derdê Marê Derman’, Yön Basım Yayın, İstanbul.

Tirej⁶⁸, Rıya Azadi, Nubihar⁶⁹, Zend, Bîrnebûn, War, Weje u Rexne, Kelhaamed⁷⁰, Newroz, Rojname, Jiyana Nu, Roj, Nuroj, Govend, Newroz Ateşi, Hev-dem, Serketin, Azadi, Dengê Azadi, Ronahi, Hêvi, Roja Teze, Deng, Zanko⁷¹, Laser⁷², Vejê u Rexne, Temaşe u Zrîng⁷³...

✓ Serranê 90'an dı Tırkiya dı hetê idare ra qısmêk reheti u şenki vıraziyeni. Serran 2000'an dı tîkê qanuni neweyi vıraziyeni. Vetuş u icra kerdîşê ini qanunan ra pê ina reheti u şenki bena zêd u her ca dı his bena. Bı ina reheti u ini qanunan hetê cematki ra yo nızdbiyayîş beno. Ino proses dı rocnameyi u **pêseroki ki Tırki** neşır beni, tespitanê ma gore inan ra nızdiya 20 ca doni Zazaki. Ini pêserokan ra çend hebi ini yê:

“Ermin⁷⁴, Ateş Hırsız, Tiroj, Pir, Munzur, Işkın, Zazana, Wısar, Ütopya, Kırmanciya Beleki, Bezuvar, Gündem 12, Mukaddime⁷⁵, Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi.”⁷⁶

✓ Tırkiya dı vilabiyayîşê xulxuli u endişeya zıwanê Zazaki dı tesirê dezgeyan u weqıfan zaf o. Dezgeyi mıntıqayanê Zazayan ino çarçewa dı wezifeyi muhimi icra kerdî. Qasê tespitanê ma ê pêserokê ki nameyê dezgeyan ra neşır beni u ca dayo Zazaki ini yi: *Dêrsim, Gımgım, Bindav, Binyad, Sefine, Tawz Der...*

Ê nuşteyi ki ini pêserokan dı ca geni seba çarçewaya ina xebati ma ca nido teferuatê inan. Labelê ma zerr ra eşkeni vac, destpêkerdîş u eraverşiyayîşê edebiyatê modern ê Zazaki dı ini pêserokan ha raşt a raşt ha sergurete yo rol

-
- 68 Pêseroka **Tirej**, serra 1979 dı İzmir dı neşır bena. Pêserok, girani ser Kurdki ya. Hiri aşman ra yo vecêna. Pêserok, piser çar humari veciyêna. Hiri humari ay İzmir dı humara aya peyin ridê derbê 1980 ra pê serra 1981 dı Swed dı veciyêna. Zazaki ser weşa weş vındertîş ser pêseroka sıfte ya.
- 69 Pêseroka **Nubihar** Kurdki neşır bena. Pêseroka kultur, huner u edebiyati ya u zafi yo rêza dini ser şına. Nûbihar, rê rê yo ripel, çar u pañç ripeli ca dona Zazaki. Serra 2012 dı humara aya 118. sare ra heta peyni Zazaki çap biya.
- 70 Pêseroka **Kelhaamed** serra 2009 ra heta eyro neşır bena. Bı logoya “*Kovara İslamî Çandî û Hunerî*” hiri aşman ra yo veciyêna. Heta eka 48 humari neşır biya. Her humara ay dı binateyê 3-6 ripeli nuşteyi Zazaki ca geni.
- 71 **Zanko**, yo pêseroka ilim u teknoloji ya. Girani ser Kurdki ya u nuşteyi Zazaki zi tede ca geni. Pêserok serra 2014 dı destpê neşiri kerdo. Biimkani ra internet ser vila bena.
- 72 **Laser**, yo pêseroka talebeyan a. Talebeyi Uniwêrsiteya Bingoli inê qısmê Zıwan u Edebiyatê Kurdki u Zıwan u Edebiyatê Zazaki ina pêserok véceni. Pêserok dı nime ra nime nuşteyi Kurdki u Zazaki ca geni. Pêserok hewayê Fanzin dı hedre bena.
- 73 **Zrîng**, yo pêseroka karikaturi ya. Hem Kurdki hem zi Zazaki/Kırmancki neşır bena. Pêserok fikrê siyasi u ideoloji sera xebatan kena. Aşma ra dorêk veciyena u heta eka 12 humari veciyaya.
- 74 **Ermin**, yo rocname ya. 26 Keşkulan 1991 dı bı logoyê “*Mehle Qezetesi*” destpê neşiri kena. Rocname dı heme nuşteyi Tırki yi; labêlê manşet u sernuşteyi nuşteyan Zazaki yi.
- 75 Pêseroka Mukaddime, hetê Uniwêrsiteya Artuklu ra neşır bena. Ina pêseroka ki akademik a. Zazaki hewayê akademik dı vercu ina pêserok dı ca gena.
- 76 Ina pêserok bı destê Enstituya Zıwanan Goniyan inê Uniwêrsiteya Bingoli hedre bena. Pêserok şeş aşmi ra yo veciyêna. Her humara ay dı nuşteyi Zazaki ca geni.

gureto. Zey nuştayanê şîir, hikâye, virameyiş, wıyayış, qritik u cıgêrayışı zaf nuştayi baco çarçewaya edebiyatê modern dı biyi kitab. Pêserokanê Zazaki ra zaf pêseroki hetê neşırbiyayış u timatımı ra zori onta u problemi veciyayi inan ver. Yo roportajo taybeti dı Deniz Gündüz, zoriya vetişê yo pêserokan ser inan vano:

Amedekerdişê kovaranê zazakî de zorî û zehmetî zaf ê. Her çî ra ver wendoxê nê kovaran zaf tay ê û naye ra nê kovarî zaf nênetene. Yanî problemo tewr gird mesela aborî ya. Na mesela pêro çîyanê bînan ser o tesîr kena. Mavajîme seba ke problemê aborî esto ma mecbur mendîme ke grafik û mîzanpajê kovare ma bi xo bikerîme. Nê meseleyî ra serkewte ez hem edîtorîya weşanxaneyî hem karê redaksiyonî û hem zî karê grafikî kena. Reyna kovare seba ke zazakî vejîyena ma vilakerdişê kovare de zî zehmetîyan ancenîme. Şîrketê vilakerdişî nêwazenê kovare vila bikerê û tepya no kar zî ma ser o maneno.⁷⁷

Ê zori u problemi ki vetiş u vilakerdişê pêserokan ri esti ini yi:

- Hetê iktisad, vilakerdiş u kargo ra problemi.
- Pêseroki egleb pê yo qadroyo teng hedre u neşır biyi.
- Ino ware dı hetê zıwan u nuştış ra zaf teni çin i.
- Hetê fekan u şıweyanê Zazaki ra ciyayi.
- Hetê zıwanêko standart u alfabe yêka belu ra pinikerdiş.
- Tersa memurti u talebeyi, nizanayışê hak u hukukanê şexsiyan ser Zazaki ra dur mendış,
- Wareyê zıwanê Zazaki dı nibiyayışê dezgeyan u koman.
- Hetê hişa zıwani ra kêmiya tica amiyayışi...⁷⁸

Wareyê Zazaki dı vetişê pêserokan dı teyna ini zori u tengi çini yê. Biyê ini sebeban vetişê peserokêka Zazaki bıxu yo emeg u waştışo pil wazeno.

4. Serra 1990 ra Heta 2000: Eseri Verini

Derba eskerayi ê 1980 ra dıma ê merdumi Zazayi ki şını Awrupa miyanê inan ra tîkê merdımı ya zerr ra ya zi bı destegê dezgeyan pêserok u kitaban veceni, xebatanê edebiyani vırazeni. Ini neşır u xebati edebiyatê modern ê Zazaki ri mocnaki sıfteyi yi. Ino dewır, qey edebiyato modern ê Zazaki ra muhim o. Neşıran zey pêserok u rocnameyan dı ya yo qısım, ya zaf ya zi sare ra heta peyni ca diyayo Zazaki. Ino dewır dı ê ki Zazaki nuseni biyi zêd. Nuştogê diasporayi egleb nuştayanê xuyê Zazakiyan dı hiri sebeban ra loqmatik şıxulnayo:

1- Seni ku Tırkiya dı yo endişe u xof estbi ina endişe uca dı zi xu mihafaza kerdo.

77 Talebeyanê Qısımê Zıwan u Edebiyatê Zazaki ê Üniversiteya Bingoli ra Yunus EMEÇ'i ina roportaj serra 2018 dı Deniz Gunduz dı mail sera kerda.

78 Söylemez, e.n.v. r. 14-15

2- Hişa welatperesti nameyi 'Erebi u Tırki nê, nameyi Zazakiyi şixuliyayi.

3- Heta çend nuştayi bı yo name nusiyeni wa bı çend nameyan binusiyayê ki wa nuštoği zaf biesayi.

Serra 1991 dı Qanunê *Ê neşiri ki biye Tırki zobina zıwanan dı neşir beni derheqê inan dı* humarê ey 2932 yo bedıliyeno. Ino bedıliyayiş ra pê verê çapkerdiş u neşirkerdişi dı yo yasağo muhim weradiyeno. Inay sera roc bı roc xebat u neşiri Zazaki beni zêd. Pêseroki, rocnameyi u kitabi Zazakiyi ki Tırkiya dı neşir biyi zafiya inan bedıliyayişê ino qanun ra dıma zereyê serranê 90'an dı veciyayi u çap biyi. Serranê 1990'yan ra heta eyro hukmati seba daqebulkerdişê xuyi Yoyiya Awrupa geyret keni. Ino rayır dı zaf xebati biyi, yasaği weradiyayi, qanuni neweyi viraziyayi. Çendêk ini serran peyinan dı ino weziyet qısmêk biyo şenik u bedıliyayo; labelê hema zi zıwan u kami ver tîkê problemi esti.

Serri 2000'i hem hetê nicel(humartış) hem hetê nitel(senini) ra qey neşirbiyayişê Zazaki u edebiyatê moderni muhim i. Sareyê 2000'an ra heta eyro çarçewaya bedıliyayişê tîkê qanunan zobina millet u zıwanan sera tada bena sist u onayiş beno hol. Ini serran dı yasağeyo ki hetê qalkerdiş, nuştış, çap u neşirkerdiş ra ho zobina zıwanan sera yo weradiyeno. Ê mızakereyi ki serra 2003 dı seba namzetiya tam ê YA(Yoyiya Awrupa) ri destpêkeni ini mızakereyi ino proses ser yo tesiro pozitif virazenê.

Ini serran dı edebiyato modern ê Zazaki dı zey kitabê şiiri *Xaseko Gano Zerejo*(M. Çermugi-1991), *Gome*(Kemal Astore-1995), *Dêrsim Şeherê Zazakî*(Koyo Berz-1995), *Xeribey ıd Keye dı*(Safiya Pak-1997); kitabê hikâyeyi *Cer Hard Cor Asmen*(Kemal Astore-1994), *Budelaê Girşi*(Heqie Mergarji-1996); kitabê romani *Dêrsim Ra ve Darê Estene Seyit Rıza*(Mehmet Gülmez-1996), *Kilama Pepûgî*(Deniz Gündüz-2000) duyes kitabi şiiri, hiri kitabi hikâyeyi, dı romani, yo kitabê virameyişi, dı biyografiyi, dı roportajı, yo kitabê cıgêrayişi, hiri kitabi fıqrayi piser nızdê 25 kitabi moderni nusiyeni. Ini kitabi, qey edebiyatê Zazaki beni yo ber u zaf nuštoği bı wesilayê ini kitabın verê xu dani Zazaki.

5. Serra 2000 ra Heta 2021: Belubiyayiş u Vılabiyayiş

Sareyê serranê 2000'an dı YA dır mızakereyi qey edebiyatê Zazaki yo nuqtaya agerayişi ya. Fikrê dugela milletperesti dı yo bedıliyayişo esasın beno. O fikro ki wışk o, bêrehm o u biyê xu zobina milletan u zıwanan inkâr keno beno nerm. Verê zıwananê binan zey Zazaki, Kurdki u Lazki beno a, yo hewayê azadi viraziyeno:

Serra 2001 dı madeyanê 26 u 28 ê qanunoesasi ra ibareyê 'zıwano ki pê qanun yasağ biyo' qanunoesasi ra diyeno wera. Serra 2002 dı 9'ê Nisan dı Pa-

keta Pikerdışı aya Dıyın veciyêna. Pawa ina paket, Qanunê Neşiri ra ibareyê ‘zıwanêko yasağ biyo’ diyeno wera. Serra 2000 ‘yê aşma Tebax dı Paketa Pikerdışı aya Hiriyın veciyêna. Pawa ina paket radyo u telvizyonan dı neşrê zobina zıwanan beno serbest...⁷⁹

Tırkiya dı telvizyon serra 1968 dı destpê neşiri kena. Ino tarix ra heta serra 2004 biyê Tırki zıwanê ki Tırkiya dı yeni qısêkerdış telvizyonan dı neşir ri mısade çin o. Hema serra 2004 dı pawa zıwananê binan Zazaki zi telvizyonan dı hewayê program dı ca gena. Ina serr qenala TRT 3 dı hefte dı yo dor nim seat Zazaki program vıraziyena.⁸⁰ Tırkiya serra 1999 aşma Qanunoverin dı YA dı mınasebetanê xu kena zêd u *Gılê Helsinki* dı qebulbiyayişi YA ser statuyê namzeti gena. Seba inay sareyê serranê 2000’an ra nat umişiya standartanê YA paketi hedre biyi. Ino weziyet, tîkê qanunan dı bedıliyayişi ano. Fıkrê welatperestiya ê Tırkan beno sıst u zobina zıwanan u şaran ser yo asani yena meydan.⁸¹ Serra 2002 aşma Tebaxi dı bı Paketê Umişi aya Hiriyın radyo u telvizyonan dı qey neşirê zobina zıwanan mısade veciyeno:

Welatperesti Tırki heyatê xuyo roci dı lehçe u zıwanan ciyayan dı eşkeni neşir bıkeri. Ini neşiri, gereka seniniyi esasan inê Qanunoesasi ê Cumhuriyet u pawa millet u welat yoyiya letenibiyayişê Dewleti ri miğayir nibiyê. Vıraştış u teftişê ini neşiran dı usul u esasi hetê qurula berz vıraziyeno.⁸²

25 Qanunopeyin 2004 dı şertê ki belu biyi ini şertan gore zobina zıwanan ri qey neşiri mısadı veciyeno. Ino neşir zi vercu yo çarçewaya bı sinor dı beno.⁸³ Ino neşir, çendêk yo çarçewaya teng u wextêko belu dı destpê kerdo sıst biyayişê politiqayê yo zıwani ser muhim o.

QBRT/RTÜK, 13 Teşrinopeyin 2009 dı yo disturo newe vecena.⁸⁴ Bı ino bedıliyayişi radyo u telvizyonan dı 24 seat neşir ser verê Zazaki abeno. Biyê TRT telvizyonan taybetan dı neşirê zobina zıwanan destpêkeno. Ini eraverşiyayişan gore yo wexto kılm dı TRT 6 destpê neşiranê Zazaki kena. Ino neşir, teyna telvizyonan nê radyoyan zi geno zereyê xu. Zobina ini imkani neweyi vıraziyeni:

- Zobina zıwanan dı panayişê nameyan beno serbest.
- Seba tedris, musnayış u musayışê Zazaki qursanê taybetiyan ri mısadı veciyeno.
- Hepısxaneyan dı yasağê qıseykerdışê Zazaki weradiyeno.

79 Filiz Aydoğan Boschele & Aysel Ay, “Çokkültürlülük Bağlamında Türkiye’de Çok Kültürcü Medya ve TRT Kürdi”, *İnsan&İnsan*, (3/9), 2016, r. 45.

80 Ayetullah Karabeyeser, “Bir Kitle İletişim Aracı Olarak Televizyonun Zazaca İçin Önemi”, *I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, 13-14 Mayıs 2011, Ankara 2011, r. 386.

81 Salihpaşaoğlu, e.n.v, r. 1033-1048.

82 Resmi Gazete, 9 Nisan 2002, humar: 24721

83 Sadoğlu, “Türkiye’de Yakın Dönem Dil Politikaları”, r. 57-65.

84 Resmi Gazete, 13 Teşrinopeyin 2009, humar: 27405

• Serekiya Gureyanê Diyanet 9'ê Teşrinoverin serra 2009 dı şewa Mewlidi dı dora verin mewlido Kurdki dana wendış.⁸⁵

Tırkiya dı nıfus gore Zazaki, hetê qalkeranê xu zıwano hiriyın o. Labelê qey ino zıwani zaf sebeban sera zey inkarkerdış, menkerdış u politiqayi telukayê vindbiyayişi esto. UNESCO yo dezgeyo beynelmilel a. Ino dezge weziyet u çarçewaya zıwanan ser periyodan gore xebatan keno, tesbitan vırazeno u rapor an hedre keno. Qey komci zıwan teluke esta çina belu keno. UNESCO belukerdışê ini telukeyan dı kriteran cêrinan ser runıştışan vırazena u qereran gena. UNESCO tarixê 21'ê Sibat serra 2009 dı *Rocê Zıwanê Daykê ê Dinya* dı yo rapor neşır kena. Ino rapor dı diqet oncena yo teluke. Ina teluke gore Zazaki ha miyanê ê zıwanan dı ca gena ki ê zıwani hê beni vindi. Raporê UNESCO ra dıma ino telukeyê vindbiyayişi bı yo vengo berz ilan beno. Zaf merdımı qey Zazaki wırzeni pay, leqêni, tigêreni u xebatan kenî. Rıyêerdan dı her zıwan u lehçe erca yo u muhim o. Her yo zıwan yo kami yo u qey daşınasiyê yo şari yo 'elemet o. Seba may hetê qalkerdış, nuştış u vıraştışê yo edebiyati gerek qey her zıwani yo xebat u cehd bıbo.⁸⁶

Serra 2009 ra pê hem raporê UNESCO hem zi ê bediliyayişi tıkê qanuni sera xebati u nuşteyi Zazaki beni zêd. Heta eyro nızdiya 160 kitabi şiiri, hikâyeyi u romani Zazaki nusiyayi. İnan ra 90 ra zêd kitabi 2009 ra pê nusiyayi. Wareyê pêserokan, programanê radyo u telvizyonan, kayanê sehneyan dı zaf xebati vıraziyeni.

Serra 2010 dı biyê Tırki zobina zıwanan u lehçeyan dı tedris u telim destpêkeno. Seba may mekteban berzan dı qısmi zıwan u edebiyatê Zazaki u Kurdki abeni. Ino çarçewa dı vercu Uniwersiteya Artuklu ê Mardin'i dı xebatê telim u tedrisi destpêkena. Ina uniwersite dı Enstituya Zıwananê Goniyan runiyena. İta dı zıwananê Kurdki, 'Erepki, Zazaki u Suryanki sera tedris u telim destpêkeno. Dıma Uniwersiteyanê Bingol, Dicle, Munzur, Alparslan u Yüzüncü Yıl dı ini zıwanan ser telim u tedris destpêkeno. Destpêkerdışê ino telim u tedris ra pê zaf talebeyi hewayo akademik dı qısmanê lisans, lisanso berz u doktora ra icazet geni u ino ware dı zaf xebati akademik vıraziyeni. Bı may, edebiyato modern Zazaki dı zaf xebati vıraziyeni, eseri nusiyeni u kayi tiyatroyi sehne geni. Serra 2014 ra pê mekteban miyanan dı zobina zıwanan dı dersi vicinayişi abeni. Ino çarçewa dı bı disturê Wezaretê Telimo Militi vercu serra 2012 dı dıma serra 2017 u 2018 dı kitabi dera Zazaki nusiyeni. Serranê verinan dı bı henzeran talebeyi dera Zazaki vicinani dıma ini politika zerr ra nê hınaki devam kenî.

85 Tarixê cırêsayişi: 18.04.2021 <https://www.diyarbakirsoz.com/diyarbakir/uc-dilde-mevlit-okundu-23477>,

86 Murat Varol, "UNESCO'nun Dil Raporlarına Göre Zazaca'nın Durumu ve Geleceği", *Turkish Studies - International Periodical for the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Cilt: 10/2, Serr: 2015, r. 997-1006

Qasê ino hewayo pozitif gam nierziyeni u qey Zazaki u zobina zıwanan zıwanê dayika dı telim u tedris qebul nibeno, ê talebeyê ki mekteban berzan ra icazet geni biyê çend tenan istihdam nibeni. Seba inay edebiyato modern ê Zazaki dı xebati yo çarçewaya teng dı maneni. Biyê çend neşîrxane, pêserok u televizyonan ca nidiyeno Zazaki.

Netice dı Cumhuriyeta Tırkan nızdiya heştay serr hişa ‘dewleta mili u yo zıwan’ ser hereket kena, politikayan vırazena, qanunan vecena, seba zıwanan u kamiyanê zobina şaran yasağiyen vırazena; insanan ri eziyet kena u erzena hepis u surgun kena. Tarixê 1963 dı biyê dı nuştayanê Zazaki heta serra 1979 tu xebata Zazaki nibena. Sareyê serranê 2000 ra pê hem prosesê namzetiya YA u hem zi ameyişê iqtidar partiya AK ser tay politikayi ğidari beni sıst, qanuni bedıliyeni. Çendêk ini serran dı politikayi asimilasyonê zıwanê Kurdkî u Zazaki hetêko pozitif ra bedıliyeni u ino proses dı paradigma hetê sıstbiyayış ra bedıliyena rına zi hiş, reftari u zêpiyi ser gomi zıxm nierziyeni. Ino nermi u şenki ra zobina zıwan, edebiyat u kamiyi bara xu geni.

Ini serri qey edebiyatê modern ê Zazaki zaf xebati beni u eseri nusiyeni. Tewiranê modernan hema her tewiri dı eseri yeni nuştış. Goreyê tesbitanê ma zereyê ini vist serran dı zey kitabê şiiri *Pukeleka*(Hasan Yıldız-2005), *Dilopê Zerri*(J. İhsan Espar-2008), *Gulsaê*(Deniz Doğan-2013), *Kekû*(Umer Faruq Ersoz-2013), *Dormaleyê Ma Dı*(Mikail Söylemez-2020); kitabê hikâyeyi *Halîn*(Roşan Lezgîn-2006), *Reuka Doy*(Memê Koêkorta-2001), *Teberîk*(Ali Aydın Çiçek-2010), *Meneuşî*(Bedriye Topaç-2021); kitabê romani *Her Çi Beno Sanike*(Sait Çiya-2001), *Moriber*(Cengiz Aslan-2011), *Pêt ve Pelge Ra*(Hüseyin Çağlayan-2015), *Heyf*(Serwet Akkaş-2017); kitabê tiyatroyi *Ema Lenge*(Hüseyin Çağlayan-2017), *Sur u Çequer*(Yismayil Mirza-2018) 190 ra zêd kitabi moderni çap beni. Ini kitabın ra 73 şiiri, 50 hikâyeyi, 18 romani, 10 kayi, 8 virameyişi, 8 biyografiyi, 7 roportaji, 15 cigêrayişi, 5 ceribnayışi yê. Tor zaf eseri serranê 2012, 2013 u 2014 dı yeni nuştış.

NETİCE

Serranê 1920’an ra heta serranê 1990’yan Tırkiya dı zıwan, baweri u etnisiteyan sera yo yasağ, tada u inkâr estbı. Serranê 1960 ra dıma seba enduşeyanê iqtisadiyan qısımêk Zazayi dewan ra barkeni şını bajaran. Rına seba ino sebeb u zobina sebebın qısımêk Zazayi ya barkeni ya zi rameni şını Awrupa. Ê Zazayê ki 1960 ra u 1980 ra dıma şiiri Awrupa uca dı yeni tikişt u imkananê uca ra istifade kenî u zıwanê xu ri wayır veciyeni. Çunki Awrupa dı qey zıwan, baweri u etnisiteyan yo serbesti, xuseri u reheti esta. Bı ina reheti u ini imkanan Zazaki hını ripelanê pêserok u rocnameyan, programanê radyoyan u şewanê kulturana dı ca gena u şıxuliyena. Serranê 2000 ra dıma Tırkiya dı biyê Tırki qey zobina zıwan

u etnisiteyan qanuni vıraziyeni, gami pozitifi yeni eştiş. Ino semed ra ini serran ra heta eyro wendiş, nuştış, musayış, musnayışê Zazaki u neşırkerdişê eseranê Zazaki roc bı roc beno zêd.

Zıwan u edebiyatê Zazaki dı xebatanê verinan ra zafi xebati ya şexsi yi ya zi doruverê yo pêserok u neşırxane dı xebati qefleyanê qıcan i. Pêseroka Tirej, edebiyatê Zazaki dı edebiyatêko nirjjiyeno u newe runayo. Zey ina pêseroki ê pêseroki bini motış u eşkerakerdişê zıwan u edebiyatê Zazaki ri gomi sifte u erca yi. Eger bı ina pêserok u zobina pêserokan edebiyatê Zazaki dı hişêka verin u klasik bışiyen ra ma eşkeni destpêkê edebiyato modern ê Zazaki sera çik bıvac. Edebiyatê miletanê binan dı tewiri moderni, raşiyayışê edebiyatê klasik dima veciyayi. Mavac, tewirê roman u hikâye dewıranê klasiki ra herındê tewıranê mesnewıyan, hikayeyanê şaran u romansan gureto. Labelê, her millet hetê eraversiyayışê edebiyati ra zêpi niyi. Zey Zazayan tıkê mileti seba problemanê tewıran u biimkaniyan wareyê edebiyati dı dewıri beluyi tecrube nikerdi.

Ina raşti sera, halo hezır dı edebiyato modern ê Zazaki ri dewıranê beluyan ra behskerdiş zor o. Edebiyato modern ê Zazaki dı hetê qefleyan, xısu-san u temayanê zêpiyan behsê dewıran beluyan yo problem o. Encağ goreyê politikayanê siyasiyan, hediseyanê cematkiyan, derba eskeriyan u hişa nuştog-an tarix motış ser çend dewıran ra behs beno.

ÇIMEYİ

- Alanoğlu Murat, “Zazalar”, *TDV İslâm Ansiklopedisi*, TDV Yayınları, Ankara 2019, Cilt: EK-2, r. 688-690.
- Aldatmaz Nadire Güntaş, “Milliyetçilik, Dil ve Bellek Kıskaçında Kırmancca(Zazaca)”, *Yazmsal Varoluştan Akademik Literatüre Kırmancca(Zazaca)*, Weşanxaneyê Vateyi, İstanbul 2020, r. 190-191.
- Alver Köksal, *Edebiyat Sanat ve Toplum*, İstanbul Üniversitesi UZEM Fakültesi, 2016, r. 51-52.
- Anuk Nevzat, “Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü ve Zazalar”, *Yazmsal Varoluştan Akademik Literatüre Kırmancca(Zazaca)*, Weşanxaneyê Vateyi, İstanbul 2020, r. 158-161.
- Aslan Zeynep, “Zazaca ve Zaza Kimliğinin Algılanması ve Yansımaları Üzerine Bir Tartışma Metni”, *Border Crossing*, Volume: 8, London Mayıs 2018, r. 267-296
- Assmann Jan, *Kültürel Bellek*, Ayrıntı, İstanbul 2015.
- Aydın Ertuğrul, “Edebiyatın Siyasetle Kesişen Noktasında Yazar ve Şairlerin Tutumları”, *Muhafazakâr Düşünce Dergisi*, Serr: 4, Humar: 13-14, Yaz-Güz 2007, r. 141-146.
- Bariçiçek Roşan, “Tiya Adır Varenö”, *Rojname*, humar: 199, r. 4-5.
- Boschele Filiz Aydoğan & Ay Aysel, “Çokkültürlülük Bağlamında Türkiye’de Çok Kültür-cü Medya ve TRT Kürdi”, *İnsan&İnsan*, (3/9), 2016, r. 45.
- Bozbuğa Rasim, “Milliyetçilik Teorileri Bağlamında Zaza Kimliği ve Zaza Hareketi”, *Bingöl Üniversitesi Bingöl Araştırmalar Dergisi*, Serr: 2020, Cilt: 6, Humar: 2, r. 43-78.

- Calhoun Craig, *Milliyetçilik*, (Tadayoğ: Bilgen Sütçüoğlu), İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2009, r. 93-94.
- Can Mutlu, “Kürtçe Süreli Yayınlarda Kırmanca(Zazaca) Üzerine Bir İzlek(1963-2017)”, *Sözden Yazıya Zazaca*, Peywend Yayınları, İstanbul 2019.
- Çağla Kubilay, “Türkiye’de Anadillere Yönelik Düzenlemeler ve Kamusal Alan: Anadil ve Resmî Dil Eşitlemesinin Kırılması”, *İletişim: Araştırmalar Dergisi*, 2004, r. 55-86.
- Demir Zafer, “Sosyolojik Açından Edebiyat ve Din”, *Nosyon: Uluslararası Toplum ve Kültür Çalışmaları Dergisi*, Yıl: 2018, cilt: 1, r. 13- 30.
- Deniz Dilşa, *Yol/Rê: Dersim İnanç Sembolizmi Antropolojik Bir Yaklaşım*, İletişim, İstanbul 2012
- Dervişyan ‘Eli Eşref, “Bey”, *Hêvî Kovara Çandîya Gıştî*, İnstitut Kurde de Paris, humar: 6, r. 95-103.
- Dewrimci Demokrat Gençlik, <http://ontwikkel2.mvanlaar.net/en-us/AK?author=Devrimci%20Demokrat%20Gen%C3%A7lik>, Tarixê cı resayış: 05.09.2021
- Diljen A., “Denduga Erugi”, *Berbang Kovara Federasyona Komelen Kurdistane Li Swede*, humar: 5/88, r. 50;
- Durgun Şenol, *Ulus İnşası ve Milliyetçilik*, Binyıl Yayınevi, Ankara 2014.
- Ebubekir Pamukçu, *Dersim Zaza Ayaklanmasının Tarihsel Kökenleri*, Yön, 1992.
- Erkan Rüstem & Aydın Deniz, *Doğu’da Siyasetin Dinamikleri*, Vadi, Ankara 2012.
- Erözden Ozan, *Ulus-Devlet*, Dost Kitabevi, Ankara 1997.
- Eskarj Muhammed Egid, “Vir”, *Vatî*, Humar: 1, r. 4
- Gunduz Deniz, “Tarihsel Fonetik Bakımından Kırmanca ve Kurdca”, *Yazınsal Varoluştan Akademik Literatüre Kırmanca(Zazaca)*, Vate Yayınevi, İstanbul 2020, r. 107. <http://www.zazaki.net/haber/vate-calisma-grubu-ve-vate-dergisi-calismalari-775.htm>, Tarixê cıonayışi: 02.04.2020.
- J. İhsan Espar(08.02.2011), *Vate Çalışma Grubu ve Vate Dergisi Çalışmaları*, Tarixê cıresayışi: 02.04.2020,
- Karabeyeser Ayetullah, “Bir Kitle İletişim Aracı Olarak Televizyonun Zazaca İçin Önemi”, *I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, 13-14 Mayıs 2011, Ankara 2011, r. 386.
- Koçak Cemil, *27 Mayıs Bakanlar Kurulu Tutanakları*, Yapı Kredi, Cilt: I (2 Haziran 1960-6 Ocak 1961), İstanbul 2010, r. 158.
- Ma ‘Derdê Marê Derman’, Yön Basım Yayın, İstanbul.
- Malmisaniy, “Bibliyografya Dimilî(Zaza): 1858-1985”, *Hêvî Kovara Çandîya Gıştî*, İnstitut Kurde de Paris, (bionên) humari: 3, 4, 5, 6 u 7.
- Malmîsaniy, “Mi Şêx Se’îd Dî” *Armanç Rojnameya Mehane*, humar: 133
- Miraz ‘Felsefe u Edebiyat’, İtaki Kitabevi, Malatya 2006.
- Resmî Gazete, 13 Teşrinopeyin 2009, humar: 27405
- Resmî Gazete, 9 Nisan 2002, humar: 24721
- Roja Newê: Kürtçe-Türkçe Gazete, Serr: 1, Humar: 1, 15 Mayıs 1963.
- Roja Welat, *Rojnameya Siyasi û Çandi ya 15 Roji*, Ankara.
- Sadoğlu Hüseyin, “Türkiye’de Yakın Dönem Dil Politikaları”, *Pesa Uluslararası Araştırmalar Dergisi*, Serr: 2017, Cilt: 3, Humar: 1, r. 57-65.
- Sadoğlu Hüseyin, *Türkiye’de Ulusçuluk ve Dil Politikaları*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2010.

- Safi İhsan, “Edebiyatçı Siyasetçi İlişkisi”, *Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 4/3, Spring 2009, r. 1863-1878.
- Salihpaşaoğlu Yaşar, “Türkiye’nin Dil Politikaları ve TRT 6”, *Gazi Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi*, Ankara 2007, cilt: 11, humar: 1-2, r. 1033-1048.
- Say Ahmet, “Mehmed Şerif Efendiyo Goruzij”, *Hêvî Kovara Çandîya Gıştî*, İnstitut Kurde de Paris, humar: 5, r. 112-117.
- Selcan Zilfi, “Zaza Milli Meselesi”, *Desmala Sure*, Humar: 9, Almanya 1993, r. 25-33.
- Söylemez İsmail, “Geçmişten Günümüze Zazaca Dergiler: Kronoloji, Sorunlar ve Çözümler”, *I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları 2011, r. 13-14.
- Şendeniz Özlem, “Erken Cumhuriyet Dönemi Dil Politikaları: Güneş Türk Dil Teorisi’nin Türk Basınında Yansımaları”, *CTAD*, serr: 10, humar: 20, 2014, r. 307-326.
- Şewçıla ‘Kovara Edebi Huneri’, Berdan Matbaacılık İstanbul.
- Tarixê cırêsayîşi: 18.04.2021 <https://www.diyarbakirsoz.com/diyarbakir/uc-dilde-mevlit-okundu-23477>,
- Tezerdi Erkut (11.05.2017), *Dergiler Edebiyatın Laboratuvarıdır*, Tarixê cırêsayîşi: 07.04.2020, <https://www2.karar.com/hayat-haberleri/dergiler-edebiyatin-laboratuvaridir-476995>.
- Tirêj, Kovara Çandi u Pişeyi, Doğan Basımevi, 1.Sayı, İzmir 1979.
- Tunçel Harun, “Türkiye’de İsmi Değiştirilen Köyler”, *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Elazığ 2000, cilt: 10, humar: 2, r. 23-34
- Tüzer İbrahim & Hüküm Muhammed, *Edebiyat Sosyolojisi*, Akçağ, Ankara 2019.
- Varol Murat, “UNESCO’nun Dil Raporlarına Göre Zazaca’nın Durumu ve Geleceği”, *Turkish Studies - International Periodical for the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Cilt: 10/2, Serr: 2015, r. 997-1006
- Veng u Vaj ‘Piseroka Sanat u Edebiyatê Zazaki’, Tarixê cırêsayîşi: 03.04.2020, <https://vengvaj.tr.gg/>
- Vir ‘Edebiyat u Folklor’, Berdan Matbaacılık, İstanbul.
- Yıldız Pınar, “Kırmanca(Zazaca) Hikâyeciliği”, *Yazınsal Varoluştan Akademik Literatüre Kırmanca (Zazaca)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2020, r. 210-212.
- Zürcher Erik Jan, *Modernleşen Türkiye’nin Tarihi*, İletişim, İstanbul 2007.

DİLİNİ KESMEK: ORTAK ATASÖZLERİN HİKÂYELERİ: FÂRSÎ-KURMANCÎ - ZAZAKÎ-9

Stories Of Common Proverbs: Persian-Kurmanji - Zazakî-9

Hasan ÇİFTÇİ*

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article

Makale Geliş Tarihi/Received: 19.10.2021

Kabul Tarihi/Accepted/: 16.11.2021

Atıf: Çiftçi. H. (2021). "Dilini Kesmek:
Ortak Atasözlerin Hikâyeleri: Fârsî-Kurmancî-Zazakî 9",
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 13, 111-134.

Orcid: 0000-0002-2503-4966

ÖZET

Bu makale karşılaştırmalı halk edebiyatıyla ilgilidir. Ortadoğu halklarının dillerinden Farsça, Kurmancî ve Zazakî'de ortak atasözlerinin hikâyelerini ve kaynaklarını konu edinmektedir. Yer yer atasözleriyle ortak olan Arapça ve Türkçe atasözlerine de yer verilecektir.

Atasözleri halkların tarihi süreçte şekillenen yaşam biçimini, adet ve geleneklerini ifade eden yasalar hükmündedir. Atasözleri yüzyılların geçmesiyle şekillenir ve toplum ahlâkî, dinî ve dünyevî değerlerini ifade ederler. Toplumun tarihsel kültürünü kuşaktan kuşağa aktarırlar.

Bu makale ve aynı konuyla ilgili seri halde yayımlanacak diğer makaleler gibi adı geçen Müslüman halkların düşünsel, dilsel ve kültürel ortak değerlerine de ışık tutacaktır.

Anahtar kelimeler: Atasözlerinin hikâyeleri, ortak atasözleri, Farsça, Kurmancî, Zazakî atasözleri.

* Prof. Dr. Bingöl Üniversitesi, FEF, hciftci@bingol.edu.tr

Stories Of Common Proverbs: Persian-Kurmanji - Zazakî-9

ABSTRACT

This article is about comparative folk literature. It deals with the story of the common resources of the languages of the ancient peoples of the Middle East such as Persian, Kurmanji and Zazakî. It will partly touch on the common Arabic and Turkish proverbs. Proverbs are the rules that express lifestyles, customs and traditions of the peoples which are formed along the centuries. Proverbs are shaped by the passing of centuries and they express moral, religious and worldly values of the society. They transfer the historical culture of the society from generation to generation.

This article and other articles which are going to be published on the same subject in series will enlighten intellectual, linguistic and cultural common values of the Muslim peoples.

Keywords: the story of proverbs, common sayings, Persian, Kurmanji, Zazakî, Turkish

Giriş

Bu makale, seri halde yayımlanmakta olan Kurmancî, Zazakî ve Farsî ortak atasözleriyle ilgili makalelerin dokuzuncusudur. Diğerleri daha önce Bingöl Üniversitesi *Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*'nin muhtelif sayılarında yayımlanmış ve konu, düşünce (anlam) ve biçim açısından ayrıntılı şekilde analiz edilmişti. Daha önce yayımlanan bir makalede *dilin veya acı ve kırıcı sözün muhatabında açtığı yara ve oluşturduğu tahribatla* ve birinde de *sivri dilin veya acı sözün* ve yeri ve zamanı olmadığı halde dilden veya ağızdan çıkan lüzümsüz söylemin ilgili İslâm milletleri kültüründe ortak olan bazı atasözleri ve ilgili hikâyelere yer verilmişti. Aslında bir önceki makalenin tekmiyesi olan bu makalede de *dilini kesmek*, *arsızlık* ve *hayâsızlıkla* ilgili bazı ortak deyimler ve atasözleri üzerinde durulacaktır. Dolayısıyla konuyla ilgili *meselin temsili* niteliğinde olan ilgili hikâyeler de verilecektir.

1. Türkçe'de *dilini kesmek* ve muadili Farsça'da *zebân burrîden*, Zazakî'de *ziwan bîrnayîş/antîş*, Kurmancî'de *ziman birin/kışandin* şeklindeki ortak deyimlerin sözlüklerdeki mecazi anlamı birini ikna ederek veya tehdit, şantaj, baskı yahut rüşvetle susturmak suretiyle bir şeyi ifşa etmekten alıkoymak veya birinin sözünü kesmek demektir. Bu deyim görünürde azami ölçüde bu mecazi anlamda kullanılmakla birlikte tarihte sivri dilleri sebebiyle hakikaten *dilleri kesilen* hicivci şairleri veya bürokrat ve siyaset adamlarını, hatta sıradan insanları da görmek mümkündür. Günümüzde bile dilleri kesilen kişilerle ilgili haberleri medyada görmek imkân dâhilindedir.

Geçmiş tarihlerde bazı devletlerde ve krallıklarda suçluya veya mahkûma veri-

len cezalardan biri de herhangi bir organını ve bazen de *yalancı şahidin dilini kesmekti*. Nitekim “İlkel dönemde kırbaç cezası yaygındır ve değnek, kayış, kamçı, Huş ağacından yapılmış sopa, çengelli Rus kamçısı, saç fırçası gibi araçlarla yerine getirilmiştir. Bu dönemde sakatlama da önemli bir ceza yöntemidir. *Sahtecilerin ve hırsızların ellerinin, yalancı tanıkların dillerinin, cinsel suç işleyenlerin üreme organlarının kesilmesi ve casusların gözlerinin oyulması yaygındır*. Burun, üst dudak, kulak kesme ve kafa derisinin yüzülmesi de sıklıkla görülmektedir. Vücudun geri kalan kısmının suçlunun suçunun ve günahının belirtisi olması, organ kesme cezasının temel nedenidir. Sözelimi, 1584’te Felemenk Cumhuriyeti’nde Orange’lı William’ı öldüren suçlunun ilkin sağ eli kızgın demirle yakılmış, eti kemiklerinden kerpetenle kopartılmış, vücudu dört parçaya ayrılmış, karmı deşilmiş, yüreği çıkarılıp yüzüne fırlatılmış, sonra da boynu vurulmuştur. Doğu toplumlarında dağlama, Romalılarda damgalama cezalarına sık rastlanmaktadır. Dağlama ve damgalama, 17. Yüzyıl Amerika’sında da vardır. İlk hırsızlıkta suçlunun eli üzerine “T”, ikinci hırsızlıkta ise “R” harfi dağlanarak damgalanmıştır. Maryland’da tanrı’ya söven, “B” (blasphemy), halkı asılsız haberlerle kışkırtan “S.T” (seditions) harfleriyle damgalanmış, Vermont’ta ve New England’da zina suçlusu kadın, üzerinde simgesel “kırmızı harf” taşımak zorunda bırakılmıştır.”¹

İslâm sonrası dönemlerde İslâm coğrafyasında bazı halife, sultan ve şahların da suçlu buldukları kişilere organ kesme ve özellikle dil ve el kesme cezalarını uyguladıkları görülür.

Şair ve yazarın dili, kalemidir. Şairin kalemi, dolayısıyla dili tarih boyunca kendisine büyük ödüller ve in’amlar kazandırdığı gibi, bazen boynunun vurulmasına veya dilinin kesilmesine varıncaya kadar en ağır cezalara maruz kalmasına da sebep olmuştur. Önceki makalemizde hicivleri sebebiyle öldürülen şairlerden kısaca söz edilmişti. Burada İslâm coğrafyasında tarihte hicivleri sebebiyle dilleri kesilen bazı şairlere ve başka şahsiyetlere kronolojik olarak işaret etmekte fayda vardır.

Xo tira şa çilkê rışay ruhê pêğemberu bi şay

Adem ra heta ‘İsay wari rehıma zafı Allah (Serbest/2.9/14)

خُو تِرَا شَا چِلْکِي رِشَايِ رُوْحِي پِنْعَمْبَرُو بِشَايِ
اَدَمِّ رَا حَتِّي عِسَايِ وَاَرِي رَحْمَا ظَاْفِي اللّٰهُ

2.16. Hz. Muhammed

Muhammed; zaf hêw hemd u sena biyo, yena menayê tekrar tekrar methbiyayiş. Nameyê pêğamberê peyn o. Veri Hz. Muhammedi kesi nameyê Muhammed nêgureto (Akay, 2005:316-317).

Diwan dî nameyê Hz. Muhammedi 3 şiiran dî xoser sernuşteyan dî viyerenno. Ewilê ini şiiran diwan dî şiira newyêsın (19) “Dewri Ver Pêğemberî” ya. Şiir 51 beyit ra ameya meydan.

Ini şiiran ra şiira diyın “‘Eşqê Resul” (Ina beyt mı vata qey ‘eşqê Muħemmed) a. Ina şiir çarrêz a, şeklê nazım ra murabba wa u şêşt u panc (65) çarrêzan ra ameya meydan.

Şiira hireyın kitab dî qısmo diyın dî şiira heştın (8) bı nameyê “Qeşide’i Ver Dewri Pêğemberî” ya. Şiir hırıs u new (39) beyitan ra ameya meydan.

Ini hiri hemeyê şiiranê xoser sernuşteyan ra ciya zi Hz. Muhammed ra zaf beyitan dî behs biyo.

Şair vano ki Ellah, Hz. Muhammed visto Hz. Adem vir u waştı ki Hz. Adem tewbe bıkerı. Ezman dı nuştıyê murşid Hz. Muhammed nusiyo u Hz. Adem wa vajo ez qey Hz. Muhammed ‘efbiyayiş wazeno. Ellah qey xatırê Hz. Muhammed Hz. Adem ‘ef kerdo. Şair ita ra hereket keno u vano eg merdim wextuna kı tewbe

keno, gereka vaj ya Rab tı qey Hz. Muhammedi mı ‘ef bıkeri, yani tı mı bıdi qey xatirê Hz. Muhammedi:

Xalıqı yey viri visto Muḥemmed Muştefa est o
Ewniya asmin murşidi nuşto wari reḥma zafı Allah
(Serbest/2.9/44)

خَالِقِ يَیْ ۛثَبْرِی ۛسْتُو مُحَمَّدٌ مُصْطَفَى ۛسْتُو
اَوْنِیَا اَسْمِنُ مُورْشِدِ نُوْشْتُو وَاْرِی رَحْمَا ظَافِی ۛلله

Yona beyit dı şair, madem Hz. Adem vato qey Hz. Muhammedi ez ‘ef wazena u hetê Ellah ra ‘ef biyo ez zi tewbe kena u qey xatirê Hz. Muhammedi ‘ef wazenaomidê mı est o ki Ellah mı zi ‘ef keno:

Վա ez Rebbi hivi keno yexnini Muḥemmedı beno
Mın ‘afu ki tewbe keno Allah ma biw reḥmı mela (Serbest/2.9/45)

وَ اَز رِبِّ هِنِوْی كَنْنُو تَخْنِنِی مُحَمَّدٌ بَنُو
مِنْ عَافُوْكَ تَوْبَه كَنُو ۛلله مَا بِيُو رَحْمٍ مَّ لَا

“Lewlâke lewlâke lemâ xeletqu’l-eflak = Eg tı nêbını eg tı nêbını mı alem nêvıraşteni. Hetê din ra sahihtiya ina hedıs dı yo neticeya qeti çınıya. Labelê edebiyat dı ina hedıs zaf şuğulıya wa (Yıldırım, 2018:154). Tikeyê alıman vato ina hedıs niya, tikeyê alıman zi vato ina hedıs a. Kutubi Sitte dı ina hedıs nêviyerena; labelê zaf alıman ina hedıs, hedısa qudsi qebul kerda. Şair xo Neqşibendi vınenı. Erd u ezman u hasılı kelam sebebê vıraştışê alemi pêğembero peyın Hz. Muhammed o vano, ini hedıso qudsi qebul keno u hunerê telmih vırazeno:

Sebebê xelqê ‘alemi nuri Muḥemmed xatem i
‘Erd u sema ‘erş u zemin wari reḥma zafı Allah (Serbest/2.9/22)

سَبَبِی خَلْقِی ۛی ۛعَالَمِی نُورِ مُحَمَّدٌ خَاتَمِی
عَرَضُو سَمَا عَرَشُو زَمِیْنِ وَاْرِی رَحْمَا ظَافِی ۛلله

Şair yona beyit dı vano sebebê vıraştışê dunya Hz. Muhammed o. Merdım vajo Ellah u Muhammed piyoreyê derd u keder ra xelisiyeno:

Ina dunya pêru xelq biya qay ḥebibê serweri
Վaci Allah u Muḥammed ku ğem u derdi ma beri (Mesnewi/2/2)

اِنَا دُنْیَا پِیْرُو خَلْقِ بِيَا ۛفَاى حَبِیْبِی سَرُوْرِی
وَ اَجِی ۛلله مُحَمَّدٌ كُو عَمُو دَرْدِی مَا بَرِی

Goreyê tesawufi Ellah, verê cu Muhammed; badê cu nurê Muhammed ra mewcudatê bini vıraşti. Ino heqıqet eslê her çıyo u tera nurê Muhammedi yeno

vatiş (Üstüner, 2007:74). Qurân dî ino qedî ifade beno: Hz. Muhammed aleman ri rehmet erşawiyo (Ey Muhammed) ma tî qey aleman ri rehmet erşawiti (Enbiya, 21/107). Şair, seni ki fikrê tesawufî di qebul biyo; Ellah verê cu Hz. Muhammed vıraştî; badê cu nurê ey ra mewcudatê bini vıraştî. Şair vano çî qedî ayet dî ameya vatiş, Hz. Pêğembêr semedê aleman rehmet o:

Mexluqon ra pêru veri xelq biw nuri pêğemberî
Allahi nuri xo daw deri Allah ma biw rehmi mela (Serbest/2.9/11)

مَخْلُقُونَ بِرُؤْيُ وَرِي خَلْقِ بِنُورِي بِسَعْمَبِرِي
اللَّهُ ي نُورِي خُداو دَرِي اللّهُ مَا بِنُورِ رَحْمِ مَلا

Ya bîbî Ehemmed Muhammed hem emin
Ma tî day qay rehmeten lil ‘âlemin (Mesnewi/10/2)

وَأَبِي أَحْمَدَ مُحَمَّدًا هَمَّ آمِنُ
مَا تِي دِي قَائِي رَحْمَتِ لِلْعَالَمِينَ

Wextuna kî xîsusiyetê muminan yeno vatiş kelimeyi xewf (tersayiş) u reca (omid) şuguliyeni. “Xewf, tesawuf dî ezabê Ellah u cehenemê ey ra tersayiş; reca, qelbo kî çik tera weş ameyo, baweyê ey vînerîş u ino vînerîş ra reheti di-yayiş mena beno (Üstüner, 2007:129). Şair beyit dî mefhumê xewf şugulneno, mefhumê reca nêşugulneno. İta dî mefhumê zîkir, tewbe u edeb torî mefhumê tersayişê Ellahi piya şuguliyeni. Tersayiş u heskerdîş têmaniyê şuguliyeni. Ma bîoni ita ra ma eşkeni vaj kî yo reca ra zi behs biyo. Kamo kî qayilo heskerdîşê Ellahi qezenc bikero gerekî xo hetê Ellahi bigero. Ino nîzdîbiyayiş pê kelimeyê tewhid mumkin beno:

Zîkr u tewbew edeb u beri qelbî ma vebo xewfî Allah tede bo
Bi Mewlaya Mewlaya La ilahe illallah şû Mewlaya Mewlaya

Muhammed resulullah (Serbest/34/5)

ذِكْرُ تَوْبُو آدَبُو بَرِّ قَلْبِي مَا وَبُو خَوْفِ اللّهِ تَدَبُو
بِي مَوْلَايَا مَوْلَايَا لِاللّهِ إِلا اللّهُ شُومَوْلَايَا مَوْلَايَا
مُحَمَّدُ رَسُولُ اللّهِ

3. Ey ki Pêğembertiya Yini Bêlu Niya

3.1. Hz. Xızır

Goreyê bawerî “awaheyatî” merdim kena nêmerd. Xızır, sîfatê Hz. İlyasî yo: ey awaheyatî werda. Dahani zaf sey “Xızır İlyas” viyerên u yeno zanayiş. Goreyê

tikeyê mufesiran Qurân dı ayetanê 59-82 ê sureyê Kehf dı qısaya ki ameya nuş-tış, aya qısa dı merdımı ki rastê Hz. Musayî ameyo, Ellah ilmo xısusı dabı cı, o Xızır o. Tıkeyê zanayî Hz. Xızır ri vanî pêğember o, tıkeyê zi vanî weliyullah o (Akay, 2005:188).

Goreyê bawerî awaheyatî memleketo tari dı est a u kam kî ina aw bîwero, beno nêmerd. Vındayîşê awaheyatî zor a. Semedê vındayîşê ina awa bîqiyetın beniadem tarixî ver ra ko to cehdeyan u sefer kerda. Memleketo tari ino qedı cayan ra yo ca wo (Yıldırım, 2008:34). Şair; Xızır, awaheyatî u Zulqarneyn ra behs keno u hunerê telmih vırazeno. Peynî dı vano ki merdım awaheyatî bîwero zi dunya hina veng a u dunya yena, şına. Şair bawer keno ki bedenê Xızırî merdo; derheqê inî mewzuyan dı şair sey kelamciyan fikrîyeno:

Zeri sek tım buru awayheyatî Zulqarneyn şiw seferî zulumatî
Xızır şın u weno awayheyatî dunya veng a yena şuna ma se ki
(Qeside/9/37)

ظَرِي سَكَتٍ بُرُو أَوَى حَيَاتِي زُالْقَرْنَينَ شِسْوِ سَفَرِي ظُلوُمَاتِي
خَضِرُ شُونُو وَنُو أَوَى حَيَاتِي دُنْيَا وَنَكَا يِنَا شُونَا مَا سَكِي

3.2. Hz. Zulqarneyn

Zulqarneyn yeno menayê wehari dı qarn. Kelimeya qarn yena menayê “esır, bukleyê por (gıjık), queç (estere) i (Pala, 2004:508). Qurân dı nameyê Zulqarneyn viyerenö, semedê yo weliyo kamil u yo hukumdaro cihangir şuguliyeno. (Akay, 2005:515-516).

Şair, hediseya Zulqarneyn u Ye’cuc ri telmih keno. Zulqarneyn u Ye’cuc eynî dewır dı cuyayî, merdım çendêk zıxm beno wa bîbo dunya viyerenö, zeman sey ser, aşm u roj viyerenö u her kes yo roj ina dunya caverden u şino. Kes ina dunya dı ebedî niyo, şair diqetê wendoğan anceno seri ini mewzuyan:

Zemu şuno şeriw ‘aşmiw bi roci wextî Zulqarneyn u sedî ye’cuc î
Çıqa xişn u quwwetli bu sey ‘uci dunya dewriya yena şuna pey se ki
(Qeside/8/9)

ظَمُو شُونُو صَرِبُو أَشْمِيو بِي رُوَجِي وَخَتِي ذَالْقَرْنَينَ سَدِ نَاءَجُوَجِي
چَقَا خِشْنُو فُوئَلْبُو سَيِ عُوَجِي دُونْيَا دُورِيَا يِنَا شُونَا پَيِ سَكِي

Goreyê baweriyê verinan şimalê erd her zeman şew a, çirê roj nêbena. Awaheyatî zi aya mıntıqaya tari dı est a u mucewherî bîqiyetî her ca dı erziyê serê erdanê aya mıntıqa. Goreyê rivayetên İskender u Xızır semedê vındayîşê awaheyatî şiyî ina mıntıqa. Xızır ina aw werda u resayo nêmerdî. Labelê İskender awaheyatî zaf waşt a la ina aw nêdiya u têpa gero a. Derheqê İskender u Zul-

qarneyn dı rivayetan biyi têmeiyan u ino qedı yo fıkır miyanê şar dı qebl biyo: Zulqarneyn zi memleketo tari dı gerayo awaheyati (Yıldırım, 2008:745-746). Şair beyit dı viyarnayeyê dunya anı zıwan. Goreyê rivayetan dı çı qedı nusiyawo şairi zi o qedı qebl keno, İskerdero pil u Hz. Zulqarneyn biyi têmeiyan:

Zeri sek tım buru awayheyati Zulqarneyn şiw seferê zulumati
Xıdır şun u weno awayheyati dunya veng a yena şuna ma se ki
(Qeside/9/37)

ظَرِي سَكَتِمْ بُرُو أَوْى حَيَاتِي زُ الْقَرْنَنْ شِنُو سَفَرِي ظُولُمَاتِي
خَصِرُ شُونُو وَنُو أَوْى حَيَاتِي دُنْيَا وَنَا شُونَا مَا سَكِي

PEYNI

Mela Mehmet Demirbaş diwan dı 66 hebi şiiiran dı 16 pêğemberan ra behs keno. Pêğemberi ki nameyê yın Qurân dı viyerto inan ra pêğembertiya 25 pêğemberan qet'i ya. İnan ra 16 pêğemberi, goreyê qısayê Qurân yo çen cihêtan ra şuguliyê. Şair; pêğemberi semedê teşbih, kıyas u unsurê wasıfnayış gureti dest. Destguretişê pêğemberan sey edebiyato klasik o. Diwan dı;

Hız. Adem, Hız. Nuh, Hız. Hud, Hız. Salih, Hız. İbrahim, Hız. Lut, Hız. İsmail, Hız. İshaq, Hız. Musa, Hız. Dawıd, Hız. Suleyman, Hız. Yaqub, Hız. Yusuf, Hız. Yunus, Hız. İsa, Hız. Muhammedi ra behs biyo. Bê inan Hız. Xızır u Hız. Zulqarneyn ra behs biyo.

Şair hiri hebi şiiiri musteqili qey Hız. Muhammedi nuşti. Yo şiiira musteqil semedê Hız. Yaqub u Hız. Yusuf nušta. Şair, beyitan dı pêğamberanê binan ra zi behs kerdo.

Şair, hetê Ellah ra vıraştışê insanê ewil benateyê şar dı çı qedı ameyo zana-yış o qedı vato u bızıwanê hikaye nušto. Şair, waştışê vıraştışê insanê ewil ser, benateyê Ellah u Cebrail sey mışorêkerdiş behs keno. Şair, Hız. Adem ra ino qedı behs keno: Vıraştışê Adem Pêğembêr ra, biyayışê insanê ewil, hetê şeytan ra pê dom seni xapiyayo, meyweya ki werdişê ye cı ri bibi heram werdişê aya meywa, cenet ra teverbiyayış usn. mewzuyan. Hız. Nuh pê hediseya tafirduman; Hız. Hud u Hız. Salih wehari kerem u pêğemberê pil i; ino qedı tera behs keno. Hız. İbrâhim, kalikê Hız. Muhammed u Bısilmani miletê Hız. İbrahim ra yê usn. mewzuyan dı tera behs keno. Hız. Lut, dı cayan dı semedê qewmê xo ra nameyê ey viyerêno. Şair, semedê vatışi zêdkari, cıla ki teng u leşê merdim bêlu kena kam kı ay cılan xo ra do, kam kı xo sus bıkeru u şiyero pawyon, zemanê xo plaj dı bıviyarno inan sey qewmê Hız. Lut vineno. Wextuna kı Hız. İbrahim qey caardışê emrê Ellahi waşt bı Hız. İsmâil qurban bıkeru, Hız. İsmail bêtersbı, nêva ganê mı bıqiyet o. Emrê Ellah ri teslim bı. Şair, merdımı bêters sey Hız. İsmail vineno.

H. İshaq lajê H. İbrahim o, şair semedê ini melumatan ey ra behs keno. Des u dı hebi lajê H. Yaquub estibi u yı H. Yusufi ra bînena zêd heskerdên. Wer-ti ra vindbiyayişê H. Yusufi, H. Yaquub perişan kerd bı, şair ino mewzuyan ser dı vındeno. H. Yusuf, hetê bırayan xo ra erziyo miyanê bir u badê cu biyo melikê Mısır; tor inan ra hikâyeye yıwo Zelixa u hetê rındı ra behs biyo. H. Musa, şiyayişi serê Kuyê Tur u asayê yı wa ki sêhri werd bi teşbih biyo ey. H. Yunus, hetê mase ra ameyo werdiş. Hesretê ciyabiyaşiş u ay ki qalê yın est a labelê nêşkeni vaji inan teşbih biyi H. Yunusi. H. Dawıd, vengi kam ki weşo edebiyat dı teşbih beno H. Dawıd. Şair zi Mela Yusuf hetê vengweşti ra teşbih kerdo H. Dawıd. H. Suleyman, pê lutfê Ellahi zaf maldar bı, her çi binê emrê ey dı bı, weharê text u tac bı, weziri yı Asaf, mirçikê Hudhud u munasebetiya yı u melikê Sebe Belkis ra şuguliya wo. H. İsa; Adem ra hetani H. İsa vajiyo u o qedı zıkır biyo. Diwan dı derheqê H. Muhammedi hiri hebi şiiir nusiya. Qey qebulbiyayişê tewbeyê H. Adem nameyê H. Muhammedi ezman dı nusiya u H. Adem o nuştê di u vato ya Rab, qey xatirê H. Muhammedi tı mı 'ef bıkeroy, o qedı 'ef biyo. Dunya qey xatirê H. Muhammedi ameya vıraştiş, H. Muham-med aleman ri birehmet ameyo. Yo zi şair H. Muhammedi ra semedê şefaet waştiş behs keno. Ya zi H. Muhammedi meth keno u Allah ra 'ef wazeno.

Şair zaf cayanê diwan dı dunyaya viyeraye, heyato ebedi axiret a, merg nê semedê maldar o, nê zi teyna semedê feqir o, nê oniyêno rındı, nê oneno zıxmi; merg semedê her kes o. O semed ra şair her kes iqaz keno u vano gerekta her kes bıdiqet bıcuvo.

Demirbaş, diwanê xo dı pêğemberi ki Qurân dı nameyê yın viyerto inan ra behs kerdo. Ino cihê ra ma eşkeni vaj ki her yo pêğember ra goreyê kısayan Qurân behs biyo. Tor me ra tikeyê pêğemberan ra Qurân dı behs biyo labelê diwan dı nameyê inan nêviyerto. İni pêğemberi: H. İdris, H. Eyub, H. Şu'ayb, H. Harun, H. Zulkıfl, H. İlyas, H. Elyesa, H. Zekerıyya u H. Yahya wê.

ÇİMEYİ

Akay, H. (2005), *İslâmî Terimler Sözlüğü*, (n.3), Neşirxaneyê İşaret: İstanbul.

Apuhan, D. (2021), *Diwani Mela Mehmet Demirbaş u Tehlili Ey*, Üniversiteya Bingol, Enstituya Zıwanan Ganiyan, Qısmê Zıwan u Edebiyatê Zazaki, Tezê Doktora, Hema Neşirnebiyo: Bingol.

Arzi, S. (2018), *On Altıncı Yüzyıl Divân Şiirinde Ulül-'Azm Peygamberler*, Enstituya İlimanê Sosyal ê Üniversiteyê Selçuk, Tezê Lisanso Berzi, Hema Neşirnebiyo: Konya.

Aslanoglu, O. (2018), *İran Şiirin Kraliçesi Pervîn-i İ'tisâmî Divan Tahlili*, Neşirxaneyê Name.

Demirbaş, A. ve Birici, S. (2021), "Fırdevsî-i Rumî'nin Süleymân-nâme-i Kebîr (78. Cilt)'inde Peygamber Kıssalarına Telmihler", *Littera Turca Journal of Turkish Language and Literature*, 7(2), r.288-307.

- Güç, A. (2009), “Salih”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, (Cilt 36), r.32-33, Neşirxaneyê TDV: İstanbul.
- Harman, Ö.F. (2000), “İsmail”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, (Cilt 22), r.519-521, Neşirxaneyê TDV: İstanbul.
- , (2007), “Nuh”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, (Cilt 33), r.224-227, Neşirxaneyê TDV: İstanbul.
- Karaman, F., Karagöz, İ., Paçacı, İ., Canbulat, M., Gelişen, A., Ural, İ. (2006), *Dinî Kavramlar Sözlüğü*, Neşirxaneyê DİB: Ankara.
- Kazancı, A.L. (b.t.), *Peygamberler Tarihi*, Neşirxaneyê Nil: Almanya.
- Pala, İ. (2004), *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Neşirxaneyê Kapı: İstanbul.
- Sefercioğlu, M. N. (2001), *Nevî Divanı'nın Tahlili*, (n.2), Neşirxaneyê Akçağ: Ankara.
- Uludağ S. (2012), *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, Neşirxaneyê Kabalıcı: İstanbul.
- Üstüner, K., (2007), *Divan Şiirinde Tasavvuf*, Neşirxaneyê Birleşik: Ankara.
- Vanlı, M. (2021), “Ünsi Hasan Şa'banî Divânı'nda Peygamberler ve Peygamber Kıssalarına Telmihler”, *Kafkas Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 8(15), r.75-102.
- Yavuz, Y.Ş. (2007), “Peygamber”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, (Cilt 34), r.257-262, Neşirxaneyê DİB: İstanbul.
- Yazır, M. H. (2010), *Renkli Kelime Mealli Kur'an-ı Kerim*, (n.7), Neşirxaneyê Nuh: İstanbul.
- Yıldırım, A. (2018), “Sen olmasaydın felekleri yaratmazdım hadis-i kudsîsinin klasik şiirine yansımaları” *Eski Türk Edebiyatı Araştırmaları Dergisi* [ESTAD] 1(1), r. 154-168.
- Yıldırım, N. (2008), *Fars Mitolojisi Sözlüğü*, Neşirxaneyê Kabalıcı: İstanbul.
- Yiğit, A.S. (2019), “Nailî Divânı'nda Peygamberler”, *Mavi Atlas*, 7(1), r.230-244.
- Zilan, B. (2018), “Mela Mehmedê Nêribê û Dîvanê Ey”, *Şewçıla*, Humarê:16, r.16-25.

دهستپیک له شیعری کلاسیکی کوردیدا (سالم) به نمونه

INITIATION TO CLASSICAL KURDISH POETRY (SALIM) AS EXAMPLE

نه‌رخه‌وان موحه‌مه‌د عوبید / Arkhawan Mohammed OBED*

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi/Received: 10.11.2021

Kabul Tarihi/Accepted/: 21.11.2021

Atıf: Obed. A. (2021).

“دهستپیک له شیعری کلاسیکی کوردیدا (سالم) به نمونه”

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 13, 161-205.

Orcid: 0000-0001-8314-1420

پوخته

دهستپیک له شیعری کلاسیکی کوردیدا (سالم) به نمونه؛ ناونیشانی توئژینه‌وه‌یه کی شیوازیی ناماری و شیکارییه، که تیایدا جهخت له سه‌ر هونه‌ره‌کانی دارشتنی دهستپیک شیعری له لای شاعیری کلاسیکی کورد (سالم) کراوه. له توئژینه‌وه‌که‌دا دهستپیک شیعری وه‌کوه‌ده‌روازی کرانه‌وه‌ی دهق مامه‌له‌ی له‌گه‌لدا کراوه و له‌سه‌ی ته‌وه‌ردا رۆل و شیوازیی ده‌برینه‌کانی سالم باس کراوه. له‌ته‌وه‌ری یه‌که‌مدا هونه‌ری دهستپیک و جو‌ره‌کانی به‌پیی پئوه‌ندی به‌مه‌به‌ستی شیعرییه‌وه‌ روونکراوه‌ته‌وه، ته‌وه‌ری دووه‌میش بۆ هه‌ژمارکردن و شیکردنه‌وه‌ و دابه‌شکردنی دهستپیک شیعری سالم به‌پیی شیوازه‌کانی گوتن ته‌رخان کراوه، له‌ته‌وه‌ری سییه‌مدا پینج جو‌ری پئوه‌ندی له‌نیوان دهستپیک شیعری و کو‌تایی شیعری خراوه‌ته‌وه‌وو. له‌میانی ئەم توئژینه‌وه‌یه‌دا گرنگترین خه‌سله‌ته‌کانی سالم له‌چۆنیه‌تی دهستپیک گوتندا ده‌ست‌نیشان کراوه و هونه‌ری شاعیر و زالبوونی به‌سه‌ر ده‌قدا به‌مه‌به‌ستی نیشاندانی جیاوازییه‌ تاکه‌که‌سییه‌ شیوازییه‌کانی شاعیر چرکراوه‌ته‌وه‌ و له‌ئه‌نجامدا خراونه‌ته‌وه‌وو.

* Dr. University of Kerkuk, The Collage of Education and Human Sciences,
arkhawanmohammed83@gmail.com

مامۆستا له‌به‌شی کوردیی کۆلیژی په‌روه‌رده‌ی زانسته‌مرو‌فایه‌تییه‌کان، زانکۆی که‌رکوک

وشەى كليلى توژينهوه: سالم، شيعري كلاسيكى، دهستپيگ، جوړه كاني دهستپيگ، دهستپيگى دلگير، دهستپيگى جوان.

ملخص البحث

عنوان لدراسة اسلوبي احصائي و الأستهلال في الشعر الكلاسيكي الكردي الشاعر(سالم) كنموذج، تحليلي، تم فيها تسليط الضوء على فنون استهلال الشعر و كيفية انشائها عند الشاعر الكلاسيكي (سالم) في بداية الدراسة تم التعامل مع الاستهلال كبوابة و مفتاح لدخول فضاء النص الشعري. قسمت الدراسة على ثلاثة محاور اساسية، في المحور الاول تم مناقشة فن الاستهلال و اساليبها و تقسيماتها حسب العلاقة بين المقدمة الشعرية والغرض الشعري. ثم عرض الدراسة في المحور الثاني الاحصائيات المتعلقة باساليب الخطاب في الاستهلالات الشعرية عند(سالم)، اما في المحور الثالث فاعتمد الدراسة على كيفية العلاقة بين الاستهلال و الخاتمة الشعرية وعرضها مختصرة في خمسة انواع.اهم ما توصل اليه الدراسة من نتائج عملية وتحليلية متمثلة با الفروق الفردية في اسلوب الشاعر الاستهلالي و طريقتة في بدأ الخطاب الشعري، تم تلخيصها في نهاية البحث في سبعة نقاط مجزة.

الكلمات المفتاحية للدراسة: سالم، الشعر الكلاسيكي، الاستهلال، انواع الاستهلال، براعة الاستهلال، حسن الاستهلال.

Initiation To Classical Kurdish Poetry (Salim) As Example

Abstract

Initiation to classical Kurdish poetry (Salim) as example, is the title of a statistical and analytical research in which the art of composing the initiation in Salm's(1220-1286 poems is focused., In this research , the initiation of the poem is like an opening door to the main point, and in three axes, the role and the way of writing Salim poetry is mentioned. In the first axis, the art of initiation and its types have been clarified in relation to their aim and purpose of poetry, the second axis is to count, analyze and divide the initiation of Salim poetry in relation to the stylistic methods of that poem, in the third axis, five types of relationship between the beginning and the end of the poem are examined. In this research, the most important Salim traits in how to compose have been considered, and the poet's art and mastery of the subject have been analyzed and presented at the end in order to show the difference in the style of each poet.

Keyword Start:, Salim, classica poetry, Initiation ,Delightful start, Beautiful start.

پیشه کی

دهستپیک شیعری، کیلی چوونه ژوورهوی مالی شیعریه. سههدهتای ناویتهه بوونی وهرگره له گهل ئاسوی دهقدا، ئینجا نه گهر نهو کیله دههراکه به باشی والا نه کات، وهرگر هر له دههرازهده دههستپیکهوه، به لام نه گر کیله که به باشی دههراکه به کاتهوه نهوه وهرگر به نارهزووی خوئی به ناو هه موو کون وکه له بهه رکانی مالی شیعردا دههسورپتههوه. له دهقی شیعریدا قورسایی وروژان و سههه رنجراکیشانی دهق دههکه ویته نههستوی دههستپیک، بویه زور گرنهگه نهه رک و بههای دههستپیک شیعری چیگای تیرامان بیت، به تاییه تی له شیعری کلاسیکیدا، چونکه به هوی پیره وکردنی یه کیتی بهیت و یه کیتی بابته نهه رک و کاریگه ری و روئی دههستپیک له فورمی دهقی نوی و کلاسیکیدا هه ندیک جیاوازه. له بهه نهوه بهه گرنهگمان زانی دههستپیک شیعری کلاسیکی کوردی له رووی جوو وپیکهاتهوه و شیوازی دروست بوونهوه بههینه بهه باس وتویژینهوه.

سنوری تویژینهوه که:

شیعره کوردیهه کانی (عهه بدورهه حمان بهه گی ساحیب قران) که نازناوهه کی (سالم) ۱. هۆکاری هه لبرادنی سنوری تویژینهوه:

چر کردنهوهی تویژینهوهه که یه له سهه ری هه که نهه زموونی شیعری و ناوردانههویه له دههستپیک شیعری لای شاعرینک، که کاریگه ره بووه به هه ردوو سهه بکی هیندی و عیراقی. له بهه نهوه دههستپیک شیعره کانی هه مه جووون، بویه له سنووری نهه شیعرا نهه دا باسی دههستپیک شیعره کانی کراوه.

سووده کانی تویژینهوه که:

سهه رهه رای دههستپیکانه کردنی هه ندیک لایه نی شیوازه له دههینانی شیعری سالمدا، نهه تویژینهوهیه مادههیه کی خامی حازه بوو تویژینهوه ره خه ییه کان، چونکه پیدراوه کانی ناو تویژینهوهه که یارمه تی و ئاسانکاری بوو بریاردان و هه لسهه نگاندنی دههقه کانی سالم دهه کات.

ریبازی تویژینهوهه که:

1 سالم عهه بدورهه رحمان بهه گه، کوری محمهه بهه گی قهه رهه هه نهه نهه کوری نهه محمهه بهه گی صاحیبقران و ئاموزای (موسهه هه فا بهه گی) کوردیهه، له سالی (۱۲۲۰) کۆچی که بهه رامبهه (۱۸۰۵-۱۸۰۶) زاینیهه هه اتوته دونیاوه و له (۱۲۸۶) کۆچی بهه رامبهه (۱۸۶۹-۱۸۷۰) زاینی کۆچی دوابی کردوه، نازناوی شاعیر (رهه نچور) و (بیمار) بووه، به لام گوایه دواتر یزیشک نازناوی (سالم) ی بوو داناهه، که نیشانهه ساغی و سهه لامهه تییهه، چونکه سالم پاویکی لاواز و بی ناقههت و مات و بی دههنگ بووه. نهه شاعیره له پاش رووخانی حکومهه تی بابان لهه گهل خانهه وادهه کی دههچینهه تاران و زور لهه وی دههمنینههوه و وهرسهه دهه بیت، دواتر گوایه دهه گهه ریتههوه و له شاری سلیمانی کوچی دوابی دههکات و لهه سلیمانی لهه نهه نیشتهه گوری موسهه هه فابهه گی کوردی دهه نیشتریت، هه ندیکیش دهه لئین تورکهه کان نهه یینز نهه باشووری عیراق و له شاری حیهه کۆچی دوابی دههکات. بهه روانهه مهه لا عهه بدولهه کهریم مودهه ریس و نههوانی تر، دیوانی سالم، ئا. سدیق سالح، ب، ۱، چ، ۱، بنکهه ی ژین، سلیمانی، ۲۰۱۵.

لە تووژينەوه كدا بۆ دەستنيشانكردى جوړه كانى دارشتنى دەستپيگ له لای (سالم)، پشت به شيوازگهري نامارى و له شىكردنهوه كهشدا پشت به ههنديگ له چه مه كه كانى رهوانبيژى به ستراوه. بۆيه تووژينەوه يه كى نامارى شىكارىيه.

پروگرامى باسه كه:

ئەم باسه له پيشه كى و سى تەوهري سەرە كى پيگهاتوه، له تەوهري يه كه مەدا باسى دەستپيگى هونراوه وه كوو چه مەك و پيناسه كراوه و به پي پيوه ندى دەستپيگ به مەبه ستى شىعرييه وه، چوار جوړ دەستپيگى شىعري (دەستپيگى هاوتەريبي پالنه، دەستپيگى ئاشكرا، دەستپيگ به سۆز، دەستپيگ به وينه) لای سالم باسكراوه. ههروهه دەستپيگى جوان و دلگيريش خراوتە روو و پيوه ندى ئەم چه مەكانه به هەر چوار جوړى دەستپيگه كه وه شىكاراوتە وه، له تەوهري دووه ميشدا شيوازه كانى دارشتنى دەستپيگ له رووه زمانىيه كه وه نامار كراوه و ليكدانه وهى بۆ كراوه و له يانزه خالدا چر كراوتە وه. تەوهري سييه ميش بۆ پيوه ندى نيوان دەستپيگ و كوئايى دهق تەرخان كراوه، كه له ريگاي دروستكردى پيچ پردى پيوه ندى (تەواو كارى، بازەيهى، كورتكردنه وه، داپرو و پيچه وانەيهى) جوړى پيوه ندىه كان شىكاراوتە وه. له كوئايى باسه كهشدا گرنگترين نامانجه به ديهاتوهه كان وئەنجامه گشتيه كانى تووژينەوه كه له چه ند خاليكدا باس كراوه.

تەوهري يه كه م

دەستپيگى شىعري

دەستپيگ سەرەتا و هەنگاوى يه كه مە له هەموو كاريكدا، بۆيه به پي پيگه كهى گرنگه و ئەركيگى زۆرى ده كه ويته ئەستۆ و سەر كه وتنى كاره كهى پيوه بنده. له شىعريشدا دەستپيگ كليلى كردنه وهى دهقه به رووى نووسەر و وەرگرا، چونكه بۆ نووسەر هەنگاوى يه كه مى بونيادى هزره و بۆ وەرگريش سەرەتاى سەرنج راكيشان و تيكه ل بوونه له گه ل بوشايى دهقدا. ئەم سەرەتايه به شىكه له گشت، ئەو گشتەش په يكه رى دهقه كه يه كه له سەرەتا و ناوهرپاست و كوئايى پيگ ديئ. ئەم به شانە پيوه ندى و هەماهه نگی زۆر تيكه لاو له نيوانياندا ههيه، به لام ئەم هەماهه نگیه له پيگه و گرنگى ههچ كاميان كه م ناكاته وه.

(ئەرسستۆ) له پيناسه ي دەستپيگدا ده لى (موئله ت وەرگرتنه بۆ دەستپيكردى گفكوگۆ، له شىعردا پيشه كىيه و له هونەرى نهى ژه نيندا سەرەتاى كردنه ويه، ئەمانه ريگا خو ش ده كه ن بۆ ئەوهى له دواى ئەوان ديئ (۱). واتە؛ دەستپيگ رو لى سەرەكى ههيه له دياركردى سيما كانى ناوهرپاست و كوئايى دهق، چونكه ريگه خو ش ده كات بۆ ئەو شتانهى كه له دواى خو يه وه ديئ، بۆيه (پرى) به ها و جوانى دەستپيگ كاريگه رى چامه له دهرووندا دهنرخينى (۲)، ههروهه كاريگه رى له سەر نه مرى و مانه وهى دهقه يش ههيه.

له هونه‌ری شاعر نووسیندا و له بابته‌ی دهستپیک نووسینی شیعریدا پرسپاریکی گرنګ خوی دهسه‌پینی، ئەویش نایه‌ی ئەو دپړه‌ی یا ئەو دوو دپړه‌ی شیعری که له سهرتای شیعریکه‌وه ده‌بینی، مه‌رجه‌ی یه‌که‌م دوو دپړی نووسینی شاعیره‌که‌ی بیت و سهرتای ده‌ست کردنی شاعیر به‌شاعر گوتن بیت؟ یاخود مه‌رج نییه‌؟

بۆ وەرگری شاعر ئەو دپړه‌ی یا ئەو دوو دپړه‌ی سهرتای هەر شیعریک ده‌ستپیک شیعره‌که‌یه، چونکه‌ بۆ ئەو هیچ ده‌ستپیک دیکه‌ بوونی نییه، به‌لام بۆ شاعیره‌که‌ ئەو دوو دپړه‌ی ده‌شی له کاتی کردنی دا‌هینانه‌که‌دا سهرتا نه‌بوو‌بیت و ده‌ستپیک گه‌لا‌له‌ بوونی هزری ده‌قه شاعیره‌که‌ نه‌بوو‌بیت، به‌تایه‌تی له‌شعیری کلاسیکیدا، چونکه‌ (کاتیک بیرو‌که‌ی شیعریک له‌می‌شکی شاعیر ده‌رده‌که‌وی، سهرتا بیرو‌که‌که‌ وه‌کوو په‌خشانه، دواتر شاعیر وشه و دهر‌پین و کیش و سهر‌وای گونج‌وای له‌به‌ر ده‌کات، ری‌کخستنی سهر‌وا و هینانه‌وه‌ی کیشی گونج‌او و ده‌سته‌به‌ر کردنی مانا ده‌بیته‌ هۆی په‌یدا‌بوونی دپړه‌ شاعیره‌کان. که‌ دپړه‌کان زۆر بوون شاعیر ری‌کیان ده‌خات و له‌گشتیکدا هه‌موو پارچه‌کان کو‌ده‌کاته‌وه و له‌سیسته‌می ده‌قدا جیان بۆ ده‌ست‌نیشان ده‌کات. پاشان ته‌ماشایان ده‌کات و هه‌له‌چنی و گو‌رانکاری تیدا ده‌کات (۳)، وانا مه‌رج نییه‌ ئەو دپړه‌ی که‌ له‌سهرتای شیعریکدا ده‌بینیت، یه‌که‌م دپړیت که‌ شاعیر نووسیبیت، به‌لام ئەو دپړه‌یه که‌ شاعیره‌که‌ پنی باش‌بووه له‌ سهرتای شاعیره‌که‌یدا داینیت، بی‌گومان ئەم کاره‌ش له‌شعیری کلاسیکیدا ناسانه، چونکه‌ زۆر جار یه‌کیتی به‌یت له‌سیسته‌می دامه‌زاندنی دپړه‌کاندا پی‌وه‌کراوه، به‌لام بۆ شاعیری نو‌ی تو‌زیک جیا‌وازه، چونکه‌ یه‌کیتی بابته‌ له‌ دامه‌زاندنی ده‌قدا پی‌وه‌ ده‌کریت. ئەمه‌ش ده‌بیته‌ هۆی پی‌وه‌ست‌بوونی به‌شه‌کانی ده‌قه‌که‌ له‌ یه‌که‌یه‌کی ئۆرگانی پته‌ودا، ئە‌گه‌ر چی ده‌شی شاعیری شاعیری نو‌یش دپړیک یان دهر‌پینیکی به‌هزردا بیت و دواتر ئەو دهر‌پینه‌ له‌ نا‌وه‌راستی ده‌قه‌که‌دا شو‌ین خوی بگریت. به‌لام دیسان شاعیر له‌ نی‌وه‌نجالی ئەو دهر‌پینه‌ی که‌ له‌ هزریدا بوونی هه‌یه، دهر‌پینیک هه‌له‌به‌زیریت و دیکاته‌ بنا‌غی دامه‌زاندنی ده‌ق و ده‌ستپیک بو‌نیادانی مانا.

له‌ هه‌ردوو جو‌ری شاعردا (کلاسیک و نو‌ی) دپړی یا دوو دپړی یه‌که‌م، یا کو‌پله‌ی یه‌که‌م و دووم ده‌ستپیک شاعیره‌که‌یه و مامه‌له‌ی له‌گه‌لدا ده‌کریت وه‌ک کیلی ده‌ق، ئەو پر‌ۆسه‌ ئال‌ۆزی که‌ له‌پیش بو‌نیانه‌وه‌ هه‌بووه له‌ تو‌زیننه‌وه‌کاندا ده‌رنا‌که‌ویت، به‌لام بوونی ئیستای ناو ده‌ق وه‌کوو ده‌ستپیک و گرنگی و بایه‌خی له‌سیسته‌می ده‌قه‌که‌دا جی سهرنجی زۆربه‌ی تو‌زیننه‌وه‌کانه. له‌م تو‌زیننه‌وه‌یه‌ی ئی‌مه‌دا ده‌ستپیک شاعیری لای (سالم) له‌ دیوه‌ بینه‌راوه‌که‌یدا شیده‌کریت‌ه‌وه‌ به‌مه‌به‌ستی دۆزیننه‌وه‌ و سا‌غکردنه‌وه‌ی دیوی شاره‌وه‌ی کردنی دا‌هینان و سیما‌کانی دا‌هینانی شاعیری لای (سالم).

ده‌ستپیک شاعیری وه‌کوو چه‌مکینکی ئە‌ده‌بی و ره‌وانی‌زی پیناسه‌ ده‌کریت و ئە‌رکی بۆ

ی بۇ بە کار دەھین، opening line, firstline دەستىنشانكراوه، لە ئەدەبىياتى ئىنگىلىزىدا زاراۋى (ئەدەبىياتى عەربىدا بۇ دەستىپىك (مطلع، استهلال، ابتداء) ی بۇ بە کار دىت، بۇ جوانى دەستىپىكىش (براعة المطلع، حسن الاستهلال، حسن الابتداء) بە كاردىت، (المطلع) واتە (دەروازى چامەيە، دەبىت لە رووى ماناۋە زۆر تۆكمە بىت، مەبەست روون بىكاتەۋە، بارگاۋىيى بىت بە ھەست و سۆزىكى كاريگەر تاكوو لە يەكەم ساتەۋە سەرنجى ۋەرگەرەكان بۇ خۆى رابكىشىت) (دەبىت قسە كەر زۆر لىھاتەۋىت: (۴)، ھەرۋەھا (الخطيب القزويني) لە گرنكى دەستىپىكدا، دەلىق لە كاتى ھەلبۇزاردنى دەستىپىكى قسە كردندا، تاكوو گوتەيەكى خۆشتر و توكمەتريت لە رووى دارپشتەنەۋە و واتايەكى رونترىش بدات، چونكە دەستىپىك يەكەم شتە كە دەگاتە گۆى، بۇيە ئەگەر بە لىھاتەۋى دەستىپىكرابى ئەۋە سەرنجى گۆيگر رادە كىشىت و گۆيگر درك بە ھەمووى دەكات و لىق تىدەگات، بە پىچەۋانەۋە لىق دوردەكەۋىتتەۋە و تەنەنات ئەگەر لە رووى فۆرمەۋەش جوان بىت پشت گۆى (دەخات)، (۴)، واتە گرنكى (مطلع و ابتداء) لای عەرەبەكان لەۋەدایە كە سەرتاى گوتنە و رۆلى كاريگەرى لە سەرنج راكىشانى گۆيگر ھەيە، ئەۋ ھەنگاۋەيە كە چارەنووسى شىعەرە كە ديار دەكات، بۇيە زۆر بايەخى پىدەدەن و بە پىچەۋى دەستىپىكى شىعەرە كە ناۋى جىاۋازيان بۇ بە كار ھىناۋە لەۋانە (النسيب، التشبيب، الغزل، التسهيم، المقدمه الطلية... ھتد)، ئەم ناۋانە بە گشتى بۇ ئەۋ دەستىپىكى شىعەرە بە كاردىت، كە سەرتاكەى ۋەسفى يار، شوئىن، ھورپى ۋ خزم و كەس و كارە، سۆزى غەربىيە،... ۋەتد. واتە ئەۋان بە پىچەۋى دەستىپىكى شىعەرە كە ناۋان لە دەستىپىكە كە ناۋە و ھەندى جار ئەۋ دەستىپىكە دەبىتە نازناۋى شىعەرە كە.

لە ئەدەبىياتى كوردىدا (محمد صديقي موفتيزاده) ھەر لە ژىر كاريگەر ئەۋ دابەشكردن و ناۋلىنەنى شىعەرى عەربى، باسى جۆرەكانى دەستىپىكى كردوۋە، ئەۋ گوتوۋىتەتى (ئەگەر پىشەكى قەصيدە بە پىا ھەلگوتنى بە ھار و پايىز و چلۇنايەتى سروسشت و سكالالا لە دەست مېھرى دلبەر دەست پى بىكرى، بەۋ پىشەكەيە ئەلئىن تەشبيب... بەۋ ھۇنراۋە كە پىشەكى (تغزل) يان (تشبيب) بە مەبەستى ئەصلى قەصيدەۋە پەيوەند ئەدا ئەلئىن (تخلص)... ئەۋ قەصيدەيە ھۇنەر لە سەرتاۋە دەست ئەكات بە ھەلدانى مەبەست، بەۋ جۆرە قەصيدەيە ئەلئىن قەصيدەى (محدود)..... (ئەگەر پىشەكى شىعەرە كە) باس لە دەربىرىنى سۆز و ساز و دەردى دلدارى و راز و نيازى ئىۋان دلبەر و دلبراو بىكا پى ئەلئىن (تغزل) (۵)، بە پى ئەم دابەشكردنەى سەرۋە بىت، ئەگەر شىعەرىك بە ۋەسفى يان بە پىياھەلدان يان سكالالا كردن دەستى پى كرىت و پىشەكەيە كەى لە گەل بابەتى شىعەرە كە دا گونجا بىت ئەۋە (تخلص)، (سالم) لە چامەيە كەدا كە بۇ مردنى (محمود ناغاي سەلىم ناغاي شىۋە كەل) نووسىۋىتەتى، لە دەست پىكدا، دەلىق:

-لیم گەرین با گریه كەم، دیدم بە دیدی خوونفشان

نایىلى يەك دەم بەراحت رابویرم ئاسمان(۶)۲

ئەم دېرە (سالم) كەردوویەتی بە دەستپىكى چامەیه کی (۴۵)دېرى، (سالم) دەیهوئەت بگری و سكالاً دەكات لە دەست ئاسمان، چونکە ناهیل پشوو بدات، گریان و سكالاًکردن و نەمانی ئاسوودەى بەندە بە حالەتی مردنەو، کە لە بنەرەتدا پالئەرى نووسینی دەقەکەیه، بۆیه ئەم دەستپىکە تەخلوص، یاخود دەتوانین بلیین هەر دەستپىكىک لە شىئەر کە هاوتەریب بوو لە گەل پالئەرى سەرەکی نووسینی دەقەکە ئەو لە دېرى یە کەمى شىئەرە کدا دەردەکەوئە و جارن پىیان گوتووە تەخلوص، ئیستاش دەتوانین پىی بلیین دەستپىكى هاوتەریبی پالئەرى دەق.

هەرەها ئەگەر هەر دەستپىكىک لە شىئەردا راستەوخۆ بی پىشە کی مەبەستی شىئەرە کەى ئاشکرا کرد ئەو جارن پىیان گوتووە (محدود)، لە ئیستادا ئەتوانین پىی بلیین دەست پىكى ئاشکرا، چونکە راستەوخۆ مەبەستە کە ئاشکرا دەكات، زیاتریش ئەو شىئەرە دەگرئەووە کە بە پرسىار یان زانیاریە ک دەست پیدەکن بۆ نمونە (سالم) گوتوویەتی:

- دەک موبارە ک بی موکەرە، هەجووی سەنگ هەلکەن دەکەم

باى شەمالی هەجووی دى، خەرمانی عومری شەن دەکەم (ب-۱ل-۴۸)

(سالم) ئەم دېرەى بۆ داشۆرىنی (ئەحمەد ئاغای بەرد هەلکەن) نووسیوە، هەر لە سەرئای شىئەرە کەشدا ئەو زانیاریە بە وەرگرەکانی دەدات و مەبەستی شىئەرە کەش ئاشکرا دەكات، بۆیه دەکرئە بلیین ئەم شىئەرە دەستپىكى ئاشکرایە، ئەم چۆرە دەستپىکە یارمەتی چالاک کردنی ئاسوئە پىشبینی وەرگر دەدات، چونکە مەبەستە کەى لا ئاشکرایە، ئینجا پىشبینی دەكات بۆ ناوەراست و کۆتایی دەق، ئەو پىشبینیەش هەندیک جار بە ئاراستە دەق دەپرات و هەندى جاری دیکەش پىچەوانەى ئاراستەى دەق دەبیەت.

ئەو شىئەرەنەش کە جارن ناویان لی دەنا (تەشیب) و (تغزل)، دەکرئە لە برى ئەو ناوانە بلیین دەست پىک بە سۆز، ئنجا سۆز، سۆزی دلدار و سۆزی دلەبر و سۆزی گەرپانەو بۆ رابردوو و سۆزی شوین... هتد. دەگرئەووە، هەرەها دەستپىک بە وینە بە کار بینین، ئەویش هەموو ئەو شىئەرەنە بگرئەووە کە بە لیکچواندن و وەسفکردن دەستیان پى کردووە. بۆ نمونە:

- دلأ نازاری بی یاری، موشەخەص، دەردى کاریتە

بە حالى دل، دەسا ئەى دیدە! بگری؛ گاهی زاریتە (۷)۳

2 هەموو ئەو شىئەرەنەى سالم کە لە بەرگی یەكەمى دیوانەكەیدا هەیه ولە باسەكەدا بەكار هاتووە، لە هەمان سەرچاووە وەرگیراوە و لە كۆتایی دیزمکاندا بەم شێوازە (ب-۱ل-...) ناماژەى بۆ كراوە.

3 هەموو ئەو شىئەرەنەى سالم کە لە بەرگی دوومى دیوانەكەیدا هەیه و لە باسەكەدا بەكار هاتووە، لە هەمان سەرچاووە وەرگیراوە و لە كۆتایی دیزمکاندا بەم شێوازە (ب-۲ل-...) ناماژەى بۆ كراوە.

سۆزی یار و نەبوونی یار، دەروازی ئەم شیعریە، بۆیە ئەم جۆرە دەستیپیکە، بە دەستیپیک بە سۆز ناو دەبەین، چونکە راستەوخۆ شاعیر ھەستەکانی خۆی بەرامبەر دۆخیکى ديارى کراو باس دەکات. دەستیپیک بە سۆز لە لای سالم، دەستیپیکى زۆر باو، جا ئەگەر سۆزەکە لە رینگای زانیاری، لیکچواندن، ھەوالیک، پرسیارک، داخوایە کەوھە یان فلاش باکەوھ دەریکەوئ، گرنگ ئەوھە ئەم دەستیپیکانە دەشى بارگاوئى بن بە سۆز، واتە؛ دەستیپیک بە سۆز: ئەو سەرەتایەھە کە شاعیر تییدا بە تەوژمى ھەستەکانى و ھەلپشتنى خەم و ئازارەکانى رینگە خۆش دەکات بۆ دەبرپنەکانى ناوەرپاست و کۆتایى دەقە کە.

دەستیپیک بە وینەش ئەو دەستیپیکانەى شیعەر دەگرێتەوھ، کە شاعیر لە رینگای ھونەرەکانى رەوانبێژى و وەسفەوھ وەرگر پەلکیشى ویناکردن(تصور) دەکات، ویناکردنى ئەو وینانەى کە شاعیر لە دەستیپیکى شیعەرە کەدا دایان، ئەم جۆرە دەستیپیکە چالاكى و توانا فۆتۆگرافىھەکانى مېشكى نووسەر بەرجەستە دەکات و لە ھەمان کاتدا توانای شیکردنەوھى مېشكى وەرگر بەھێز دەکات، بۆ نمونە سالم لە دەستیپیکى شیعریکدا بەم شیوھى خواروھ دەستیپیکەکات:

-زەورقە دل، دیدیە دەریا و مەردوم ناو خودا

جۆشى خاطر وەك شەپۆل و غەم نەھەنگ، لەنگەر جەفا(ب-ل-۱۹)

(سالم) دللى لەناو دەریای چاودا دەکەوینتە بەر شەپۆلى ھەلچونەکانى دەروون و خەمیش قوتیدەدات و لە نگەرىشى کەنارى جەفایە، ئەمە ھەمووى لە بەردەم بیلبیلەى چاوى سالمدا روودەدات و ئەویش بى دەسەلاتە ھەر وەك ئەو کەشتیوانەى کە لە دەریادا و لەبەر چاودا کەشتیکەى شەپۆل دەبیات و نەھەنگیش لە دەرووبەریداھە و ناتوانى لەنگەرىش بگرى، چونکە کەنارە کە مەترسیدارە. ئەم دەستیپیکەى سالم نیشاندان و بەراورد کردنى دوو وینە دەخاتە بەر تەوژمى چاودەروانى وەرگر، بۆیە ھەر لە سەرەتای دەقەوھە فەزای ویناکردن چالاك دەبیت.

ئەشى کەسپک بلیت خۆ ئەم جۆرە دەبرپنەش ھەر پالەنرەکەى سۆزە، ئیتەر بۆ بە دەستیپیک بە سۆز نەیزمیرین؟

وھلامى ئەم پرسیارە ئەوھە: ھەموو شیعریک بەشپیک لە پالەنەرى دروستبوونى سۆزە(سۆزى راستە قینە یان دروستکراو)، بەلام ئەوھى وا دەکات جیایان بەکەینەوھە جۆر و شیوازى دەبرپنەکەھە، لە دەستیپیک بە وینەدا سەرەتا گەرپان بە دواى بەستنەوھى توخمەکانى وینە کە مېشكى وەرگر چالاك دەکات و دواى دروستبوونى وینە کە، ئینجا کاریگەرى سۆزە کە و مانەوھى یان نەمانى لە ھزر و دەرووندا ئاشکرا دەبیت، واتە لێرەدا وینە کە جۆر و بەھای سۆزە کە و توانای داھینانى نووسەرە کە دەرخینى، بۆیە ئەم جۆرە دەستیپیکە جیا دەکەینەوھە و بە سەرەخۆبى ناوى لیدەنین دەستیپیک بە وینە، دەستیپیک بە وینە؛ ئەو شیعرانە دەگرێتەوھ کە سەرەتا کەھى بە وەسف، بە

لێكچواندن یان بە ھەر ھونەرێكى رەوانبێژى دەست پى دەكات، كە وینەیهك یان چەند وینەیهك نیشاندەدات. سەلیقەى ھونەرى نووسەر و ھەرگەر ئاشكرا دەكات.

لە ھونەرى رەوانبێژیدا، باسى جوانى دەستپىك دەكړى و بە پى ئەو جوانیە دەیکەن بە دوو جۆر، دەستپىكى جوان (حسن الاستهلال - حسن الابتداء) و دەستپىكى دلگیر (براعه الاستهلال - براعه المقطع)، دەستپىكى جوان (ئەوھى كە شاعیر سەرەتای ھۆنراوەكەى پى جوان بكات، ئەمەش دیارە بەو دەبیت و شەكانى سەرەتای گوتە شیرین بن، سەبەكە كە جوان پى، و اتاكەى تەواو بیت، بەلام ئەمە دەبى بەو مەرجە بیت، ئەم دێرە لە خۆیدا چ ئاماژەى كە ھەلنەگرتبیت، كە ئایە لە پاش خۆى ھۆنراوەكە باسى چى دەكات)) (۸)، و اتا دەستپىكى جوان پێچەوانەى دەستپىكى ئاشكرا (محدود) و دەستپىكى ھاوتەریبى پالنەر (تخلص)ە، چونكە ئەم دەستپىكانە دەبیت راستەوخۆ مەبەستى شىعەرەكە ئاشكرا بکەن، یانیش رینگە خۆشكەرىن بۆ مەبەستەكە و پێوەستبى پێوى. بەلام دەكړى ھەندىك لە (دەستپىك بە سۆز) و (دەستپىك بە وینە) بە دەستپىكى جوان بژمێردرین، چونكە پێشەکیان تێدا یە و راستەوخۆ مەبەست ئاشكرا ناکەن، بۆنمونه:

-لەبەر تەعمیری ئەم وێرانە، جەننەت مولكى ئادەم بوو

حەقیقەت پادشاهی کرد، وەلێکن موددتیکی كەم بوو (ب-۱-ل-۳۳۷)

ئەم دێرەى (سالم) لە سەرەتای شىعەرێكى شەش دێریدا دانراوە، وشەكانى جوانن، تەواون، و اتاكەى رۆنە، باسى حەقیقەتێك لە بارەى حەزرتى (ئادەم) دەكات، پێویستى بە ھیچ تەواوکاریەك نییە، بەلام ھیچ ئاماژەى كە تێدا نییە بۆ ئەو دێرانەى لە دواى خۆى دین، دێرەكانى دواى ئەم دەستپىكە باسى خۆى شاعیر دەكات، بۆیە ئەم دەستپىكە ئەتوانین بە دەستپىكى جوان ھەژماری بکەین، كە شاعیر ھەلیژاردووە بۆ سەرەتای دەستپىكردنى ھەلرشتنى خەمەكانى.

لە دەستپىكى دلگیردا دۆخەكە پێچەوانە دەبیتەو، چونكە دەستپىكى دلگیر (ئەوھى كە دێرەكە لە گەل مەبەست بگونجى و ھەر لە سەرەتاوە ئاماژە بۆ بابەتەكەى دواى خۆى بكات)) (۹)؛ و اتە ئەم جۆرە دەستپىكە، دەستپىكى ئاشكرا (محدود) و دەستپىكى ھاوتەریبى پالنەر (تخلص) و دەستپىك بە سۆز و ھەندىك دەستپىك بە وینەش دەگرتنەو، بۆنمونه:

-شۆرەزارى خاكى (رەى) ئەمجارە دامەنگیرمە

روو لە ھەر وادى دەكەم خارى وەك زنجیرمە (ب-۲-ل-۷۹۹)

ئەم دێرە دەستپىكى شىعەرە و ھەر لە سەرەتاوە شاعیر ئاماژە بۆ ناوى (رەى) دەكات، و ھەرگەر راستەوخۆ ھەست بە ناخۆشیەكانى بەندبوونى (سالم) لەو خاكە دەكات، لە ھەمان كاتیشدا دێرەكە رینگا خۆش دەكات بۆ ئەو دێرانەى لە دواى خۆیەو دین، بۆیە دەبینین لە دێرى دووھەمدا

گوتوویه تی؛

-ئیبیتدا بۆ (رە)ی که هاتم، فیکری عەقلیم لی، نه کرد

حبسی تارانم گوناھی کاری بی، تدبیرمه (ب-۲-۷۹۹)

له دپړی دووه‌دا (سالم) خەریکی سەرزەنشت کردنی خۆیه‌تی به هۆی هاتنی بۆ (رە)ی، واتە شاعیر هەر له هەمان بازنە‌ی دپړی یه که‌دا بە‌رده‌وامه و دپړی یه که‌م مە‌به‌ست روونده‌کاته‌وه و ریگا خۆش دە‌کات بۆ دپړی دووه‌م، بۆیه دە‌ستپێکی ئەم شیعەرە به دە‌ستپێکی دلگیر دادە‌نێین.

به پێی ئە‌وه‌ی تێبینیمان کرد زۆریه‌ی ئە‌و شیعەرانه‌ی (سالم) که بۆ بۆ‌نه‌یه‌کی تاییه‌تی یان بۆ هە‌جوو‌کردن، گێ‌پ‌رانه‌وه، گە‌باندنی هە‌وال و زانیاری گوتراوه، دە‌ستپێکی دلگیریان هە‌یه، وه‌ک؛

-میرزا وەرە لێم لاده دە‌ستی من و دامانت

ئە‌یمەن مە‌به لێم نه‌ک بێم یه‌ک دە‌فعه به مە‌یدانت (ب-۱-۲۱۵)

به‌پێی زانیاریه‌یه‌کانی ناو دیوانه‌که‌ی (سالم) بێت، ئە‌م شیعەرە بۆ (میرزا سلیمانی زینده‌رووم) نووسراوه، وه‌ک دە‌بینین هەر له سەر‌ه‌تاه‌وه دپړی یه که‌م مە‌به‌سته‌که ئاشکرا دە‌کات و پردی پێ‌وه‌ندی بۆ دپړه‌کانی دوا‌ی خۆی دروست دە‌کات. (سالم) (میرزا) ئاگە‌دار ده‌کاته‌وه له ئە‌گە‌ری هە‌جوو‌کردنی و ئینجا دە‌ست پێ‌ده‌کات، بۆیه لە‌م شیعەرە‌شدا دە‌ستپێکی دلگیر هە‌یه.

له نمونە‌یه‌یه‌کی دیکه‌دا؛

-تیروه‌ش دە‌ی مە‌ه گوزەشت و عە‌هدی نیسان هاته‌وه

بولبولی بی، دل، له‌ده‌وری گۆل، به ئە‌فغان هاته‌وه

ساخته‌گیری کرد، ئە‌گەر سەر‌ما، وه‌کوو ئە‌فراسیاب

بادی نه‌ورۆزی به میثلی پووری دە‌ستان هاته‌وه (ب-۲-۸۳۰)

ئە‌م دپړانه دە‌ستپێکی چامه‌یه‌کن به پێی زانیاریه‌یه‌کانی ناو دیوانه‌که‌ی بێت، گوايه (سالم) به‌بۆ‌نه‌ی هاتنه‌وه‌ی (عە‌بدوللا پاشای بابان له قوسه‌تە‌تینییه‌وه) گوتوویه‌تی، که دە‌ستپێکی شیعەرە‌که ده‌خوێ‌نینه‌وه راسته‌وخۆ هیچ مە‌به‌سته‌یه‌کی ئاشکرا نابینرێت، به‌لام له ریگای ده‌برینی (هاته‌وه) وه‌رگر ئاماده‌باشی گە‌رانه‌وه ده‌کرێت و له دپړه‌کانی دواتر‌دا که‌سی گە‌راوه ئاشکرا ده‌بێت، ئە‌م جو‌ره‌ ده‌ستپێکه‌ش هەر به دە‌ستپێکی دلگیر هە‌ژمار ده‌کری، چونکه له دە‌ستپێکی دلگیر‌دا شاعیر راسته‌وخۆ یان ناراسته‌وخۆ ریگه‌ بۆ گە‌لاله‌ بونی بیرو‌که و مە‌به‌ستی شیعەرە‌که خۆش دە‌کات، له‌م چامه‌یدا (سالم) به ناراسته‌وخۆ ئە‌م کاره‌ ده‌کات، بۆیه دە‌ستپێکی چامه‌که (ده‌ستپێکی دلگیره‌). هەر‌وه‌ها دە‌ستپێکی هاوته‌ریبی پالنه‌ری ده‌قه.

له نه نجامی ټو شیکردنه و هییه سهره ده کریت بلین، دستپیک؛ بریتیه له توانا و سه لیکه ی هونه ری و نه ندیشه یی و هزی شاعیر له دامه زانندن و خسته روی بیروکه و هیکه لی دهق، که دواچار سهرنجی و هرگر په لکیشی ناو فهزای دهق ده کات. جوانی دهستپیکیش؛ راده ی سهرکه وتنی شاعیر له خسته روو و دامه زانندی بیروکه و قالبی دهقه که ش دهنرخینی.

هروه ها به پپی دوور و نزیکی دهستپیک له مه به ست و پالنه ری دهقه وه و چونه تی کردنه وه ی فهزای دهق، ده کری ټم جوړانه ی دهستپیک بو شاعر جیا بکه ی نه وه (دهستپیکي هاوته ری بی پالنه ر، دهستپیکي ټاشکرا، دهستپیک به سوز، دهستپیک به وینه). له شیعره کوردیه کانی (سالم) یش، دهستپیکي دلگیر و دهستپیکي جوان ده بینریت و به پپی پیوه ست بوونی دهستپیکیش به مه به ستی شیعره وه لای (سالم) به م شیویه له زوره وه بو که م دهستپیکه کان ریزه ند دهن (دهستپیکي سوز، دهستپیکي هاوته ری بی پالنه ر، دهستپیکي ټاشکرا، دهستپیکي وینه).

ته وهری دووهم

شیوازه کانی دارشتنی دهستپیک له شیعره کوردیه کانی (سالم) دا

هونه ره کانی دارشتن و دهسه لاتی شاعیر له هه مه جوړکردنیان شیوازی شاعیره که دیار ده که ن. دهستپیکي شاعریش قورسای به رجه سته بوون و پیشاندانی شیوازی شاعیری ده که وینه ته ستو، بویه تیپامان له چونه تی دروست بوونی دهستپیک هه نگاوانه بو دروست بوونی بیروکه یه کی ته و او له باره ی شیوازی نوسه ره وه. یه کیک له ریگا کانی دهستپیکان کردنی شیوازیش ناماره، چونکه (ره هندی ناماری له زانستی شیوازه گریدا، پیوانه یکه ی بابه تی و سهره کییه بو دهستپیکان کردنی شیوازه جیاوازه کان و جیاکردنه و یان) (۱۰)، له بهر سو دی ټم ره هنده له م توپزینه وه یدا ناماری دارشتنه لیکچوه کانی دهستپیکي شاعیری سالم کراوه، مه به ستیش له م کاره دهستپیکان کردنی تایبه تمه ندیه تاکه که سییه کانی دهستپیکي شاعیری (سالم) ه، نامار کردن (ته نها به هایه کی ژماره یی ده خاته به رده ستی توپزهر، ده بی توپزهر ټو تایبه تمه ندی و سیفا ته باشانه دهستپیکان بکات بو دامه زانندی پیوانه ی چهن دی، تا کوو هه ندیک ژماره ی ده ست که ویت سو دی بو شیکردنه وه بابه تییه که ی هه بیت) (۱۱)، لای (سالم) ناماری هونه ره کانی دارشتن کراوته بنه مای پیوانه چهن دییه که. هه ره له سه ر بنه مای ټو داتایانه ش شیکردنه وه نه نجام دراوه.

خسته روی داتا کان

کزی شیعره کوردیه کانی ناو دیوانه که ی (سالم) بی هه ژمار کردن چوارین و تاک به یت و ده قیکي هجووی ناته و او (۳۷۱) دهقه.

- دەستیپیک بە راگەیاندن (١٤٩) دەق.
- دەستیپیک بە وەصف و لیکچواندن (٥٦) دەق.
- دەستیپیک مەرەجدار یان گومانای (٣٨) دەق.
- دەستیپیک بە گێرانهوه و گفتوگۆ (٣٦) دەق.
- دەستیپیک داخوای (٣٤) دەق.
- دەستیپیک پرسیاری (٢٣) دەق.
- دەستیپیک نەری کردن (١٨) دەق.
- دەستیپیک بە فلاش باک و گەرانهوه بۆ رابردوو (٧) دەق.
- دەستیپیک پەشیمانی وشکات و حەسرەت ھەلکێشان. (٦) دەق.
- دەستیپیک بەسویند (٤) دەق.

لە شیعردا زۆر جار لەنیوان رستەى ھەوآلی و رستەى دارپشتندا تیکەڵبوون ھەبێ، خۆی لەبنەرەتدا رستەى ھەوآلی (ئەو رستەبەبە، کە ھەوآلیکی لە خۆ گرتوو، ناوخنەکەى ھەوآلدانە لە بارەى شتیکەو، بە باش، یان بە خراب.. مەبەست لێى راگەیانندن بەوێ ئەو حوکمەى لە خۆى گرتوو لە دەروەى دەربەرینە وشەبەبەکان واقیعیکی ھەبێ و ریکە لە گەلێ) (١٢). واتا لە رستەى ھەوآلیدا زانیاریەکی دیاریکراو بە کات و شوین و شتیکی دیاریکراو ھەبێ و رادەگەنریت. ئەم شیوازە دەربەرینە لە شیعەرەکانى سالمدا ھەبێ.

رستەى دارشتنیش (ئەو رستەبەبە، کە چ ھەوآلیکی لە خۆ نەگرتوو، بەلکۆ بۆ ئەو دانراو شتیک داوا بکات) (١٣)، ئەم جۆرە رستەبەبەش لە دەستیپیکى شیعەرەکانى سالمدا زۆرە، بەلام (زۆر جار وادەبێ ھەر یەكە لە خەبەر و دارپشتن لە مانای دروستى خۆیان دەردەچن و لەباتى یەكتر بە کار دین و مەبەستى یەكتر دەگەن) (١٤)، ئەم تیکەڵبوونەش لای (سالم) بوونى ھەبێ، لە بەر ئەو ئەم داتایانەى سەرورە بە پێى خاڵى و روزاندن دەستنیشان کراو، واتە لە دێرى یەكەم یاخود لە دێرى یەكەم و دووھەمى دەستیپیکدا چ شتیک قورسای بونیادی دەقەکە بەرجەستە دەکا (پرسیار، ھوآل و راگەیانندن زانیاری، گێرانهوه... ھتد) کراو تەبناغەى جیاکاریبە کە. بایەخ بە تیکەڵ بوون و پیکھاتەى زمانى رستە کە، ھیندەى بایەخدان بە مەبەستى رستەکان و ئامانجى رستەکانى دەستیپیک نەدراو.

١- دەستیپیک بە راگەیاندن.

مەبەست لە دەستیپیک بە راگەیاندن خستەرووی زانیاری و ھەوآل، ئەو شیعرانە دەگرتەو، کە

شاعیر له سهرتای شیعه که وه له ریگهی پیدانی زانیاریه ک یان هه والیکه وه بناغهی بونیادی هزری دهقه که داده نیت، ئینجا دهشی زانیاری و هه واله که دروست بیته یان نا دروست (خوازیی)، راسته قینه بیته یان ناراسته قینه، سهراوهی زانیاری و هه واله کانیش هه مه جوره.

له دهستپیک به خستنه رووی هوال و زانیاری تهها نه وه دهقانهی که راسته وخو زانیاریه ک یان هه والیک ئاشکرا ده که نه هه ژمار کراوه، هه وال و زانیاری مه رجارو نه ری کردن و... هتد لی جیا کراوه ته وه، چونکه هه ری به کییک له و شیوازانه کاریگری سه ربه خوئی هه یه له بونیادی دهستپیکی شیعه را.

(۱۴۹) شیعی (سالم) به راگه یاندنی هه وال و به خشینی زانیاری له بارهی شتی که وه دهست پی ده کات، واته؛ شاعیر نه وه ته و ژمه ی که له ده روون وه زیدا هه یه و هو کاره که ی نه وه زانیاریه یه له دهستپیکدا دهیخاته روو و باره قورسه که ی سووک ده کات و ریگه بو دروست بوونی ده برینه کانی دیکه ده کاته وه.

له م جوره دهقانه دا ته و ژمی داهینانی شاعیر وه ک نه و ناوه یه، که به ری گیراوه و فشاری ناوه که به ربه سته که ده شکی نی و دواتر له سه ر خو و به هیمنی ناوه که شوینی خوئی ده کاته وه و به ریگای خویدا ده چیته. له دهستپیک به راگه یاندندا ته و ژمه شیعی یه که به پیدانی هه وال و زانیاریه که به ربه سته که ده شکی نیته، بیگومان هه ر شیوازیکیش مه به ستیکی له پشته وه یه له وانه:

۱- مه به ست له دهستپیک به راگه یاندنی هه وال و زانیاری، به تال کردنه وهی ناخه و خو زگار کردن له ستریس و دابهش کردنی خه مه کانه له گهل وهرگر و که سی بو ئارسته کراودا، بو نمونه؛

- ویردی زویان و فیکری دل، شهرحی فیراقه سه ربه سه ر

هه لده قولی له عینی چاو، خوینی جگه ر شه مه ر شه مه ر (ب- ۱- ۳۴۴)

نه م دیره دهستپیکی شیعیکی شهش دیرییه، شاعیر هه ر له سه رتاوه به باس کردن و پیدانی زانیاری له بارهی دۆخی تاییه تی خو یه وه، که له نه نجامی دابرا نه وه تووشی بووه دهست پی ده کات. دواتر که خوئی زگار کرد له راگه یاندنی دۆخی خوئی و هه نگای یه که می نا، ئینجا پینج دیره که ی دواتر به هه مان نه و جوگه ییدا دینه خواره وه که دیری یه که م دروستی کرد.

له نمونه یه کی دیکه دا هاتوه؛

- هه لپرا خوینی به جگه ر ما ده می غه مزه ت له ضه میر

هاته جونبوش که به نا هم له ده روونا، په ری تیر (ب- ۱- ۳۵۸)

هه والی هه لپزانی خوینی جهرگی به سه به بکاره که ی راده گه یه نی، مه به ستیش لی هوشیار کردنه وهی که سی دووه مه له دۆخی ئیستای شاعیر و ئاشکرا کردنی ئازاره کانیه تی. بو یه شاعیر

له دەست پێکدا پهنا دهباته بهر راگهياندنی ههوال. له نمونەیه کی دیکه دا:

-بو گه رانی ناشی دل فرمیسیکی چاوم بوو به یه م

بو منی بی کهس مزهی نایی، به غهیره ز دهر دو غه م (ب-۱-۴۸۶)

لێدهدا شاعیر به راگهیاندنی زانیاری له باره ی دۆخی بوونی دلی به ئاش و فرمیسیکی به یه م دهست پێده کات، له م دێر ده دا لیکچواندن هه یه، به لام دۆخی لیکچواندنه که بو راگهیاندنی هه والی بوونی دل به ئاش به کار هاتوو، نه ک له پیناوی جوان نیشاندا نی لیکچواندنه که، مه به ستیش له راگهیاندنه که ئاشکرا کردنی دۆخی دهر وونی شاعیره.

له نمونەیه کی دیکه دا:

-له سینه مدا سه دای نالینه بی تو

دلی زارم به سی غه مگینه بی تو (ب-۲-۷۲۷)

هه ره ها:

-له وادی فیرقه تا رۆژم وه کوو زولفت شهوی تاره

به یادی چاوی بیمارت، دل م دايم برینداره (ب-۲-۷۵۱)

هه ر دوو نمونە که ی سه ره وه، ده ستپیکن به راگهیاندنی هه والیک له باره ی دۆخی شاعیره وه و ئاراسته ی که سی دووه می تاک کراوه، و اتا هه ست و سۆزی په نگ خوار دووی نووسه ر له نه نجامی دا براندا له هه ر دوو ده ستپیکدا پالنه ری راگهیاندنی هه واله کانن.

له توێژینه وه که دا تپینی کرا له شیعره (لیریکی - ویزدانیه کانی) (سالم) دا له ده ستپیکدا به راگهیاندنی هه وال و زانیاری ده ست پێ ده کری، ئه رکی (شاعیری لیریکی دهر پیرینی ئازار و ئاواتی مرقفه، له رینگه ی وینه ی هونه ریه وه، بۆیه جوړه زمانیکی چر و ئامیزیکی دهر پیرینی هه ست و نه ست بزوتنی پێویسته) (۱۵)، یه که م هه نگاوی گه یاندنی ئه وه هه سته ش له رینگه ی هه وال و پیدانی زانیاریه وه بونیاد دهنری.

هه ره ها زۆریه ی ئه وه شیعرا نه ی سالم که ده ستپیکه که ی راگهیاندنه و مه به ستیش لێی دهر پیرینی هه ستی ناوه وه ی نووسه ره، (ده ستپیککی دلگیره)، چونکه دێری ده ست پیک په یوه سه ته به و دهر پیرینه ی که له دوا ی خۆیه وه دیت. هه ره ها ده ستپیکه به سۆز.

ب-مه به ست له ده ستپیک به راگهیاندن ته نها پیدانی هه وال

لە ھەندىڭ دۇخدا شاعىر كە ھەوالىڭ رادە گەيەن، (ئە گەر مەبەست لە ھەوالە كە، تەنھا راگەياندى ھەوالە كە بىن ھىچ جەختكردنە ۋەيەك) (۱۶)، ئەو ھەو دەخدا زانىارىيە كە دەخرتتە روو بىن ھىچ ئامانچىڭ يان ئاراستەيە كى راستە ۋە خۆى ھەست پىكراو، ئە گەر بۇ ئاراستە كراوئىش ھەيىت، ئەو تەنھا لە لايەن شاعىرە ۋە زانىارىيە كەى بۇ نىردراو ۋە ھىچ دەسە كەوتىڭى واقىيى نايىت، بۇ نمونە؛

-رېنا ساكىنى كۆتن، چ غولام و چ ئەمىر

ۋە كوويە ك ئەھلى نىازن چ، غەنى و چ فەقىر (ب-۱-۳۵۵)

ھەر ۋەھا

-عەبدى تۆن، بارى خودايا، چ غولام و چ نەدىم

ئىحتىاجن بە ۋە ضىفەت، چ گەداو چ نەدىم (ب-۱-۴۸۹)

لە ھەردوو نمونەدا ئەو كەسەى كە ھەوالە كەى بۇ ئاراستە كراو (خودا) يە، خوداش خۆى (عالم الغىب) ھ، ھەموو شتىڭ دەزانى، بۇيە پىدانی ھەوالى (ۋەستانى غولام ۋە ئەمىر و غەنى و فەقىر) لە دەرگای خودا و (عەبدى تۆن و ئىحتىاجن بە ۋە ضىفەت)، تەنھا خستە رووى ھەوال و زانىارىيە، چونكە كەسى بۇ ئاراستە كراو خۆى دەيزانى، بۇ ۋەرگىش تەنھا ۋە بىرھىنانە ۋەيە. بەلام لای شاعر ئەو دەستپىڭە خۆ ئامادە كردنە بۇ چوننە قولايى دۇخىڭى دەروونى و رووچى پەيۋەست بە موناجاتە ۋە. بۇيە مەبەست لە گەياندى ھەوالە كان دوعا كردن و پارانە ۋەيە.

لە نمونەيە كى دىكەدا:

-حالەتى عاشق گەلى ئەوقاتى دلگىرى ھەيە

صوبح دەم بۇ ئەھلى دل، ئەنواعى تە ئىبرى ھەيە (ب-۲-۸۶۵)

لەم دەستپىڭدا شاعىر تەنھا زانىار و ھەوالى دۇخى عاشقان دەخاتە روو، مەبەست لىي روونكردنە ۋەى ئەو دۇخەيە، بۇيە لە دىپرى يە كەمدا ھىچ داواكارىە ك يان ئەنجامىڭ بۇ ھەوالە كە نىيە.

لە لىڭكەنە ۋەى ئەم دىپردا (كۆمەلەى مودەرس) واى بۇ دەچى كە ((حال و بارى عاشق زۆر كاتى مايەى دلگىراوى و نارەحتى ھەيە، ۋەك ئەو ۋەى كە دەمى دلداران-لەوانە دللى عاشقان- ساغە و نىزىكە لە رووناكى خىر و بەرەكەت كە لە بەيانىدا ھەيە... ھتد)) (۱۷)، بە پىنچەوانەى ئەو لىڭكەنە ۋەيە، ئىمە پىمان وايە، لە پىشاندىنى دۇخى عاشقدا شاعىر دەلى: بارو دۇخى عاشق ھەندىڭ كاتى دلگىر و خۇشى ھەيە، لەو كاتانەش دەمە ۋە بەيانە (صبح دەم)، چونكە دەمە ۋە بەيان كارىگەرى زۆرە لەوانە؛ نەمانى تارىكى و دەركەوتنى رووناكى كە بۇ عاشقى حەقىقى مايەى نەمانى گومانە و نىزىك بوونە ۋەيە لە خودا، بۇ عاشقى مەجازىش كە شەو تەواو دەيىت، ئازارە كانى

تەواو دەبیئت، چونکە عاشق لە شەو دا ئازارەکانی زیاتر دەبیئت، بە بەلگەى ئەو ھەموو شیعەرى کە لەلایەن شاعیرانەو لە فەزای شەودا بەرجەستە کراو، ھەرەھا یە کێک لە کاریگەریەکانی دەمەوبەیان بۆ دۆخی عاشق لە دێڤى دووھەدا شاعیر دەیخاتە روو:

-ضەربى سوجدى ئاستانەت باز رەواجى دا بەرووم

خاکی دەرگات بۆ جەببىم حوکمی ئیکسیری ھەبە (ب-۲-۸۶۵)

لەم دێڤەشدا ئاراستەى گوتارى شاعیر بەرەو ئەو زاتەبە کە سوجەدى بۆ دەبردەى، خوداش خۆى ئاگای لە نوێژ کردن و دڵ و دەروونی ھەمووان ھەبە، بۆیە لێرەدا پێدانى ھەوالبە کە ھەر تەنھا خستەرووی زانیاریە کەبە لە نێوان خودى شاعیر و خودا.

ج- پێدانى ھەوالبە مەبەستى داواکاری و نیشانەدانى ھۆکارە کەبە

ھەندیک جار مەبەست لە راگەیانەدانى ھەوالبە زانیاری، داواکردنى شتیکە یان گومانە لە بارەى شتیکەو، یاخود پێشانەدانى ھۆکارە کەبەتەى، بۆیە زۆرجار (ئەگەر مەبەست لە ھەوالبە کە داواکاری بوو و ئەگەرى رەتکردنەوئەى ھەبوو، ئەو پێویست دەکات ھۆکارە کەبە شى تێدا بیئت) (۱۸)، لەم جۆرە راگەیانەدانە لای (سالم) زۆرە، بۆنموونە:

-دلا ئازارى بى یارى، موشەخەص دەردى کاریتە

بە حالى دلا، دەسا، ئەى دیدە! بگری: گاهی زاریتە (ب-۲-۷۴۹)

لەم دەستپێکەدا گوتارى دەق لە لەتەى یە کەمەدا ئاراستەى دلی شاعیر کراو و مەبەست لێى راگەیانەدانى زانیاریە، ئاشکرا کردنى ھۆکاری دەردى دڵکەبە، لە لەتەى دووھەمیشدا شاعیر داخوازی لە چاودەکات تا کوو بۆ حالى دلا بگری، راگەیانەدانى زانیاری و داخوازیە کەبە ھەمووی لە ناو چوارچێو و فەزای خودى شاعیردا بە، شاعیر خۆى راگەیانەکارە و ھەرگەر و داخوازی دەکات و جیبەجیکاریشە.

لە نمونەبە کەبە دیکەدا:

-تابى کوا ئاینە رووی تو بێتە ناو

گەر لە سەنگ بى، یە ک نیکەھ دەبکەبە (ب-۱-۶۱۵)

لەم دەستپێکەدا زانیاری لە بارەى بى ھێزى ئاویئە لە بەرامبەر روخسارى (یار) دا دراو، گومان لە روودانى ھەوالبە کە ھەبە، چونکە نیکای (بار) ھێندە بەتینە، ئاویئە ئەگەر بەردیش بیئت دەیکات بەئاو، بۆیە رووی یار نایەتە ناو ئاویئە کە. یە کێک لە پار دۆکسەکانى ئەم وئەبە بوونی بەردە بە ئاو، یێگومان شاعیر بەھێزى بەرد و شلى ئاوی بە کارھیناوە، بۆ دروست کردنى وئەبە کەبە،

به لّام تهوهی شاعیر لیّ بی ناگیه یان به مه بهست کردویه تی، ته گه ری بوونی بهرده به ناو، چونکه دهشی له ناو ناوی وهستاودا مروّف وینهی خوئی بیینیّت، ته مهش پیچه وانهی ویستی شاعیره کهیه.

له دهستپیک نمونهیه کی شیعری دیکه دا:

- من وبادی سه هر یاران، عه جایی بی قه راریکین

به سه رگه رانییا ههردوو، ده لیّ مه شغوولی کاریکین (ب-1 ل-606)

شاعیر زانیاری له بارهی خودی خوئی وبادی سه هر ده دات، لیّ ردها ههواله که بارگاوییه به گومان، چونکه به رهایی پیمان نالیّ سه رقالن یان نا و سه رقالی چین، به لکوو تهنها ههواله که راده گه یه نی بی دانانی مه رج ویی هیچ داواکاریه ک، تهنها له له تی یه که مدا ههوالیک راده گه یه نی و له له تی دووه میشتا له ولامدانه وهی ههواله که دا گومان دروست ده کات. شاعیر کاتییک که پیوستی به وه بوو، دوخی خوئی به دوخی شتیکی دیکه بچوینی و بههستیته وه، ته وه له دهستپیکدا به راگه یاندنی ههوال زانیاری له بارهی ههردوو کیانه وه دهست پی ده کات.

له نمونهیه کی دیکه دا:

- له طرف یاره وه نۆبه ی نه ظه ره

ته ی دلّ ئاماده به خوینت هه دهره (ب-2 ل-765)

له م دهستپیکه شدا شاعیر به راگه یاندنی ههوالیک دهست پیده کات و هو کاره که ی دهخاته روو، واته ههوالی ساته وه ختی (نه زهری یار) هاتوه راده گه یه نی، که هو کاری خوین هه دهر بوونی دلّ که شه، واته؛ کاتییک شاعیر دلّ نیایه و ده زانی که دوخیکی به سه ردا دیت، په نا ده باته بهر دهستپیک کی راگه یاندن.

ههروه ها له دهستپیک کی شیعریکی تر دا:

- دهنگی دهق والباب دلّ دی، ته ی خیرد، دا راکه، ده ی

کهس نه زانی بی، خهیالی یاره گهر، دهر وا که ده ی (ب-2 ل-932)

شاعیر ههوالی لیّدانی دهر گاری دلّ راده گه یه نی، ته گه رچی ههواله که مه جازییه، به لّام ئامازه یه بو رووداو ییک، رووداوه که بریتییه له یاد کردنه وهی (یار)، خهیالی (یار) هاتوته وه و شاعیر داوا له هو ش و ناگیی خوئی ده کات، بچن و له ترسی ره قیب به دزییه وه دهر گای لیّ بکه نه وه، له م دهستپیکه دا ههواله که راگه یه تراوه و ته نجام وهو کاره که شی باس کراوه، به لّام هه موو ته م رووداو و ههوالانه تهنها له فه زای خهیالی شاعیر بوونیان هه یه.

بە گشتی لە ئەزمونی شیعری سالمدا پالئەری سەرەکی شیعەرەکانی دەرپرینی سۆز بوو لە ریڭگای راگەیانندی هەستە کەنیانەوه، بۆیە دەبین زۆرترین ژمارە شیعەرەکانی ئەم جۆرە دەستپێکەیان هەیه، زۆریەشیان دەستپێکی دلگێرن، هەر وها دەستپێکی هاوتەریبی پالئەر و دەستپێکی ئاشکرا لە ناویان زۆرتەر، وەک لە دەستپێک بە وێنە و دەستپێکی جوان.

۲- دەستپێک بە وەسف و لێکچواندن

یەکیک لە هونەرەکانی دەستپێکردنی شیعەر وەسف کردن و لێکچواندنە، (سالم) لە (۵۶) دەقاد، بەم شیوازە دەستی بە شیعەرەکانی کردووه، بیگومان (دەستپێک رستە یە کەمە و پردی نیوان قسە نە کردن و گوتنە، دەستپێک گوتنە و ریڭگە خۆشکەری گوتنیشە، لە نیوان گوتن و گوتنیشدا نهنینیکانی چامە شار دراو تەوه) (۱۹)، بۆیە کە شاعیر پەنا دەباتە بەر دەستپێکی داری کراو بیگومان پالئەر و هوکارێکی تاییەتی هەیه.

زۆر جار کە مەرووف جوانی، ناشرینی، گەورەیی، بچووکی، بەهێزی بێ هیزی، خراپی و باشی شتییک سەرنجی رادە کیشی، هەول دەدات وەسفی بکات، بۆیە لە هەولێ دۆزینەوهی کەرەسەیی زمانیدا دەبیت، بۆ گەیانندی مەبەستە کەیی، یەکیک لە شیوازەکانی وەسف کردن، کە لە لای (سالم) یش زۆر بوونی هەیه، دروست کردنی وێنە یە لە ریڭگای لێکچواندنەوه، لێکچواندن (بەستن و پەیدا کردنی وێچوونیکە لە نیوان دوو شتا، بە هۆی هاو بەش بوونیان لە یە ک سیفەتا یا زیاتر بۆ مەبەستییک یان چەند مەبەستییک ديار) (۲۰)، ئینجا ئە گەر لە دەستپێکدا شاعیر پەنای بۆ دروست کردنی پێوهندی و سیفەتی هاو بەشی نیوان شتەکان بردبیت، ئەوه پالئەری نووسینی شیعەرە کە، سەرسام بوون بە باشی و خراپی شتە باسکراوه کەیه، بۆ نمونە؛

لە طیف و سەرو قەد و گۆل جەببینی

حەریف و دلغریب و دلنشین (ب ۲- ۹۲۶)

هەر وها

- غەبغەب و خال و تورپرەیی یار

سونبول و سیب و بەنە فشه و گولنار (ب ۱- ۳۰۶)

هەر وها

-- موژگان و ئەبرۆی تو: ئەم تیرەو ئەو کەمانە

سینەو دلێ فگارم، ئەم صەیدە، ئەو نیشانە (ب ۲- ۸۱۲)

هەر وها

٣-رووی له ناو طورپه چرایه له شهبايه

نهى شه کهر قامهته، قهندى له لهبايه (ب٢-٨٥٣)

ئهو چوار دپړه سهره دهستپنکی چوار شيعرن، ههر چواريان شاعیر به ليکچواندن دهستی پي کردوون، له ههر چوار شيعره کهش، دهستپنکی (تغزل)، ياخود دهستپنک به وینه به و بؤ يار گوتراوه. له چهندين نمونهی دیکه شدا، که (سالم) له وهسفی ياردا شيعری گوتوه، ههمان جوړی دهستپنک بوونی ههيه، بؤيه ده کرئ بلیين؛ له لای (سالم) کاتیک که پالنهری شيعره که پيوهندي به شیوه و رهفتار و کاریگه ریه کانی (يار) هه بیته، ئهوه دهستپنکی شيعره که به وهسف کردن و ليکچواندن ده بیته، چونکه وهک نامه ژه مان پیدا سهرسام بوون وینه لى پيدا ده بیته، بؤيه له دهستپنکی ئهوه شيعره شدا شاعیر ههموو به هره دی خوئی ده خاته گهر تاکوو جوانترین وینه دروست بکات.

له دهستپنکی شيعریکی دیکه دا (سالم) گوتويه تی:

-ليقا و جیلوه و ته جه لالی دل بهرم وهک شوعله یی نوره

به سه ررویا شوعائی ناصیبه یی ((نور علی نور)) (ب٢-ل٧٥٩)

لهم دهسپنکه دا سالم وهسفی بینینی (دل بهر) ده کات، که وه کوو تیشکی روناکیبه، راسته له له تی به که مدا زانیاری له باره یی چوئیه تی ده رکه وتنی (دل بهر) هه یه، به لام له ههر دهستپنکیکدا ئیمه کارمان به چه قی بونیادی دپړه که یه، لیره دا ئهوه چه قه، وهسفی (ليقا و جیلوه و ته جه لالا) یه، که به (شوعله یی نور) چوئراوه، هو کاری ئهوه جوړه دهستپنکه ش سهرسامی (شاعیر) ه، شاعیر هیئده سهرسامه به ده رکه وتنه که، بؤيه راسته وخو له ههنگاوی یه که می گوتندا وهسفی ده کات.

زور جار وا ده بیته، که به ک یه که ی بونیادی، شاعیر له دوو وینه دا دایده ریژت و دهیکات به دهستپنکی دوو شيعری جیاواز، بؤ نمونه؛

-چه شمه یی نه هری رهوان، دیده یی گریانی منه

موژه تا مه ددی به صر، نیلؤ قه رستانی منه (ب٢-ل٨١٤)

-عه یی فواره یی خوین، دیده یی بی خاری منه

مه نزل میهنه تی دونیا، دل به دناوی منه (ب٢-ل٨١٧)

ئهم دوو دپړه سهره دهستپنکی دوو شيعری جیاواز، به لام دهشی له ساتی کرده یی دا هیئندا ههردووک پیکه وه ئاماده بوون، یان ماویه کی کهم له نیوانیان هه بیته، به لام له یه ک ده قدا پیکه وه هلنا کهن، بؤيه ههر یه کیکیان ده بیته دهستپنکیکی وینه یی و چهندين وینه یی دیکه به

دوای خۆیدا دینیت.

وەسفی چاو و گریان چەقی دەستپێکن، گریانە که هیندە کاریگەری لە ناخی شاعیر کردووه، بۆیە شاعیر لەشتی و ئێکچوو بۆی دەگەرێ (نەهری رهوان، فهواره خوین) و دەیکات بە وینە، ئنجا وەکوو هەوآل راڤدە گەینە.

یە کێکی دیکە لەو بنەمایانە ی که وا لە شاعیر دەکەن پەنا بەریتتە بەر وەسف و ئێکچواندن لە دەستپێکدا، بنەمای جیاوازی و پارادۆکسە، که دەبیتتە هۆی دروست بوونی بونیادی بەراورد کردن، بۆ نموونە؛

-کە ی موقارین بن له وهصلا رووی من و روخساری یار

قەد بەهەم ناگەنە یە ک جا، ئەم خەزانە وئەو بەهار(ب-۱-۲۹۷)

هەست کردن بە جیاوازی یان نەبوونی متمانە بەخود، هۆکارە بۆ دەستپێکردن بە وینە، بۆیە لەم شیعردا سالم رووی خۆی بەراورد دەکات لە گەل روخساری یار، رووی خۆی خەزانە و رووی یار بەهار، دژبوونی بەهار و خەزانی قۆستۆتەو بۆ چواندنیان بە رووی خۆی و رووی یار، واتە؛ بنەمای جیاوازی هۆکارە بۆ دەستپێکی وەسف و ئێکچواندن.

هەر وها هەندێک جار هەردوو پالئەری پیاھەلدان و هەجوو کردن لە شیعردا، دەبیتتە هۆی دروستبوونی دەستپێک بە وەسف و ئێکچوون، بۆ نموونە؛

-ئە ی فیدای رەوتی توندت، گورگەلۆقی کەمتیار

وہی غولامی جوست و خیزت، لەقلەقی ناو جۆبار(ب-۱-۳۰۰)

بە پێی زانیارییەکانی دیوانی (سالم) بیت، ئەم پارچە شیعەرە بۆ (احوال پرسینی درویش ئاغا) نوسراوە، بەلام لە رێگای هەجوو کردنەو، لەم دەستپێکەدا (سالم) راستەو خۆ رەوت و رویشتنی دەرویشی بە گورگە لۆقی کەمتیار و لەقلەقی ناو جۆباری چواندووه؛ واتە توانجی لێ گرتووه، بەلام بۆ گەیانندی توانجەکە لە رێگای وەسف کردنی رەوتی (دەرویش ئاغا) وە پەنای بردۆتە بەر وینە جولاو. بۆیە دەلێین هونەری داشۆرین یە کێکە لەو هونەرانە ی که دەشی و لە شاعیر بکات دەستپێکی ئێکچوون و وەسفکردن بە کار بێنیت.

بە گشتی لە سەر بنەمای تێبینیەکانی شیعەرەکانی (سالم)، کاتێک لایەنی سۆز و هەست زالە بە سەر فەزای دەقدا، ئەو زۆر جار شاعیر لە دەستپێکدا بە رستە ی هەوآلی و رستە ی دارشتن دەستپێی کردووه، راستە و خۆش کاریگەری لە جولاندنی سۆزی وەرگر دەکات، بەلام کە لایەنی هونەرییە کە و خەسلەتی جوانی زال دەبێ بەسەر شاعیردا، ئەو شاعیر پەنا دەباتە بەر ئێکچواندن و وەسف کردن. ئەمەش چەشە ی داھێنان و دەرختنی تواناکان و دەسلەلاتی زمانی و هونەری

و توانای خەیاڵکردنی شاعیر زیاتر بەرجهسته دەکات و چەشەیی لێکدانەوه و ویناکردنی شتی وەسفکراو و هەلسەنگاندنی خەیاڵی شاعیر لای وەرگر دەرووژێتی.

۳- دەستپێکی مەرجدار و گوماناوی.

دەستپێکی مەرجدار و گوماناوی ئەو دەستپێکانەیە، کە شاعیر بە هەواییک دەست پێ دەکات، بەلام تەنھا هەوایە کە ناخەتە روو، بەلکوو مەرچی بۆ دادەنێت یان بە گومانەوه باسی دەکات. یەکیک لە پالەنرەکانی دەستپێکردنی شاعیر بە هەوایی مەرجدار یان هەوایی گوماناوی، خودی ئەو رارایی و بێمتانەبێیە، کە دەروونی شاعیری داگیر کردووه، بۆیە هەر لە سەرتاوه مەرچ و گومان لە بارەیی رووداویکەوه یان زانیاریە کەوه دەخاتە روو، مەرچ و گومانیش لە خاڵێکدا هاوبەشن، ئەویش ئەگەری بوون و نەبوونی هەوایە چاوەڕوانکراوەکیە، چونکە هەوایی مەرجدار (ئەو هەوایە، کە بەستراوتەوه بە مەرچیک و بە وەدیھانتی فرمانی مەرچە کە وەدی دیت، بەلام بە پێچەوانەوه، هیچ ناگەییەنی) (۲۱)، هەوایی گوماناوی (ئەو هەوایە کە پەیامە کە سەدا سەد نەدرۆیە نەراستە) (۲۲)، واتە؛ لە هەردوو دۆخدا دیار نییە بە تەواوتی هەوایە کە بوو یان دەبێت، (سالم) لە سی و هەشت دەقدا ئەم جوۆرە دەستپێکانەیی هەیه بۆنمونه:

-طەریقی عیشتت ئەر بەردەم، خەجالەت بم لە مەحشەردا

نەنووسرابم لە پیتا، گەر ئەزەل، حەک بم لە دەفتەردا (ب-۱-۵۸)

(سالم) لە دەستپێکی ئەم شیعەرەدا، لە هەوایی دوویاتکردنەوهی خۆشەویستیە کەییەتی، دەشی لە ناخیدا ترسی ئەگەری بەردانی رینگای ئەو عیشتە هەبوویت. بۆیە خەجالەتی رووی خۆی لە مەحشەردا بە پابەندبوونی بەعەشقه کەوه بەند دەکات، لە لەتی دووھمیشدا دەلی: ئەگەر چارەنووسیشت لە روژی ئەزەلەوه لە پیناوی تۆ مردن بێت، ئەوه دەبا بمرم. واتە، سەرچاوهی ئەو مەرچەیی کە شاعیر لە دەستپێکدا دایدەنێت، گومان و رارای ناخی شاعیرە.

لە نمونەییە کێ دیکەدا:

-پیم خۆشە کە عومرم بە جەفا صەرفی غەمت بێ

بەو شەرطە کە مایەیی زەرەرم ماچی دەمت بێ (ب-۲-۹۶۷)

یەکی ئەو خاڵانەیی کە وادەکات شاعیر، لە دەستپێکدا پەنا بەریتە بەر مەرچ، گەرانی شاعیرە بەدوای بەرامبەرێک بۆ هەلۆیست و رەفتارەکانی، واتا شاعیر بەدوای پاداشتەوهی، ئەوتادەلی پیم خۆشە هەموو عومرم لە خەمی تۆدا تەواو بکەم، بەمەرچی لە پاداشتا ماچی دەمی تۆم دەست کەوی.

لە دەستپێکی دیکەدا هاتووه:

-بەبەردەم گەم، گەر لەشەرحی غەم گەمی

ماتەمی دەگری دەروونی عالیەمی (ب-۲-۱۰۰۷)

هەندیک جار سوۆز و هەلپەیی رشتنی خەمەکان هۆکارێکی دیکەن بۆ دانانی مەرج لە لایەن شاعیرەوه، لەم نمونەییە سەرۆه (سالم) دەلی: ناخی خەلکی تووشی نارەحتی و خەم و ئازار دەبیت، ئەگەر بیت من باسی گەمیگەم لە خەمەکانی خۆم بگەم، ئەمەش بەهۆی ئەو پالەپەستۆییەوه روودەدات، گەمەکانی سالم لە ناخیدا جۆشیداوه.

هەوہا لە دەستیکی دیکەدا هاتووه:

-ئەگەر باوەردەگەمی، سەوگەند بە ئەبڕۆت

هیلال ئاسا خەمیدەم بۆ مەھی رووت (ب-۱-۲۲۲)

هەروہا

-بەنەقدی جان دەدا یە ک بۆسە دلدارم، وەلی زحمەت

دەگاتە حەددی واپوون عوقدەیی کارم، وەلی زحمەت (ب-۱-۲۳۴)

ئەم دوو دێرە سەرۆه، دەستیکی دوو شیعرن، لە هەردووکیاندا شاعیر گومانی لە روودانی ئەو شتە هەییە، گەمە خۆی داوای دەکات، لە دێرەیی گەمەدا گومانی هەییە گەمە یار باوەرپی بی بکا بۆیە سویند بە برۆکانی دەخوات، لە نمونەیی دووہمیشدا گومانی هەییە لە وەرگرتنی ماچیک لە بەرامبەر بەخشیینی رووحی، خۆ ئەگەر رازیش بوو ماچیک بەداتی لە بەرامبەر رووحی، ئەو لەو حالتەدا شاعیر گومانی هەییە گەمە کێشەگەمی چارەسەر بیت، چونکە گەرووچی بەدات دەمری گەمە مردیش ماچە گەمە سوودی نییە.

لە سەرەتای دەقیکی دیکەدا سالم هەستی گومانکردن لە لای زۆر زەقە و زالە بەسەر دەقدا، لە فۆرمی بوونی ئەگەردا دەریدەبڕی:

--ئیشارەیی غەمزە رەنگە قەصدی سەر بی

گەمە بۆ سەر بی، دەسا با زوودتەر بی (ب-۲-۹۷۱)

نەبوونی دلنییایەکی تەواو پالەنەری شاعیرە بۆ پەنا بردنە بەر دەستیکی گومان، شاعیر دلنییایەکی لە مەبەستی راستەقینەیی ئاماژەیی چاوی یار، بۆیە ئەگەری بۆ دادەنیت و لەسەر بنەمای ئەو ئەگەرە دەقە دادەمزرین.

بوونی گومان و نا متمانەیی و باوەر نەبوون سەرچاوە و پالەنەری دەستیکی بە مەرج و گومان، دەستیکی بە مەرج و بە گومان لای سالم زۆر بەیان دەستیکی دلگیرن، هەندیکیشیان دەستیکی

جوانن، دەستپىك بە مەرج و بە گومان تاكوۆتای دەق دەسه لاتى بەسەر فەزای دەقە كەدا دەمىنیت، چونكە ئەو ئەگەر و مەرج و گومانە كارىگەرييه كى درێژخايه نى ههيه، بۆيه شوێنه وارى بەسەر هزرى نووسەر وەرگريشدا بۆ ماوهيه كى درێژ دەمىنیتەوه.

٤- دەستپىك بە گىرانهوه و گفتوگۆ.

هەر كاتىك مەرۆف دەيهوێت بەسەر هاتىك يان رووداوێك باس بكاتهوه پىويستى بە گىرانهوه ههيه، هەرشتىكيش (لە ژێر كارىگەرى لۆژىكى چىرۆك و حه كايه تى ئەدهيى بو) (٢٣) ئەو گىرانهويه، بىگومان گفتوگۆ كردنیش هەر يه كىكە لە هونەرەكانى گىرانهوهى رووداو و چىرۆك، بۆيه پىكەوه هەژمارمان كرددون.

گىرانهوه وه كوو شووازيكى دەرپىنى شىعرى، دىته ناو بوارى شىعەرەوه، ئەو شووازه شىعر بە لای چىرۆكدا پەلكيش دەكات، كاتى گىرانهوهش ساته وهختى كردهى داهىنان بەرجهسته دهكات و ئامانجى شاعيره كەش لە پەنابردنه بەر گىرانهوه كە ئاشكرا دەكات، كاتى گىرانهوه لای (پۆل رىكۆر) دوو مانا لە خۆ دەگرێ (يه كه ميان: كاتى كارلىك كردنى نيوان كه سايه تى و بارودۆخه جياوازه كانه، دووه ميان: كاتى وەرگرى چىرۆكە، بە كورتى كاتى گىرانهوهى ناو دەق و دەرەوهى دەق كاتى بوونه لە گەل خەلكانى دىكەدا) (٢٤)، بۆ شىعر بوونى گىرانهوه لە دەستپىكى شىعەردا، بوونى ئەو دەروازەيهيه كە شاعير لە رىگايه وه دەپەرتهوه بۆ نيو جيهانى خەلكانى دىكە، جا مەبهست لەوه پەرينه وهيه توۆمار كردنى ميژوو بيت، يان دەرپىنى ههست و سۆزى شاعير بيت لە پەرجه كردارى ئەزمون كردنى چىرۆكىك، يان پەلكيش كردنى وەرگرى شىعر بيت بۆ ناو جيهانى شىعەرەكه، ياخود بە كارهينانى گىرانهوه بيت بۆ گەياندى مەبهستىكى دىكەى شىعرى. (سالم) لە دەستپىكى (٣٦) دەقدا لە بابەتى جياوازدا، بە گىرانهوه دەستى پىكردوو، بۆ نمونە؛

ئىبيتدا بۆز لە (سنه)ى كردهوه چرا

بوويه تى، چونكە لهوئى، نەشئونوما

با وجودى عەلە فى دەشت و زەلى

ئارەزووى هيجى نيه، غهبرى كه ما (ب-١-٣٥)

سالم لە باس ئەسپى (بۆز)دا، بە هونەرى گىرانهوه دەستى پى كرددوه، سەرتا شوێنى پەيدا بوونى (ئەسپ)ەكە ئاشكرا دەكات، كە لە كوێه هاتوه و پەرەردەبووه، ئىنجا باسى سروشت و زوھقى لە خواردن دەكات، تا كوۆتايى شىعەرەكه هەر شتمان لەبارەى ئەسپەكەى پىدەلێ، واتە؛ (سالم) ئەسپەكەى وه كوو كارەكتەر و وه كوو رووداوێك تەماشاش دەكات، بۆيه بابەتەكه وادەخوواى بە گىرانهوه دەستى پى بكات.

لە نموونەییەکی دیکدا:

-چۆمە سەر ضیافەتی مەللا بە کری عالی جەناب

چ بلیم خەلکینە بۆم نایەتە بەر مەددی حساب

خولاصە جی بە جی بوون، ریزی لە خوار، ریزی لە ژوور

هینایان هەر بە دو سینی یاپراخ و کەباب (ب-۱-۱۵۱)

یە کێک لە مانا کانی کاتی گێرانهوه لای پۆل ریکۆر (کاتی بوونە لە گەل خەلکدا)، لەم نموونەییە سەرەوێش (سالم) راستەوخۆ، کە دەیهوی بەسەرھاتی میوانداریە کە مەلا (بە کر) باس بکات، پەنا دەباتە بەر ئاراستە کردنی گوتارە کە بۆ خەلک، لەم دەقەدا فەزای گێرانهوه کە پەبوەستە بە (سالم) مەلا بە کر، ئەو کەسە سالم لە گەل لەسەر سینیە کە دانیشت، ئەو خەلکە ی سالم دەیهوێت بۆیان باس بکاتەو، لە گەل وەرگری فعلی ئیستای (دەق) ئەمانە وەکوو کارەکتەر، شوێنیش (شونیی میوانداریە کە مەلا بکرە)، ئینجا سالم لە دێرە کانی دواتردا رووداوە لاوەکیە کە، کە چەقی کۆمیدیا کە سالم دەگێرێتەو و باسی ئەو کەسە دەکات، کە لە گەل سالمدا لەسەر یە ک سینی دانیشتوو و نانی خواردوو و هیچی بۆ سالم نەهێشتۆتەو، بە پێی تێبینمان بۆ دەقە کانی (سالم)، زۆریە ئەو دەقەنە (سالم) کە باسی رووداویکی واقعی تێدا، دەستپێکی گێرانهویان هەیە. هەرەها لە چوار دەقی داشۆریندا دەستپێکی گێرانهوه هەیە، ئەو شیعراوەش کە دەستپێکی گێرانهویان هەیە، دەستپێکی ئاشکران یان ھاوتەریبی پالەرن، چونکە لە دەستپێکدا راستەوخۆ یان ناراستەوخۆ مەبەستی شیعەرە کە دیارە.

لە نموونەییەکی دیکەدا:

-بەدا ئەحوالی ئەشخاھی کە خاصە مۆلکی بابان

لە بی دادی فەلەک هەر یە ک سەراسیمە و هەراسان

جەوانانی سەھی قەد بەسکی داماون لە بی چیزی

لە ژێر باری غەما هەریە ک، لە خەودا میثلی چەوگانن (ب-۱-۵۷۶)

یە کێکی دیکە لەو ھۆکارانە ی کە وایکردوو (سالم) دەستپێکی گێرانهوه بە کار بەنیت لە شیعەرەکانیدا، بابەتی تۆمار کردنی رووداوە میژووێ کانی سەردەمی سالم بوو، لەبەر پەتدا تەکنیکی گێرانهوهی شیعری تەکنیکی (شاعیر تێدا چەقی سەرنجی دەخاتە سەر بابەتیکی و راستەوخۆ لە ریگای وەسفەو بەسی دەکات و خودی شاعیر تیایدا دەردەکەوێ) (۲۵)، بۆیە دەبینین لەم نموونەییە سەرەوێدا (سالم) چەقی سەرنجی خستۆتە سەر بابەتی نەمانی بابانەکان و لە دەستپێکدا باسی بارو دۆخی خەلکی بابان دوا نەمانی بابان دەکات، وەکوو تۆماریکی میژووی

لە رىڭگى گىپرانەوھو ۋەسفى دەكات ۋە ئەرشىفى دەكات ۋەھاوسۆزى (سالم) بۇ دۇخى بابانەكان بە دەقەكەوھە ديارە، بىگومان ئەمە تاكە نمونەش نىبە، (سالم) لە چەند دەستپىڭكى دىكەدا ۋەك (شۆرەزارى خاكى رەى ئەمجارە دامانگىرمە) بەھەمان شىۋازى ئەرشىفكردن زانبارىەكان تۆمار دەكات ھاوكات ھەست ۋەسۆزى شاعىرىش بە سەردەقەكەوھە زالە.

لەنمونەيەكى دىكەدا:

-لەسەر روو دانەيى خالْت بە فەن داناوھ، دەيزانم

بە قەصدى مورغى دل زولفت بە دەورا داوھ دەيزانم

خەرىكى دلنەوازىمى، بە چاوى مەرحەمەت ظاھر

نېھانى بۇ سەرم تىغى برۆت ساو داوھ دەيزانم (ب-۱-۴۴۹)

(سالم) ھەندىك جار پەنا دەباتە بەر گفتوگۆ كردن لە گەل كەسى بەرامەردا ئىنجا ئەگەر كەسى بەرامەر دەنگى ديار بىت يان نا، گرنىگ ئەوھىە لە رىڭگى ئاراستە كردنى پەيامى دەقەكەى بۇ كەسى دووھ، بابەتتىك دەگىپتەوھ، لەم نمونەيەى سەرھوھدا، گوتارى دەقەكە بەرھو يارە، بەلام دەنگى يار دەرنەكەوتوھ، تەنھا دەنگى سالمە كە بە يار دەلى (دەيزانم)، سالم بۇ يار باس دەكات، دەلى: خال ۋ زولفت ھەموو كە بە ھونەر ۋ بە مەبەست داناوھ بۇ گرتنى منە دەيزانم؛ واتا رەفتارەكانى يار بۇ خودى يار دەگىپتەوھ ۋ ھۆكارەكەشى پى دەلى، بەلام لە نمونەيەكى دىكەدا ھەر لە دەستپىڭكى گفتوگۆكەدا (سالم) دەنگى يارەكەى پىشان دەدات:

-لە نوورى لامىعى تەشتىكى راگرت ۋ وتى: روومە

بە دۇشا ئەژدەھەى پرنىشى راكىشا، وتى: موومە

تكام كرد: قەتلى من ناحەق نىبە واجىب، وتى فەرضە

ۋ تەم: بۇ ئاگرت بەردايە عومرى من وتى: خوومە (ب-۲-۸۰۲)

لەم نمونەيەى سەرھوھدا (سالم) تەكنىكى گفتوگۆى درامى لە دەستپىڭدا بەرجەستە كردوھ، تەكنىكى گفتوگۆ كردنى درامى (برىتتىبە لە ئالوگۆر كردنى چالاكى زمانى لە نىۋان دوو كەس يان زياتر، كە لە رىڭگى باوهرپىنھان ۋ خستەرووى بىر ۋ ھەلچوونەكانەوھ پىشكەشەكەرى) (۲۶)، لەم نمونەيەدا (سالم) گفتوگۆى نىۋان خۆى ۋ يار بۇ ۋەرگەرەكانى دەگىپتەوھ ۋ ھەست ۋ بىر كەردنەوھ ۋ بۇچوونەكانىان دەخاتە روو، دەنگى يار لەسەر زارى سالم دەردەكەوئى، واتا يار بوونىكى سەربەخۆى نىبە، بەلام لە رىڭگى سالمەوھ بۇچوونەكانى ئەو دەگات بە ۋەرگر. (سالم) كاتىك كە پالئەرى نووسىنى دەقەكەى مەنەلۆگەكانى خۆى بوو، ئەوھ لە دەستپىڭكى ئەو شىئەرانەدا پەيامىكى ئاراستە كراو ۋ گفتوگۆ دەبىنرەت.

بە گشتی لەو دەقەنە (سالم) کە دەستیپێکی گێرپانەووە و گفتوگۆیان ھەیە، بۆ دەستیپێکی شیعەرە کە پێویستە دوو دێر یان سێ دێر یە کەم ھەژمار بکەیت بۆ ئەوێ توخمەکانی گێرپانەووە کە بەتەواوەتی روونیپێتەو، ھەرەھا زۆریە ئەو دەقەنە دەستیپێکی دلگێرن و دەستیپێکی ئاشکراو ھاوتەریبی پالەنەرن. چونکە دەستیپێکەکان یان پێشە کین پەییوەستن بە مەبەستی شیعەرە کەو، یانیش راستەوخۆ مەبەستە کە روون دە کەنەو.

۵- دەستیپێکی داخواری.

کاتیەک کە مرۆف پێویستییەکی دەبێت ھەول دەدات، ئەو پێویستیە پر بکاتەو، لەرێگای داواکردنەو، داڕشتنی داخواریش (ئەوھییە کە داوای داواکراویک دەکات، لە کاتی داواکردنە کە بە پێی بۆچوونی داواکەر ھێشتا جێبەجێنەبوو) (۲۷)، واتە لە داخواریدا دەبێت لایەنی دوو ھەبێت، ئینجا لایەنی دوو ھەبێت یان مەجازی بێت، گرنگ ئەوھییە شتیەک لە لایەنی دوو ھاو دەکرێ. (سالم) لە دەستیپێکی (۳۴) دەقدا داخواری ھەیە، داخواریە کانی ھەمووی بۆ پرکردنەو ئەو کە لێنەھێیە کە شاعیر لە نەبوونی شتی داواکراو داوچار ی بۆتەو، بۆنموونە؛

- بە دەل کەین، بابەنەشەئە مەئ، خوماری میحنەتی دنیا

الا یا ایھا الساقی ادر کاسا وناولھا (ب- ۱- ۱۳۶)

لەم نمونەیدا (سالم) داواکارییە کە خۆی لە گەڵ داواکارییە کە (حافظ) تێھەلکیش دەکات، چونکە لەتی یە کەم ھەئە و لەتی دوو ھەئە، ھەردوو داواکارییە کە کە لێنە دەروونە کە پێش کردی داھێنانی دەقی پێ پر دەبێتەو، لە لەتی یە کەمدا (سالم) داوی گۆرپنەوێ خەمەکانی دنیا بە نەشەئە مەئ دەکات، لە لەتی دوو ھەمیش داوا دەکات ساقی جامیکی مەئیی بۆ بێنیت، لە یە کە میاندا داواکارییە کە ئالوگۆر کردنی لە گەڵ داو، لە دوو ھەمیشدا داخوارییە کە بۆ بەدی ھاتنی داواکاری یە کەمە، ھەردوو داواکارییە کەش زادی پێویستیە دەروونی و سۆزدارییەکانی شاعیرە. واتە کاتیەک رووھی شاعیر تامەزروی شتیەکە، ئەو ئەو تامەزروی دەبێتە پالەنەری دەبرینی داخواری.

لە نمونەییە کە دیکدا:

- میرزا وەرە لێم لادە، دەستی من ودامامانت

ئەیمەن مەبە لێم، نە ک ییم یە ک دەفە بە مەیدانت (ب- ۱- ۲۱۵)

لەم دەستیپێکەدا (سالم) بە ناوی ناسراو دەست پێ دەکات، بانگی (میرزا) دەکات، بانگکردن (یە کێکە لە ھونەرەکانی دەستیپێک، کە قسە کەر لە پەلە یە کەمدا بۆ مەبەستی دروست کردنی پێوەندی بە کاری دینیت) (۲۸)، لێرەدا (سالم) گوتە کەئە ئاراستەئە (میرزا) دەکات، مەبەستی لێی

ئاگادار کردنهووی (میرزا)یه، بویه بانگی دهکات و دهلی: میرزا وهره له مهن دوور بکهوه، یه کیک له مهبهسته کانی داخوایش گلهیی کردن و وشیارکردنهوویه، مهبهستی شاعیریش ئهوهیه ((گلهیههک ئاراستهیی فرمانپیکراو بکات و وشیاریبکاتهوه)) (۲۹)، لهم نمونهیه دا زیاتر مهبهسته که وشیارکردنهوویه و وهکوو هه ره شه لیکردنیش دهرده کهوئی، چونکه له له تی دووهدا سه ره رای وشیارکردنهووی به گوتهی (ئهیمهن مهبه لیم) هه ره شهی (نهک بیم یهک ده فعه به مهیدانت)ی لئ دهکات؛ واته هه ره شهی داشورینی لئ دهکات، ئه م ئاگادارکردنهوویه له دهستپیکدا بو ئهوهیه تاکوو رینگه خوش بکات بو هه جوهره کهی دواتر که له مهتن و کو تاییه کهی دهقه که دا کردویه تی.

له نمونهیه کی دیکه دا:

-لیم گه ریڤ با گو شه گیر بم دهست وئه ژنو کف زه نان

گیژ دلوو کهی بای نه دامهت تاری کرد صفحهی جیهان (ب-۱-۵۲۴)

شاعیر تکا دهکات، له دهره ره کهی که خه لکن و ده شی مهبهستی هاوری و ناسیاو و خزمه کانی بیته، که به ته نها به جیی بهیلن، تاکوو له ئازاره کانیدا بمینتتهوه، چونکه ئیتر ژیا نی لئ تال بووه.

ههروهها

-کاریهه دهرم له دلدا، داد هه ی بی دادی

کوا حه کیمی نه بزی من، فه ریاد، هه ی فه ریادی (ب-۲-۸۸۸)

لیره شدا شاعیر به کروزانهوه دهست پی دهکات، بو کروزانهوه ((فرمانیکی خوازیهه، له دهره کهوتنه کهیدا، ههست به کروزانهوه و لاوازی فرمانکه ره ده کهین)) (۳۰)، سالم به هوئی دهره کهیهوه ده کروزنتهوه و داوای فریادرس و حه کیم دهکات، ئه مه شیان هه ره به هوئی لاوازی شاعیرهوهیه.

له ههردوو نمونه کهی (تکا و کروزانهوه) که، شاعیر له لوتکهی لاوازی دایه، له نمونهی یه کهمدا به هوئی لاوازیهوه شاعیر داوای گو شه گیری دهکات، له کروزانهوه که شدا دیسان شاعیر لاوازه پیوستی به یارمه تیهه، بویه داوای فریاد دهکات. واته؛ کاتیک شاعیر له ناخدا تووشی شکست دیت و ههست به بی دهسه لاتی خوئی دهکات، ئهوه له دهقه شاعیره کاندایه نا دهباته بهر دهستپیکی داخوای به مهبهستی تکا و کروزانهوه.

۶- دهستپیکی پرسباری

یه کیک له تاییه ته ندیهه کانی پرسبار کردن ئهوهیه که له (قسه کردنا دهستپیکی قسه داگیر دهکات..... بو ئهوهی مانا پرسباریهه کهی له دهست نه دات) (۳۱)، له شاعیره شدا کاتیک شاعیر

پرسیاریکی لا دروست دەبیت پرسیاره که له سه‌رتای ده‌قه‌کدا ده‌خاته روو، چونکه ئه‌وهی می‌شکی شاعیر له‌م جۆره ده‌قه‌دا چالاک ده‌کات بۆ شیعیر گوتن چۆنیه‌تی پرسیار دروستکردنه‌که‌یه، پرسیار کردن (ئه‌وه‌یه که داوای زانیی شتی‌ک بکه‌ی پێشتر نه‌ترانیی و نه‌یزانی، بۆ ئه‌وه‌ی تۆش ناگاداری بیت)) (٣٢)، شاعیریش که پرسیار ده‌کات تامه‌زرۆی زانیی ئینجا زانیاریه‌که راسته‌قینه‌ییت یا مه‌جازی‌ییت، له‌ پیناوی خۆی‌ییت یان بۆ که‌سانی دیکه‌ییت، به‌لام مه‌رج نییه‌ ولامی هه‌موو پرسیاره‌کانی ده‌ست بکه‌ویت، (سالم)یش له‌ ده‌ستیکی (٢٣) ده‌قه‌دا پرسیار ده‌کات، هه‌ندی‌ک جار به‌ به‌کاره‌ینانی ئامرازه‌کانی پرسیار کردن و له‌هه‌ندی‌ک پرسیاریدا بی نامراز و له‌سیاقی گوته‌دا پرسیار ده‌کات و به‌مه‌به‌ستی جیا‌وازی پرسیاره‌کانی له‌ ده‌ستیکی شیعیره‌کاندا ده‌خاته روو، بۆ‌نمونه‌: له‌هه‌ندی ده‌قه‌دا شاعیر پرسیاریک ئاراسته‌ی که‌سی به‌رامبه‌ر ده‌کات، خۆی ولامی پرسیاره‌که‌ی لایه، لێ‌ده‌دا شاعیر خۆی تامه‌زرۆی زانیی نیه، به‌لکوو تامه‌زرۆی ئه‌وه‌یه که‌سی به‌رامبه‌ر بزانی و هه‌ک:

-ده‌زانی به‌ختی ئه‌هلی دڵ بۆ قه‌ت شه‌مه‌ر نادا؟

فه‌له‌ک هه‌رگیز مورادی مه‌ردومی صاحیب هونه‌ر نادا! (ب-١-٣٧)

له‌ چه‌ند نمونه‌یه‌کی دیکه‌شدا، (سالم) پرسیار ده‌کات، به‌لام زانیاریه‌که‌ی ده‌ست ناکه‌ویت، چونکه پرسیار کردنه‌که له‌ باری چاره‌نووسه‌وه‌یه، به‌لام شاعیر تامه‌زرۆی زانییه‌تی بۆیه لای ده‌بیت به‌ پرسیار شه‌گه‌ر چی ولامی ده‌ستی ده‌ست ناکه‌ویت، سالم له‌ده‌ستیکی شیعیره‌کانیدا ئه‌و پرسیارانه‌ی زۆره‌ که ئاراسته‌ی فه‌له‌ک و چاره‌نوسی ده‌کات، و هه‌ک:

-حه‌سه‌رتا دڵ غافل، نازانی قیسمه‌ت چی ده‌کا؟

ئه‌مه‌رۆ ئێ‌ده‌م بوو به‌ مه‌سکه‌ن، ئاخۆ فه‌ردا کویم ده‌با؟ (ب-١-٤٣)

-هه‌تا که‌ی، ئه‌ی فه‌له‌ک، بۆ به‌ختی من جه‌ور و ته‌ظه‌للوم بی

وه‌چاکه‌ چه‌ند روژی نه‌ویه‌تی لوطف و ته‌ره‌حوم بی (ب-٢-٩٧٧)

له‌هه‌ندی‌ک دۆخدا، به‌تایبه‌تی له‌ مه‌نه‌لوگه‌ تاکه‌ که‌سه‌یه‌کانی شاعیردا، له‌ ده‌ستیکی شیعیره‌که‌دا پرسیار ولام هه‌یه، به‌لام ئه‌وه‌ی پرسیار ده‌کات و شه‌وه‌شی ولام ده‌داته‌وه هه‌ر خۆی شاعیره، و هه‌ک:

-سیاهی کاغه‌دم چی بی؟ سه‌ودای دیدی تارم

له‌ قاصید زودته‌ر، به‌لکه‌ بی‌نم رووی دلام (ب-١-٤٣٦)

هه‌ندی‌ک جار (سالم) له‌ ده‌ستیکی شیعیره‌کاندا پرسیار ده‌کات بۆ ئه‌وه‌ی له‌ رینگه‌ی پرسیاره‌وه پێوه‌ندی نیوان شته‌ کان بزانیته‌ و هه‌ک:

-رووه یا گۆله ئه مه، یا بهرگی نه سرین؟

لب است این، یا شکر، یا جان شیرین (ب-۱-۵۹۹)

له به ک نمونه شدا (سالم)، پرسیار و ولامه که ی له ریگای گفتو گۆوه دهخاته روو، و له دهستپیکی شیعره که دا دایده نیت، وه کوو سه ره تابه ک بو دروستبوونی گفتوگۆ که، ئه و شتهش که پرسیار ی لی ده کات (ئه سپ) ه و له سه زاری ئه سپه که وه ولامی پرسیاره که ده داته وه و بو مه بهستی هه جوو کردن به کاری هیئاوه، دهستپیکی دهقه که بهم شیوه یی خواره وه یه:

-من له ئه سپی بو ز ئه پرسم، بو چی ئه عضات که ره گه

ئو به ناخ و داخ ئه لی: داخی عه زیز ئاغای سه گه (ب-۲-۷۸۸).

۷- دهستپیکی نه ری کردن

به کار هیئانی نه ری له شیعردا وه کوو ستایل و ده ره که وتنی له دهستپیکدا له لای زۆریه ی شاعیرانی کلاسیک بوونی هه به، لای سالمیش له دهستپیکی (۱۸) ده قدا نه ری کردن ده بینیت، بو نمونه:

-نا یی لی بیمه حوزوورت منی ئاواره عه بهت

عاجزیی گۆل له جه فای بولیولی بی چاره عه بهت (ب-۱-۲۴۱)

شاعیر له دهستپیکی ئه م شیعردا، نه هیشتنی داخواییه که ی ئاشکرا ده کات، چونکه ده یه ویت پرواته دیداری یار، که چی یار نا هیلی، شاعیریش له ئه نجامدا زویر ده بیت، نه هیشتن یاخی بوونی لی پهیدا ده بیت و ئه ویش زویر بوون دروست ده کا، هه رکات شاعیر له ژیر فشاری ئه و دۆخه بیت، ده بینین له دهستپیکی دهقه کانیدا نه ری کردن هه به. بو نمونه:

-نما ره نگم، به بی دیداری احمد

چ دلته نگم، به بی روخساری ئه حمه د (ب-۱-۲۶۵)

شاعیر ناتوانی (احمه د) بینیت، ئه و دۆخه ش زویری ده کات، بو یه هه ره له سه رتای شیعره که وه هۆکاری زویر بوونه که ی له ریگای نه هیشتنه که وه ئاشکرا ده کات.

زۆر جار بو دربرینی خه م وه ژاره و سکالا کردن شاعیر په نا ده باته بهر نه ری کردن، بو نمونه:

-که وه که بی سه عدم له بورجا ده فعه یی، بالا نه بوو

(دو ذنب) بو به ختی واروون، قهت ده می ئاوا نه بوو (ب-۱-۶۴۵)

هه ندیک جاریش بو پاسا وه یئاوه شاعیر له دهستپیکدا په نای بردۆته بهر نه ری کردن وه ک:

-چونکه ئیقلمی فیراق ئاب وهه وایه کی نییه

باغى پەژموردەبىي دىل نەشتونومايىكى نىبە (ب۲-ل۸۷۷)

لەو ھەژدە دەقەي (سالم)، كە لە دەستپىكدا نەرى ھەيە، زۆرىەيان پالئەرەكەي خەم پەژارەن، ئىنجا نەرىكردنى ھەوال و پاشان داخووزى و پىرسىارن، سەرجاھەي ھەمووشىيان ھەستى زورىبوونە لاي شاعىر كە پالئەرى بە كارھىنانى نەرىبە لە دەستپىكى گوتتە كاندا.

۸- دەستپىك بە فلاش باك و گەرانەوہ بۆ رابردوو

فلاش باك و گەرانەوہ بۆ رابردوو، يە كىكە لە تەكنىكە كانى گىرپانەوہ، لە سىياقى گىرپانەوہدا نووسەر لە رىگەي گەرانەوہ بۆ رابردوو ھەندىك زانىارى دەركىنى، بەلام فلاش باك لە دەستپىكى شىعەردا جىاوازە، چونكە بەر لە فلاش باكە كە ھىچ گىرپانەوہ و رووداويكى دىكە بوونى نىبە، خۆي سەرەتايە و مەبەست لىي ژياندەنەوہي بىرەوہرىبە (خۆش و ناخۆش) ەكانە. (سالم) لە (۷) دەقدا لە رىگەي چەند ئامازىبەكەوہ لەناو رابردوودا دەستپىكى شىعەرەكەي داناوہ. بۆنمونە:

ھەر سەھەر دىنئىتەوہ ياد، كۆبى تۆ، مولكى خەتا

نە فحەھا دىنى لە موشكىن زولفى تۆ، بادى صەبا (ب۱-ل۱۴)

لەم دەقدا گەرانەوہ بۆ رابردوو لە رىگەي دەرپرپىنى (دىنئىتەوہ ياد) ەوہ بناغەي بۆ دانراوہ، گەرانەوہ كەش پابەندى كات كراوہ و تەنھا لەو دىرەدا بەرجەستە كراوہ، واتە ھەموو سەھەرىك بىرەوہرىبە كانى ئەو ئامادە دەبىتەوہ، بىگومان (نەستەلۇژىيا-سۆزى رابردوو) ھۆكارى ھەيە، بۆ شاعىر خۆشى بۆنى زولفى يار خۆشى ولاتى (خەتا) ي دىنئىتەوہ ياد، واتە؛ پالئەرى گەرانەوہ كە، ئەو چىژىبە كە شاعىر لە رابردوودا بىنىوہەتتى. شاعىر ئەو بىرەوہرىبەي لە سەھەردا دىتەوہ ياد، پاش ئەوہي شەوېكى پر لە ئازارى بەرىكردوہ، چونكە خۆي لە دىرپى دووہمدا دلەي (نەھرى ئەشك ئەمشەو لە دىدەم وا بە خور دەرژايە روو... دىل لە سىنەمدا تا سەھەر سەنگ ئاسيا ئاسا گەرا) و ھەتا كۆتايى دەقەكەش ھەر باسى ئازارەكانى دوورى يار دەكات، بۆبە بە لۇژىكى رىزبەندى رووداوہ كان بوايە، دەبوو ئەو دىرپى يەكەم كۆتا دىر بوايە، چونكە دۆخى كۆتايى شەوہ كە بەرجەستە دەكات، بەلام بوونى ئەو دىرپە لە سەرەتاي دەقەكدا پىوہندى بە بەھىزى سۆز و راستەقىنەيى ئەو چىژەوہ ھەيە كە شاعىر لە ئەنجامى وەبىرھاتنەكەوہ ھەستى پى كىردوہ، بۆبە لە سەرەتاوہ باسى دەكات. ھەوہا دەشى ئەو دىرپە پالئەرى راستەو خۆي نووسىنى دەقەكە يىت.

(سالم) لە چەندىن نمونەي دىكەدا پالئەرى گەرانەوہي بۆ رابردوو، خۆشى و چىژى ئەو رابردوويە كە دواجار دەبىتە ھۆي بزواندىنى سۆز و سەلىقەي شىعەرى شاعىر لە دەستپىكدا دىخاتە روو، رابردووەكەش زياتر پىوہندى بە يادگارىبەكانى يارەوہ ھەيە، بۆنمونە:

يادى تۆبە صەنەما، يەك بە يەك ئەندىشەيى من:

شوغلى من، شىوھىيى من، فيكرەتى من، پيشەيى من (ب-۱ل-۵۷۴)

-بەيادى رووى دلارامى؛ صە فەيائە، نە شئەيە، رامى

(بىا ساقى ابده جامى كزان يابم سرانجامى) (ب-۲ل-۹۱۲)

ئەم دوو دەستپىكە بەلگەن لەسەر ئەوھى يە كىك لە پالئەره كانى گەرانەوھى (سالم) بۆ
يادگارپىيە كانى (جوانى و خۆشەويستى) يە. ھەرھە سۆزى خۆشەويستى لای (سالم) دەبىتە ھۆى
گەرانەوھى كاتيش (الاسترجاع الزمنى)، گەرانەوھى كات؛ (تە كنىكىكى كاتە، مەبەست لىي
گىرپانەوھى روودا و گوته و ئەو كارانەيە، كە لە رابردوودا روويانداوھ) (۳۱)، بۆ نمونە؛

-پارسال لە وەصلدا بە صەفا عەيشى جەمەم بوو

لەو كە ونەدا شەو كەتى شاھى عە جەمەم بوو (ب-۱ل-۶۳۴)

شاعىر لە دەستپىكدا ئاماژە بە كاتە كە دەكات، كە (پار سال) ە، واتە رابردووه و لەناو ئەو
چوارچۆھە زەمەنپىيەدا، باسى دۆخى شكۆدار و ژيانى پىر خۆشى خۆى دەكات، بەلام ئەم ژيانە
شاھانەيەى (سالم) كە لە ئەنجامى وەصلى ياردا ھەيىبووە سنورى ئەو كاتە تىناپەپىنى.

بەگشتى پالئەرى سەرەكى بۆ دەستپىك بە گەرانەوھە بۆ رابردوو لە ھەر (۷) دەقە كەى (سالم)
خۆشپە كانى رابردووه بۆيە، لە گوتندا سەرەتا دەستپىكى قسە كەردىيان داگىر كەردووه.

۹- دەستپىك بە پەشىمانى وشكات و ھەسرەت ھەلگىشان

ئەم جۆرە لە دەستپىك ئەو سەرەتايانە دەگىرتەوھە، كە بە ھەوايلىك دەستپىدە كات و (مەبەست لىي
دەربىرى ئاخ و پەژارپىيە لەسەر شتىك يان شتائىكى لە دەست چوو) (۳۴)، لای (سالم)، لە (۶)
دەقدا ئەم جۆرە دەربىرىنە ھەبە، سەرچاوە كەشى پىوھەندى بە ھەستى پىدەسەلاتى و نەمانى بەلانسى
رىك و پىكى نىوان (من و منى بالاً و ئەو) ى نووسەرە، كە وادەكات ھەستە نەرىكان زالىت بەسەر
بىر كەردنەوھى نووسەردا، بۆ پىر كەردنەوھى ئەو ھەستەش شاعىر پەنا دەباتە بەر ئەم جۆرە دەستپىكانە،
بۆ نمونە:

-رەنگى رووم رابورد، درىغا، باز لە ھەسرەت روويى دۆست

خەم بووھە قەدەم لە غەمدا ھەر وەكوو ئەبروويى دۆست (ب-۱ل-۱۹۰)

ھەرھە

-ئۆف خودا ئەم جەژنە بۆ حالى غەرىبان ماتەمە

باوجودى زەوقى مەردوم، خاطرى من پىر غەمە (ب-۲ل-۸۰۵)

-دریغا نەقدی دینم کردە صەرفی کاری دۆنیایی

صەلاخی دۆنیەویشم دایە دەستی نەفس و خودپرای (ب-۲ل-۹۵۱)

سەرچاوەی ئەو دەستیپێکانە سەرەو پەشیمانی و حەسرەتە، حەسرەتەهەلکیشان و خەم خواردنیش سەرچاوەکە ی ئەو هەستە نەریانە، کە لە ئەنجامی بی دەسلاتی مەروەف بەرامبەر بە چارەنووس دووچاری دەبێتەو. لەوانە (نەمانی رەنگی رووی شاعیر لە حەسرەت رووی یاردا، بەسەر بردنی جەژنە لە غەریبی، فەرامۆش کردنی دین بە هۆی کار وباری دۆنیاو)، کە هەمووی لەسەر رووی دەسلاتی شاعیرەوێه و پێچەوانە و بیستە کانییەتی، بۆیە لە ئەنجامدا وەک گەر کانییک تەوژمی سۆزە کە لە فۆرمی ناخ هەلکیشاندا لە دەستیکی شیعەرە کەدا بەرجەستە دەبێت.

۱۰- دەستیپێک بە سوێند

کاتییک کە شاعیر پێویستی بە پالێشتیکردنی هێژکی زۆر بالا هەیه، بۆ پشتراستکردنەوێ هەستە کانی یاخود هەر هەوالب وداواکاریە ک کە هەبێت، پەنا دەباتە بەر سوێندخواردن، (سالم) لە چوار دەقدا بەم جۆرە شیوازە دەستیپێدە کات بۆ نمونە:

-چ بلیم برا، بە قورئان، حەیرانە دل لە کارت

ریتی تەعەششوقی پوول پەیمانەیی قەرارت (ب-۱ل-۱۷۰)

بۆ جەختکردنەوێ لە ئەو سەرسامییە، کە لە ئەنجامی پارەپرستی و شکانی پەیمانەیی بەلێن لە لایەن کەسی دووهمەوێ دووچاری شاعیر بۆتەو، شاعیر پەنا دەباتە بەر قەسەم بە قورئان بۆ باشتر نیشاناندانی سەرسامییە کە ی خۆی و هەرەها بۆ ئەوێ باوهری بی بکریت.

لە دەستیپێکی شیعریکی دیکە شدا (سالم) دەلی:

-ژەهرە مو لب رووت بە والله العظیم

خارە گو لب بۆت بە الله الکریم (ب-۱ل-۴۹۵)

پەنا بردنە بەر سوێند بە ناوێ کانی خودا لە پیناوی بەخشینی بەهائە کێ راستەقینەتر بە هەستە کان، جۆرێکی دیکە یە لەو دەستیپێکانە ی سالم بە کاری هیناوه، تا کوو ئەو قەسەمە بێتە ئەو کلیلە ی کە دەرگای راستەقینەیی و راستگویی هەستە کانی شاعیر لە تەواوی دەقە کەدا دەکاتەو.

تەوهری سییەم

لە نیوان دەستیپێک و کۆتایی دەقدا

دەق يەكەيەكى ئۆرگانىيە لە سەر تا وناو پراست و كۆتاي پىك دىت، ھەرچەند ئەم يەكەيە پتەوتىت، دەقەكە بەھىز تر دەيىت و مانەو و ھەرگرتنى لەلایەن ھەرگروە ئاسانتر دەيىت، چونكە (باشترین شىئەرى ئەو يەكەيە كە گوتن تىبايدا سىستەمىكى رىكە و ھارمۇنيا لە نيوان سەر تا و كۆتايەكەي ھەيە..) (۳۵)، بۆيە زۆرگرنگە جۆرى پىوئەندى نيوان سەر تا وناو پراست و كۆتايە دەق ھەرماوش نەكرى، لەبەرئەوئەي ئەو پىوئەندىيە رۆلى دەيىت لە سەر چۆنەتەي ھەرگرتنى دەقەكە لە لایەن ھەرگروە.

لە شىئەرى كلاسسىكىدا بە ھۆى پىرەو كوردنى يەكەيتى بەيت لە دامەزاندنى شىئەردا تارادەيەك چىژى دىرەكان سەر بەخۆن و ھەندىك جار داپران لە نيوانيان ھەيە، بەلام پىرەو كوردنى يەكەيتى بەيت نەبوو بە رىگر لە بەردەم ھەبوونى پىوئەندى نيوان سەر تاو و ناو پراست و كۆتايە دەق، ئەگەر چى ھەندىك جار و بەتايەتەي لە دەقە لاوازەكاندا، لە ناو پراستى دەقدا ھەزرى ھەرگرون دەيى و بە لا رىدا دەروا، بەلام لە دەقە بەھىزەكاندا ئەگەر لادانىش رووبدات لە سنورى سۆز و خەيالى دەقەكە دەرنەچىت.

لە لای ھەر بەكان كۆمەلىك جۆرى كۆتايە شىئەرىيان جيا كوردۆتەو لە وانە (الخاتمة التكرارية، المفصلة، المفتوحة، الانبعائية، المثلية...) (۳۶)، بەلام زياتر لە شىئەرى نوئى و بۆ باسكردنى خودى كۆتايەكە دايناو. ھەرچى كارەكەي ئىمەيە ديارىكردنى پىوئەندى نيوان دەستپىك و كۆتايە شىئەرىكانە، بۆيە بەسوود ھەرگرتن لەو چەمكەنە و لەسەر بنەماي دۆخە شىئەرىەكانى (سالم) ھەول دەدەين چەند جۆرىك لەو پىوئەندىيانە باس بەكەين. لە لای سالم بە ھۆى جۆراو جۆرى و زۆرى دەقەكانەو پىوئەندىيە نيوان سەر تا و كۆتايە دەقەكانىش ھەمەجۆرن، بۆيە دياردە سەرەكەيەكانى ئەو پىوئەندىيانە پۆلەين دەكەين بۆ چەن جۆرىك:

۱- پىوئەندى تەواو كارى لە نيوان دەستپىك و كۆتايە دەقدا.

پىوئەندى تەواو كارى لەسەر بنەماي (الخاتمة التكميلية) ى ھەر يەو، كە زياتر لە شىئەرى نوئدا باسيان كوردو، بىرۆكە كەمان بە گۆرانكارىيەو دامەزاندو، مەبەست لەم جۆرە پىوئەندىيە ئەو يەكە دىرەكانى سەر تا و كۆتايە دەق پىوئەندى بە يەك بابەتەو ھەيىت و دىرى كۆتايە ھەر تەواو كەرى دىرى يەكەمى دەق بى، بۆ نمونە ئەگەر دەستپىك بە راگەياندن بىت كۆتايەكەش ھەر پەيوەستە بە راگەياندەو، ئەگەر بە پرسىار بىت پەيوەست بىت بە پرسىارەو و داخووزى بىت داخووزىيە... ھتە، بۆ نمونە:

لە دەقەكەدا سالم لە دەستپىكدا دەلى:

ھەر بە ھەمدەن يارى من بى پەردە قامەت دەردەخا

مەحسى كىزى موددەعاي دەھرى، قىامەت دەردەخا (ب-۱-ل)

لە کۆتایی دا دەلی:

-من وتم: تیغی برۆت ساو دا بەقصدی، ئەو وتی:

پیری عیشقە سالم و یەك یەك كەرامەت دەردەخا (ب-۱-۲)

لە دێری یەكەمدا باسی هەلسوكەوتی یار دەكات، كە بەمەبەست بالای نیشاندەدات، لە كۆتاییەكەشدا هەر تەواوكەری هەلسوكەوتەكانی یارە كە بەمەبەست برۆی باریك كرددووە، و اتا كۆتایی تەواوكەری سەرەتایە و لەسەر هەمان رێرە بەردەوامە، ئەم كۆتاییە سالم بەكاری هیناوە پێی دەگوترێ كۆتایی جوان، كۆتایی جوان (ئەوهیە دوا دێری شیعەر، هەروها دوا رستە، یان دوا پارچە پەخشان لە رووكانی وشە و واتا وشێوازدا جوان و تەواو و روون و خوش و بەهێز بن، چ ئەوهشیان لێ نەخوێنرێتەو، كە ئەمە دێری دوایینە)) (۳۷). دێری كۆتایی لەم دەقەى سالمدا وشەكانی روونە جوانە و ئەوهشی لێ ناخوێنرێتەو كە كۆتا دێرە، چونكە بە گفتوگۆی نیوان سالم و یار كۆتایی پێ هاتوو، وەرگیش لە چاوەروانی بەردەوامیونی گفتوگۆكەیه، چاوەرپێ كۆتایی نییە، هینتا تاماززویی بیستە، كەچی دێرەكەش كۆتا دێرە، بۆیە بە كۆتایی جوان هەژمار دەكرێ، بەلام دەستیكی شیعەرەكە (دەستیكی دلگیرە، چونكە وابەستەى مەبەستى دەقەكەیه واتە لەم پێوەندییە تەواوكارییەدا دەستیك دلگیرە كۆتایی جوانە.

لەنمونهیه كى دیکەدا دێری دەستیك بریتییه له:

-مۆژدەى رەنجم كە بەدى، نەقدى و یصالم طەلەبە

ئەجرى هيجرم كە بەدى باغى جەمالم طەلەبە (ب-۲-۷۳۶)

لە كۆتا دێردا دەلی:

-دێوى نا سالم ى نەفسم پرى غارى بەدەنە

قووەتێكى بە قەدەر رۆستەمى زالم طەلەبە (ب-۲-۷۳۷)

سەرتا و كۆتایی ئەم شیعەرەش هەردوو ك وابەستەى داخواییە، لە دێرى یەكەمدا شاعیر (ویصال و جەمال) دەوى، لە كۆتا دێریشدا (قوەتى رۆستەمى زالم) دەوى، واتە لە دێرى یەكەمدا داخوایی هەى و كۆتا دێریش هەر بەردەوامە لە تەواوكردنى داخواییەكانى، بۆیە پێوەندى نیوان كۆتایی و سەرەتای دەق پێوەندییەكى تەواوكارییە، بەهەمان شیوەى نمونەكەى پێشوتر، ئەم شیعەرەش دەستیكەكەى دلگیرە و كۆتاییەكەى جوانە، و لە زۆریەى ئەو دەقەنەى سالم كە پێوەندییەكى تەواوكارى لە نیوان كۆتا و دەستیكدا هەیه، ئەو دەستیك دلگیرە و كۆتایی جوان.

۲- پێوەندى كەوانەى یاخود بازنەى.

له لای عه ره به كان (الخاتمه التديريية) بوونی ههیه، ئیمه ئه و بیرو که یه مان گونجان دووه له گه ل شيعره کانی (سالم) بو دروستکردنی پردی پیوهندی نیوان سهرتا و کۆتایی دهقه کان، مه به ست له پیوهندی که وانه یی یا خود باز نه یی ئه وهیه، دپری دهستپىڭ سهرتای کردنه وهی که وانه بیټ و دپری کۆتایی داخستنی که وانه بیټ، ئه مه ش به وه ده بیټ که بونیادی دووباره هه بیټ له نیوان کۆتا دپری وه که م دپردا، ئینجا دووباره بوونه وه که له هزری دپره کاندای بیټ یان له وشه کاندای بیټ، گرنگ ئه وهیه وهرگر وا هه ست بکات له نیوان سهرتا و کۆتایییدا دهخولیتته وه بو نمونه:

له دهستپىڭی شيعری کدا دپری یه که م بریتیه له:

-له طهرف یاره وه نۆبه ی نه ظه ره

ئهی دل ئاماده به خوینت هه ده ره (ب ۲-ل ۷۶۵)

کۆتا دپری بریتیه له:

-وهختی خنده و نیگه و عیشوهی یار

سالم ئه ره ضه بطی نیگه کا، هونه ره (ب ۲-ل ۷۶۷)

له یه که م دپردا سالم باسی (نۆبه ی نه ظه ر) ی یار ده کات، له کۆتا دپرشدا هه ره له هه مان باز نه دایه هه ره خه ربکی کۆنترۆلی کردنی ئه و نیگایه ی یاره، واته، سالم له خالی دهستپىڭدا به نیگای چا و دهستپىڭده کات، له مه تنی دهقه که دا به رده وام ده بیټ له وه سفکردنی لایه نه کانی دیکه ی یار، به لām له کۆتا دپری دا ده گهریته وه هه مان هزری خالی دهستپىڭ، که په یوهسته به چاوی یار، بۆیه ئه م پیوهندی به که وانه یی و باز نه یی ده ژمی رین، و جیاوازی نیوان پیوهندی که وانه یی و ته واکاری ئه وهیه، له ته واکاریدا دپری کۆتا به رده وامی به دپری یه که م ده دات نا گهریته وه سه ره دپری یه که م، به لām له پیوهندی که وانه ییدا کۆتا دپری ده گهریته وه سه ره دپری یه که م، له م نمونه شيعریه ی سه ره وشدا دهستپىڭ دلگیره و کۆتایی جوانه.

له نمونه یه کی دیکه ی پیوهندی باز نه ییدا، دهستپىڭی شيعره که بریتیه له:

-بو منی بی سه روپا، غه یری وه فا، پیشه نه ما

یو دلی تو صه نه ما! جوز سته م، ئه ندیشه نه ما (ب ۱-ل ۱۲۹)

کۆتاییه که شی بریتیه له:

-به س بسووتینه له غه م سالم ی مه سکین به جه فا

بو وجودی سه روپا له حم و دم و پیشه نه ما (ب ۱-ل ۱۳۰)

ئیمه گوتمان یه کینک له تاییه تمه ندیه کانی پیوهندی باز نه یی یا خود که وانه یی هه بوونی یونیادی

دووبارە، لەم دەقەدا (سەرۆپا، نەما) لەهەردوو دێرێ بەکەم و کۆتاییدا بوونی هەیه، بۆیە لە کۆتاییدا دەق هزری وەرگر دەگەرێنیتەوه بۆ سەر دەستپێکی شیعەرە، هەرۆها دەستپێکی کردنەوی کەوانە (وەفا، یە)، داخستنی کەوانە کەش (جەفا، یە)، مان و نەمانی بوونی شاعیریش لەنیوان ئەم دوو کەوانەدا یە. لەم نمونەدا یەشدا دەستپێک دڵگیرە و کۆتایی جوان.

۳- پێوەندی کورتبەری - کورتکردنەوه-چرکردنەوه.

دەستپێک سەرەتای کردنەوی بابەتی شیعرییە، لە هەندێک نمونەدا شیعەرەکانی سالمدا، لە کۆتا دێریدا ئەم بابەتە چر دەکرێتەوه و کورتەیی بابەتە کە دەخێتە روو، بۆیە ئەم جوۆرە دۆخە بە کورتبەری و کورتکردنەوه هەژمار دەکەین، واتە کۆتا دێر کۆکردنەوی سەرتا و ناوەرەستی دەقە، بۆنمونه:

لە دەستپێکی شیعریکی هەجودا (سالم) بە شیۆی گێرانهوه دەست پێدەکات:

-ئیبیتدا بۆز لە سنە ی کردەوه چرا

بوویەتی چونکە لەوئ نەشتونوما (ب-۱-۳۵)

لە کۆتا دێریشدا کۆتایی بە باهتە کە هیناوه بەم شیۆیە:

-بەسە سالم مە کە لەم سەبکە خەیاڵ

لادە لەم فیکرە حەیا ی بۆزە نەما (ب-۱-۳۹)

سەرەتای دەقە کە بەباسکردنی (ئەسپێک بەناوی بۆز) دەستپێدەکات، کۆتاییە کەشی بە داخواری راگرتنی هەجە کە بە دەربڕینی (بەسە سالم... حەیا ی بۆز نەما) کورت دەکاتەوه، چونکە حەیا ی بۆز نەما و ئیتر بابەتە کە قسە ی دیکە هەلناگرێ. ئەم کۆتاییە ی سالم بە (کۆتایی دڵگیر) هەژمار دەکرێ، کۆتایی دڵگیر ((بریتییە لەو دوا بەشە ی ناخوتن، کە بە هۆیە ک لە هۆیە کان وا دەکات، هەست بەوه بکری، کە ئەمە کۆتاییە)) (۳۸)، لەم دێرەشدا نامازە هەیه بە کۆتایی، چونکە دەربڕینی (بەسە) بە کارهاتوووه. بۆیە بە کۆتایی دڵگیر دادەنرێت، دەستپێکی شیعەرە کەش دەستپێکی دڵگیرە، چونکە دەستپێکە کە وابەستە ی بابەتی ناو مەتن و کۆتایی دەقە کەیه.

لەنمونه یە کە دیکەدا دەستپێکی شیعەرە کە بریتییە لە:

-چوومه سەر ضیافەتی مەللا بە کری عالی جەناب

چ بلیم خەلکینە بۆم نایەتە بەر مەددی حیساب (ب-۱-۱۵۱)

کۆتاییە کە ی:

القصه ئەو شەوه بەدبەختیە وهای کرد بە جۆش

وهخته بوو قیترتەبقی نان لەملا بیته جواب (ب-۱-۱۵۲)

له م شیعره دا (سالم) باسی بانگیشتی خوی ده کات بو خوانی (مه لا به کر)، دیسان دهستپیک کی گیزانهوی پیروه کردوه، له مه تنی دهقه که شدا به ردهوام ده بیته له باس کردنه که، که چون پیاویک له گهل نهو له سه ره همان سینی خواردن دانیشتووه و زوری خواردوه... هتند. له کوتايشدا کورتهی چیرۆکه که ی نهو شهوه دهخاته روو، دهلی: پوختهی حیکایه ته که، نهو شهوه نهو کاربایه هیندهی خوارد وهخت بوو خواردنه که ی له بیته دنگ. واته له کوتا دیردا نهو چیرۆکه ی که له یه که م دیرۆ ده قدا باسی ده کات، له کوتا دیردا چرپی ده کاته وه و پوخته که ی دهخاته روو، به همان شیوهی نمونه که ی پیشووتر، دهستپیک کی نه م شیعره دلگیره و کوتاییه که شی دلگیره.

دوای تیبینی شیعره کانی سالم به گشتی بومان ده رکهوت که (۱۱) دهق لهو شیعرا نهی (سالم)، که به گیزانه وه و گفتو گو دهستپیده که ن، پیوهندی نیوان سه رتا و کوتاییه دهقه کان، چر کردنه وه یاخود کورته کردنه وه یه و کوتاییه دلگیرن و دهستپیک کی نهو شیعرا نهش دهستپیک کی دلگیرن. (۲۵) دهقیش لهو دهقانه پیوهندییه که یان ته و او کاربایه.

۴- پیوهندی دابراو

نه گهر به وردی دیقه تهی شیعره کانی سالم بدهین، تیبینی نهوه ده که یین زورجار کوتاییه پیوهندی له گهل دهستپیکدا بچراوه و یاخود بهر له دیرۆ کوتاییه شیعره که کوتاییه هاتووه و دوا دیر دابراوه له فهزای دهقه که ، نه مهش زور جار بو پیروه کردنی یه کیتی بهیت له شیعره کاندایه ده گه ریته وه، به لام له هه موو دیارده کان زه قتر بوونی دابرا نیوان دهستپیک و کوتاییه دهقه به هوی دهستپیک کی جوانه وه، نیمه نه م دوخه مان به پیوهندی دابراو هه ژمار کرد، چونکه میشکی وهرگر له نیوان سه رتا و ناوه راست کوتاییه ده قدا تووشی پچرا نی زنجیره ی بیر کردنه وه و ته و ژمی سوژ ده بیته. بو نمونه:

له دهستپیک کی شیعریکی هه جوودا (سالم) به باسی دوخی دهروونی خوی بهر له کرده ی گوتن، یاخود له ساته وهختی گوتندا بهرجه سته ده کات:

- غه م وه کو یه م هاته جو ش و که وتمه گیزاوی به لا

ئاوی هایل زایه که شتی، هاتمه حالی هه لوه لا (ب- ۱- ۲۸)

(سالم) له م شیعره دا هه تا دیرۆ پینجه م له باسی دوخی دهروونی خویدایه و له دیرۆ پینجه م به دو اوه دهست به داشورینی (ئه سپی هه مه ی نه حمه د) ناویک ده کات، بو یه نه م دهستپیکه به دهستپیک کی جوان له قه له م ده درئ، چونکه له دهستپیک کی جواندا دیرۆ کانی سه رتا ی شیعرا نه وه خو باسی مه به ستی سه رکی شیعره که ی تیدا نییه، هه ره بهر نه وه شه له گهل کوتاییه که شدا پیوهندی دابرا ن له نیوانیاندا هه یه، کوتا دیرۆ نه م شیعره به م شیوه یه یه:

-وہک خدر قوشچی چہ قەل فیژ بوون حیسابی فارسی

ئەستیرە دەژمیرن ئاخۆ لاکى بۆز کەى دیتە لا (ب-۱-۳۴)

واتە؛ کۆتا دێرى شیعەرە کە ھەر باسى (ئەسپە کەبە) و پێوەندى بە سەرەتا جوانە کەى دەقە کەوہ نىبە، بۆیە پێوەندى کەیان دابراو، ئەم کۆتایى شەر بە جوان دەژمیردێ، چونکە ئەوہى لى ناخویندەرتەوہ کە کۆتایى دەقە کە بیت.

لەنموانەى کە دیکەدا:

-حەسەرەتا دل غافلە، نازانى قىسمەت چى دەکا

ئەمرو ئیرەم بوو مەسکەن ئاخۆ فەردا کویم دەبا (ب-۱-۴۳)

لەم دەستپێکەدا باسى دۆخى مروفت دەکات کە ھەر روژیک چارەنوس بۆ لایە کى دەبات، جارى خوینەر نازانى بابەتە کە باسى چىبە، لەدېرى چوارەمدا ئاماژە بە ناوى (حیللە) دەکات، دەچیتە ناو بابەتە کەوہ، بابەتە کەش باسکردنى گەشتىکى خوێتە بۆ شارى (حیللە، لە مائە عاریبک میوان بوو، خزمەتبان نە کردوہ) (۳۹). بۆیە سەرەتای دەقە کە سەرەتایە کى جوانە و لەگەل کۆتایى دەقە کەدا دابراو، چونکە، لە کۆتاییدا شاعیر گوتوویەتى:

-ھەمنشیم قەد نەبى ئیتر عەرەب تا حالى مەرگ

ئاینە کەسى جەلا، حەبفە لە خاکىستەر دەکا (ب-۱-۵۱)

